| Têketin | Ketin | Fermana ji kiryara “ketin”ê “bikeviyê” ye. Li herêmna dibêjin, têkeviyê. Ev hatiye xerabkirin. Têketin jî ji wir hatiye. Tê gotin di ketina gund e. Di têketina gund de şaş e. |
| Min wateya peyvê nas kir. | Min wateya peyvê zanî. | Ji hizirîna erebî hatiye. Di zimanê kurdî de naskirin ji bo tiştên şênber, zanîn ji bo yên razber bi kar tê. |
| Çalakî hilgirt ser xwe | Çalakî girt ser xwe | Hevokeke wisa di kurdî de nîne |
| Xwîner | Xwendevan | Koka peyvê (xwendin) hatiye xerabkirin. |
| Bilindkirina têkoşînê | Xurtkirina têkoşînê | Wergera ji zimanê tirkî ye. |

| | | |
|---|---|---|
| Yê ser bi Amedê | Yê ser Amedê/yê Amedê | Ji bandora soranî ye. |
| Di derbarê | Derbarê | Ji farisî hatiye, ji daçeka “der” ango “di”, û “bare” çêbûye û bûne yek peyv. Pêwîstî bi daçeka “di” nîne. |
| Hemû kes | Her kes | Peyva “hemû” ji “kes” re dibe bedel. Bedel ti caran li pêş nayê. Gundî hemû hatin, hemû gundî hatin şaş e. |
| Hozanvan | Hozan | Bê “van”ê navdêr e. |
| Guhdarvan | Guhdar | Bê “van”ê navdêr e. |
| Da biçe malê rabû | Rabû da biçe malê | “Ji bo ku biçe malê rabû” jî rast e. |
| Bê ka | Bê, yan jî ka | “Bê” û “ka”, wateya her duyan jî yek e. Her yek li hin herêman bi kar tê. Lê “ka” pirtir bi kar tê. Pêwîst nake her du bi hev re bi kar werin. “Ezê herim sûkê ka/bê solekê ji xwe re nakirim. |
| Biborîne | Bibore | Ji “Li min bibore” hatiye kurtkirin. |
| Rêveberiyê qedexeya derketina derve ferz kir. | Biryara qedexeyê da | Biryar tê dayîn, tê girtin, tê standin, lê nayê ferzkirin. Hem peyva “ferz” ne kurdî ye, bi wateya sepandin e, hem wateya wê di vir de hîç ne guncaw e. |
| Meclisa Jin | Meclisa Jinan | Ji mentiqê zimanê tirkî hatiye. Piştî “a”ya danasînê divê peyv bê tewandin. |
| Heyva Sor a Kurd | Heyva Sor a Kurdî | Heyva Sor ne Kurd e, kurdî ye. Ango Kurdan ava kirye. “Î” ya nisbetê ye. |
| Xist meriyetê | Pêk hat | Meriyet erebî ye; Tirkan ji Ereban, me jî ji Tirkan girtiye. |
| Armanc girt | Kir amanc | Peyv kurdî ne, lê ti têkiliya qalib bi kurdî re nîne. |
| Zorî lê kir/zorî dayê | Zor lê kir/zor dayê | Peyva “zor” hem dibe sifet, hem navdêr. Pêwîstiya wê bi tîpa “î” nîne. |
| Xistin bin çavan/hat binçavkirin | Destgîr kirin | Ji tirkî hatiye. Ji bilî mirovan “Dest danî ser/desteser kir” bi kar tên. |

| | | |
|---|---|---|
| Çil ji sedî | Ji sedî çil | Destpêkê ya pir tê pişt re ya hindik, weke çaryek, ango ji çaran yek. Ji erebî hatiye. |
| Dest jê berda | Dev jê berda | Min destê xwe jê kişand heye. Devjêberdan lêkereke honandî ye. |
| Perwerdeyî | Perwerde | |
| Serxwebûnî | Serxwebûn | |
| Berxwedanî | Berxwedan | |
| Bandorî | Bandor | |
| Bazarî | Bazar | |
| | | |
| Xeterî | Xeter | Ev her şeş peyv bê "î"yê navdêr in, anîna "î"yê şaş e. |
| Seranser dike | Seresere dike | "Seranser" û "seresere" wateyên wan ji hev cuda ne. Karê xwe seresere kir, ango baş nekir, di ser guhê xwe re avêt. "Seranser", ji serekî heta serê din. Ez li seranserê bajêr geriyam. |
| Serbest berda | Berda/serbest kir | Wergera ji tirkî ye. |
| Serweriya dijmin | Serdestiya dijmin | "Serwerî" rêveberî û xwedîderketina li tiştekî ye û erênî ye. Serdestî zor tê de heye. |
| Slogan qîriyan | Slogan avêtin/ durişim avêtin | Kiryara ne gerguhêz bireser jê re nayê. |
| Oxir kir | Veşart/spart axê | Wergera ji tirkî ye. |
| Bandor li ser kir | Bandor lê kir | |
| Bi boneya | Bi pêmana/bi pêwana | Soranî ye. |
| Hilaştin | Hiştin/hêlan | Devok e, pir kêm bi kar tê. |
| Gihaştin | Gihîştin/gihatin | Devok e. |
| Koland | Kola | Kiryara "kola" jixwe gerguhêz e, pêwîst nake em bi "and"ê gerguhêz bikin. |
| Nivîsand | Nivîsî | Kiryara "nivîsî" jî gerguhêz e. |

| | | |
|---|---|---|
| Bi bîr anî/bi bîr xiſt | Bîr anî/bîr xiſt | Ji bîranîn û bîrxiſtinê tên, “bi” zêde ye. |
| Xwedî lê derket | Lê xwedî derket | Ji lêxwedîderketinê tê, “li” nakeve nabera “xwedî” û “derket.” |
| Kir hedef û kuşt | Bi zanebûn kuşt | Wergera ji tirkî ye. |
| Lê guhdar kir | Lê guhdarî kir/ guhdarî kir/lê guhdar bû | “Guhdar” sifet e, daçek li pêşiya sifet nayê. “Guhdar” bi “î” dibe navdêr, wê demê daçek li pêşiyê tê. |
| Piştgiriya bi saziyê re | Piştgiriya saziyê | Ji bandora tirkî ye. |
| Anî ziman | Got/diyar kir | Wergera ji tirkî ye. |
| Anî ser ziman | Got/diyar kir | Yekser şaş e. |
| Şideta li dijî jinê | Zora li ser jinê | Wergera ji tirkî ye. |
| Êriş bir serê | Êriş kirê | Wergera ji tirkî ye |
| Bi tundî | Bi dijwarî/bi hişkî | Soranî ye |
| Teqînekê rû da | Teqînek çêbû | Soranî ye. |
| Serê xwe xwar nekir | Serê xwe dananî | Wergera ji tirkî ye. Serîxwarkirin di kurdî de heye, lê ji bo şermê tê gotin. |
| Şîn girê da | Reş girê da, di şînê de ye | Wergera ji tirkî ye. |
| Mala şînê | Mala sersaxiyê | Wergera ji tirkî ye. |
| Sala bîſt û yekan | Sala bîſt û yekê | Yek nayê pirkirin. |
| Da jiyankirin | Jiyand | Ji tirkî hatiye û di kurdî de wisa nayê gotin. |
| Agahî wergirtin | Agahî girtin | Pêwîſtî bi “wer” nîne, girtin tenê wê wateyê dide. |
| Ez wî esas digirim | Ji bo min ew girîng e | Wergera ji tirkî ye. |
| Netewedewlet | Dewletnetewe | “Netewe” dibe sifetê dewletê, sifet li pêşiya navdêr nayê. |
| Tenê ew hat | Ew tenê hat | “Tenê” dibe sifet. |
| Mezra | Gundik | Peyv erebî ye, ciyê çandiniyê. Tirk ji bo gundên piçûk bi kar tînin. |

| | | |
|---|---|---|
| Hîm avêt/ binyat avêt | Hîm danî/binyat danî | Wergera ji tirkî ye. |
| Mijara gotinê | Mijara behsa wê tê kirin | Wergera ji tirkî ye. |
| Serlêdana sûc kir | Gilî kir | Wergera ji tirkî ye. |
| Rasta êrişa polîsan hat | Polîsan êriş kirê | Wergera ji tirkî ye. |
| Rasta tecawizê hat | Destdirêjî lê hat kirin | Wergera ji tirkî ye. |
| Rêheval | Hevrê | Wergera ji tirkî ye. |
| Yên li gund dijîn | Yên li gund dimînin | Wergera ji tirkî ye. |
| Li gund dijîn | Li gund dimînin | Wergera ji tirkî ye. |
| Bi tenê | Tenê | "Tenê" bi serê xwe dibe sifet, pêwîstî bi "bi" nîne. |
| Pirsgirêkan dijî | Pirsgirêkên wî hene | Wergera ji tirkî ye. |
| Di bin her şert û mercî de | Di her rewşê de | Ji erebî û tirkî hatiye girtin. |
| Bersivand | Bersiv da | Wergera ji tirkî ye. |
| Qurbanî | Gorî | Qurban erebî ye. Ku em bi kar bînin jî pêwîstî bi "î" nîne. Lê ya herî baş em gorî bi kar bînin. |
| Sisê kes hatin | Sisê hatin/sê kes hatin | "Sisê" û "kes" bi hev re nabin, lewre "kes" di nava "sisê" de ye. |
| Dîl girt | Girt/ dil e | Wergera ji tirkî ye. |
| Derewand | Got derew e/diyar kir ku derew e | Wergera ji tirkî ye. |
| 6.sal/şeşemîn sal | Sala şeşan/sala 6. | Soranî ye. Kurmancî hebe pêwîstî bi anîna ji zaravayekî din nîne. |
| Nîşane | Nîşan | Ji bandora tirkî ye |
| Hedef girt | Kir amanc | Wergera ji tirkî ye. Peyva hedef bixwe jî erebî ye. "Amanc" û "armanc" di wateyên cuda de bi kar tên. Amanc=hedef. Armanc=niyet. |

| | | |
|---|---|---|
| Têk şkand | Şkand, bin xiſt, têk bir | Ji zaravayê soranî hatiye. Pêwîſt nake kurmancî bê xerabkirin. |
| Ji bo pirtir geş bibe | Ji bo geştir bibe | Lê hevoka “ji bo pirtir bixwe” raſt e. |
| Raſtî şideta mêr hat | Bû goriya, yan jî mexdûra zordeſtiya mêr | Ji bo kesekî, yan du kesên di nava tevgerê de payva “raſthatin” bi kar tê. |
| Binpêkirinên dagîrkeran | Sûcên dagîrkeran | Ev peyv dagîrkeriyê rewa dike. Ji bo dagîrkeran divê neyê bikaranîn. |
| Carina | Carna | “Car” koka peyvê ye, ne qertafa pirjimariyê ye. Pêwîſtî bi “i” nîne. |
| Gunehbar/ gunehkar | Sûcdar | Guneh peyveke dînî ye, divê di nûçeyan de bi kar neyê. |
| Malgeh | Mal | “Mal” û “geh” her du jî “cî” ne, her du peyv bi hev re nabin. |
| Tacîdar | Tacdar | Pêwîſtî bi “î” nîne. Peyv ji “tac” û “dar”ê çêbûye. |
| Hema bêje/ hema hema | | Her du jî raſt in, lê “hema hema” ji bo nûçeyan guncawtir e. |
| Hema bêjin | Hema bêje | “Hema bêje” qalibek e, bi pirbûna kesên li hember nayê guhertin. |
| Dema me kin maye | Dema me kin e, dema me hindik maye | “Mayîn” û “kin” bi hev re nabin. |
| Têkiliya me berdewam e | Têkiliya me dewam dike | Em nikarin bêjin, têkiliya me dewam e. Bi hatina “ber”ê ti guherîn çênabe. |
| Dagîrker kir | Dagîr kir | Ti wateya “dagîrker kir” nîne. |
| Bihevrekarkirin | Karkirina bi hev re | Wergera ji tirkî ye. |
| Rûbirû bûn | Hatin rûyê hev | Wergera ji tirkî ye. |
| Rê ji çûnhatinê re girt | Rê li çûnhatinê girt | Wergera ji tirkî ye. |
| Vala derket/ vala derxiſt | Bêbandor kir, pûç kir, xerab kir | Wergera ji tirkî ye. |
| Derxiſt zanebûnê | Serwext bû/zanî | Wergera ji tirkî ye. |
| Xiſt jiyanê | Pêk anî/bi cih anî | Wergera ji tirkî ye. |

nivîsê, her çiqas bi rêya wêjeya devkî xwe parastibe jî gelek hez û şapeyên bişaftinê bi ser de hatine. Di dîrokê de gelek ziman bi bişaftina xwezayî ji meydanê rabûne. Zimanên ku civakên piçûk pê diaxivin di nava zimanên civakên mezin de heliyane. Lê di roja me ya îro de ziman ne bi xwezayî dihelin, bi zora qanûn û dewletan û qedexekirinê hêdî hêdî ji holê radibin. Di serdema me de ku amûrên bişaftinê (bazar, dibistan, radyo, televizyon, rojname, sînema, înternet û... hwd.) pir pêş ketine û 24 saetan bandorê li jiyana mirovan dikin, xweparastina zimanên ne fermî pir zehmet e. Êdî bi çîrok, çîvanok û stiranan nayên parastin.

Li aliyê din, ji ber ku ragihandina kurdî bi giranî wergera ji zimanê tirkî, erebî, farisî û... hwd. e, gelek qalibên van zimanên biyanî ketine navê. Fikir, hizir û mentiq ji zimanên biyanî ne, gotin kurdî ne. Çawa ku mirov destek cilûbergên kurdî li mirovekî biyanî bike. Çawa ku ew mirov bi wan cilan nabe Kurd, ew nivîsa bi wî rengî jî naba kurdî. Ji kurdiyeke wisa ne çêja kurdî tê girtin ne bandora wê dibe. Bi taybetî di ragihandinê de hevoksazî û piraniya qaliban biyanî ne. Lê ji ber ku ew qalib pir bi kar tên -ku bi salan e em dixwînin û li pelikên guhên me dikevin-, em zû ferq nakin ku ne qalibên kurdî ne. Ez ne behsa peyvan dikim, civak dikarin peyvan ji hev bigirin, bi taybetî navên amûrên teknîkî bi giranî biyanî ne. Mînak, gelên Ewropa nêzî 5 hezar peyvên wan yên hevbeş hene. Gelên Rojhilata Navîn jî dikarin gelek peyvên hevbeş bi kar bînin. Ez behsa hevoksazî û qaliban dikim. Bêguman em dikarin ji her zimanî wergerê bikin û sûdê jê bigirin, lê pîvanên wergerê jî hene. Em ji zimanê biyanî wateyê bigirin cuda ye û peyv-peyv wergerînin cuda ye. Heta hin peyv yan hevok hene nabe ku em wergerînin. Mînak her biwêja biyanî nayê wergerandin. Ku bê wergerandin jî wê pir bêwate bibe. Di mînakên li jêrê de hûn dikarin li rewşê serwexttir bibin.

| ŞAŞ | RAST | TÊBÎNÎ |
|---|---|---|
| Jiyan kir/ jiyan bû | Jiya | Peyv bixwe kurdî ne lê qalibekî wisa di kurdî de nîne, wergera ji tirkî ye. |
| Hat hînbûn/ hat fêrbûn | Hat zanîn | Kiryara “hat” dikeve serê kiryara gerguhêz. “Hînbûn” û “fêrbûn” ne gerhuhêz in. |
| Bi erkê xwe rabû | Erkê xwe pêk anî, erkê xwe bi cî anî. | Peyv kurdî ne lê qalib ji wergera erebî ye. |
| Demekê berî demekê, rojekê berî rojekê | Berî gavekê, berî kêliyekê | Wergera ji tirkî ne. |

# Rastnivîsa Peyv û Hevokan

Diyar Bohtî*

**Ji ber ku ragihandina kurdî bi giranî wergera ji zimanê tirkî, erebî, farisî û... hwd. e, gelek qalibên van zimanên biyanî ketine navê..**

Serbest

Dema zimanek bi awayekî fermî nebe zimanê xwendin û nivîsê, di nava demê de yan tine dibe, yan di bin bandora zimanên serdeşt ên fermî de ji qalib, mentiq û xwezaya xwe dûr dikeve. Carna jê ji ber ku gelek peyv û qalibên zimanên serdeşt dikevin navê, di danasîna wî zimanî de mirov pir zorê dikişîne. Zimanê kurdî jî ji ber ku nebûye zimanê fermî yê xwendin û

*Nivîskar û Rojnamevan, li herêma Bohta- Bakurê Kurdistanê di sala 1958an de hatiye dinyayê, bi giştî ev 20 sal in li ser hev di karê ragihandinê de dixebite, di ber karê xwe re xebata wêjeya kurdî jî dike, çend Pirtûkên wî yên roman, helbeşt, ziman, û hwd hetine çapkirin.

# Binivîse



Siyabend Siyaroj*

De binivîse pênûsa min….
Biqêre.. şîna êşan bide der…
Bilerize… di nava tiliyên şkestî de…
Ximavê qêrîn û hewarê biherkin…
Bi sotîne rûpelên dîrokê…
Kiryarên kujeran biperçiqîne…
Binivise… binivise
Ranewaste… bendan bişkîne…
Dem dema herkînê ye…
Ronahiya heyvê ji tarîtiyê derxîne…
Bike pêlên deryayê evîna welat…
Li ser peravên Kurdistanê
Finda azadiyê vêxîne…
Li ser çiyayên Hewar, Qndîl, Garê û zagros
agirê kewayê geş bike…
Biherikîne yekîtiya çemê Dicle û Firatê
avjeniya berxwedaniyê di gola wanê de
bike…
Binivîse... binivîse…
Zûha... nebe..
Ji xewa qesra şîrên rabe…
Bijîne… bijîne..
An azadî… an azadî…

*Di sala 2003′an de li navçeya mabeta ya girêdayî Efrînê hatiye dunyayê. ji ber êrîşên dewleta tirk û hevkarên wê bi zordarî koçberî herêma şehbayê bû. Niha jî li peymangeha şehîd Viyan Amara - beşa mamosteyê refê dixwîne.

Bi pê berjewendiyên
Xwe yê taybet ketine
Piştê di hev yal dikin
Civak ji bîr kirine

Vê ezeziyê berdin
Yên xwe rêber dîtine
Bav û kalên me yek in
Em birayên hev in

Hemû Kurd berhev werin
Gava herî mezin e
Hêza me tev xurt dibe
Ew bi xwe serkeftin e

Dijmin lawaz dikeve
Wa hingê temen kin e
Dunya wê me nas bike
Wê zanibin em çi ne

Bila şehîd vehesin
Bi keder bar kirine
Li canê wan berçav be
Kurdan li hev kirine

Bav û kalên me ked dan
Hêvî pê xwe çandine

Hestiyên wan rizîne
Neviyan şûn girtine

Evqas sal em bindestin
Piştgiriya me tine
Dagirkerên xwînvexwar
Tim em talan kirine

warê me şer û ceng e
Derdora me dijmin e
Dixwazin me qir bikin
nav rûyên me ketine

Kes barê me ranake
Pêşkin ne xema xwe ne
Em lê xwedî derkevin
Ser milê te û min e

Îro şoreş bilind e
keç û xort derketine
Çep û rast lêdixînin
Gelek şehîd ketine

Jin û mêr alîkar bin
Karê me parastin e
Vê carê em bikevin
Tu car din rabûn tine

# Kurdino Berhev Werin

Mihemed Welîd*

Pir kes xwedî welat in
Azad û serbeşt in
Gihîştine aşta bilind
Em Kurd hîn bindeşt in

Em bi hev mijûl dibin
Her serxweş û meşt in
Wek gurê Îsa Mûsa
Bi canê hev ketine

Şerê birakujiyê
Dawiyê pişaftin e
Hesin bi hev dikutin
tim pêlan çêkirine

Di nav re tên xapandin
Xwe b'peran firotine
Beşek jî razayîne
Ser dozê raketine

*Di sala 1976î de li navçeya şera ya girêdayî herêma Efrînê hatiye dunyayê. Endamê yekîtiya rewşenbîrên Efrînê ye. Helbeşt û çîrokan dinivîse, niha sê pirtûkên wê hene. Herwiha ew hunermend û dengbêje jî.

Gazik ma rok ê hilê
Dil zanê çendî geş im
Bilbil heyrana gulê
Bilbilê çayê reş im

Bila xwîn bixulxulê
Evîndarê laleş im
Dîsa ferman dikelê
Hema îro bi coş im

Ji Avrînê ta Çelê
Xwedî ram û qilêş im
Ji hewraman ta palê
Dil polat û keleş im

Yekbûn bêhna gulê
Ger nebê perçelaş im
Ji dil derînin vê kulê
Qurbana çavê reş im

# Bazê Spî Me



Îsmet Hesen*

Bazê spî me hayê
Ji çakî dajom çakî
Sûnd bi serê te dayê
Tewr bernadim perçakî

Ketim derya sewdayê
Sewda firaz û çakî
Can û ceger min dayê
Bi her reng û awakî

Baz im lê şer naxwazim
Agir im dayika jînê
Hezar sal bermiraz im
Her bi şer û gazînê

Payî me l serê  kelê
Dijberî dêwê reş im
Şevê ji hev dişelê
Ji eşqan re bê hiş im

Helbest

*Di sala 1950î de li herêma Efrînê hatiye dunyayê. Yek ji damezrênerên SZKê ya Efrînê ye, Helbest û şano dinivîse.

Nema
nema xoşewîst
nema dayik
nema dost
ne jan
ne jî ew perpitîna lerzek a dilê zarokan
nema tiştekî di van dilê me yên
kevirbûyî de ji wan

Dema me tune bû
me nekarî xwe biçemînin û du dilopên
rondikan jî birijînin
li ser enîyên fireh ên wan mirovên ciwan
yên ku
di serê her demjimêrekê de li kêlekên me
diketin ser axê

Me lêda,
mîna siwarên çargavkî lêda û derbas bûn
ji kêlekên wan
û singên wan ên tazî ji bayê re hiştin…

# Dilên Dicengin

Evdirehman Çadircî*

Girî tune ye!
yên ku porê xwe dirûçikînin
mirovên ketine di nava me de
lewra
Jı bo ku em bi qurşûnan tilîliyan bilîlînin
me qurşûn heland li nava dilê xwe

Me birî
bi destên xwe yên ciwan birî
hîna di hejdeh saliyê de hemî
Rayên xwe yên evînê yên binefşî
û di navserên qeşagirtî de me li bayên
qerisînerê da
Xeyalên xwe mîna ebrûyan dest lê nehatin
dayîn

Hatin gule reşandin
tî
birçî
melûl mayîn
bi xetên qemitî re êdi em hincirîn mayîn



*Nivîskr û Helbestvan, ji Bakurê Kurdistanê ye.

bûn, ji şagirtan xwest ku erkê xwe yê malê derxînin û deynin li pêşiya xwe

Tevan erkê xwe derxistin, mamoste li wan yek bi yek geriya û ji wan re sererast dikir? dema giha rex Azad û jê xwest ku arkê xwe şanî wî bide?!

Azad jê re got : Min erkê xwe pêk naniye!!

Mamoste ziliheke xurt li rûyê wî xist, dewsa tiliyan hatin çapandin, dema mamoste Ji Azad pirsî : Çima te erkê xwe pêk neaniye?

Bi dengekî hêdî Azad got: Baweriya min bi tişta min xwendî ne hat!!

Mamoste got: Çima tu pê ne bawerî?

Azad got: Mamoste wê derfet hebe tu li min guhdar kî?

Mamoste got: Belê fermo rûne dawiya waneyê ez ê li te guhdar bikim ...

Piştî wane bi dawî hat, mamoste li Azad vegeriya û got: Ez amade me fermo Azadê hêja?

Azad got: Pirtûk dibêje: em welatekî zengîn in bi samanên ser zemînê û li bin zemînê, lê hîn mala me ji axê ye, cilûbergên min, pênûs û lênûsên min, tev alavên dibistanê ji dezgeh û kesên xudan qencî digihine me.

Pirtûk dibêje: Welatê min welatê xaz û gazê ye, lê bi rastî me ne xaz heye da dayika min xwarina xwe ser çêke û ne mazot heye da em xwe zivistana xwe li ber gerim kin, û hîn dayika min xwarina me ser tifikê çêdike bi tepik û qurmedaran...

Pirtûk dibêje: Welatê min welatê samana ye, lê her tim ez dibînim ku samanên me dûrî me koçdikin û berê xwe dide berîkên kesên din?

Pirtûk dibêje: Welatê min kandika lehengiyê û şehristaniyê ye, pirsekê di hişê min de derdixe: Gelo wê çima welatê min di landikê de bimîne û welatê kesên din her geş dibin û pêşve diçin, welatê min her li paş dimîne û yên din bi gelê xwe û şaristaniya xwe pêşve diçe û li ser yekbûna xwe ve dibe?

Her wiha pirtûk dibêje: Hemwelatiyên welatê me wekhevin di erk û mafan de, lê min wek mirov an jî wek hemwelatiyekî ji hemwelatiyên vî welatî, mafê xwe bidest nexistiye, û tim ez "Ayeta"

(ولكم في القصاصِ حياة يا أُولي الألباب)

Ji pirtûka pîroz dixwînim, ev bi xwe ew waneya welatê min e, ya ez pê nebawer, û min nikarî erkê xwe yê malê ji vê sedemê binivîsînim!!

Eva dest û rûyê min in, ji te re vedikim da sor bibin ji lêxistinê.

Wê çaxê rondikeke ziwa ji çavê mamoste hate xwarê û serê xwe kire ber xwe de û bê deng berê xwe jê guhart û çû û soz da xwe ku hew li şagirtekî bixe ji bo ne pêkanîna erkê malê...?!!

# Rastiya “Azad”!!

**Gelo wê çima welatê min di landikê de bimîne û welatê kesên din her geş dibin û pêşve diçin!!?**



Hesen Xalid*



Ew şagirtekî herî zîrek bû, di refa dehan de ye, Weke her roj “Azad” berê xwe da dibistanê bi dilgiranî!

Dema şagirt ketin refan de piştî “silava Alê” mamoste jî her yek li gor bernameya xwendinê li refan belav

*Di sala 1975an de li navçeya Girkê Legê ji dayîk bûye. derçûyê “ F. Civaknasiyê” ji zanîngeha Şamê, Firmanberekî ji kar dûrxistî ye, Bi zimanê kurdî û Erebî dinvîse û wergerandinê dike. Niha li Başûrê kurdistanê dijî.

■ **Tabloya Ferîd Heso**

berda. Dayika wê rondikeke dilşadiyê ji bo keça xwe herikand û got: Keça min! Xwedê te biparêze.

Dema ku Şiyar gustîlkê têxe tiliya Şêrînê, xewn û hêviyên wê dê bibin rastî. Dem bezî û katijmêr bûn çar û nîv berî ro here ava. Hingê mobayila Şêrînê lêket û numare ya Şiyar bû:

- Şêrîna dilê min! Min bêriya te kiriye.

- Min jî bêriya te kiriye, tu yê kengî werî?

- Piştî deh xulekan em ê ji malê derkevin û werin.

Dema ku Şêrîn û Şiyêr bi hev re dipeyivîn, dengê balefirên kujeran hate bihîstin. Hingê gund û bajarokên Çiyayê Kurmênc ên nêzîkî sînor bombebaran dikirin. Bû kutekuta dilê Şêrînê û got: Şiyar hay ji xwe hebin. Ev çi şens e? Tu û malbata xwe tên ji bo gustîlkê têxî tiliya min, vêca şer dest pê kir!

Şiyêr got: Şêrîna min bê xem be. Em ê mirazê xwe bibînin. Ez ji te…

Berî ku Şiyar gotina xwe bi dawî bike, dengê bombebaranekê erd û ezman hejand û Şêrînê di rêya mobaylê re ew deng bihîst. Hîn mobayl vekirî bû. Şiyêr bi dengekî qetqetî got: Ez ji te hez dikim. Aaax ez mirim.

Şêrînê kir qêrîn û bang kir lo Şiyar! Lê mobayil hatibû girtin.

Dayika Şêrînê li derve kir qêrîn û got: ``Balefirê li mala Şiyêr da``. Şêrîn ber bi mala Şiyar ve bezî, lê mal hilweşiya bû û şêniyên gund digotin: Xweda ji dewleta Tirk ne razî be. Tu kes ji mala bavê Şiyêr nema.

Şêrîn gihîşte nav xelkê û wek dînan li Şiyêr digeriya. Xelkê gund bi dest û lepan malbata Şiyêr ji bin herifandinê derdixistin.

Dema ku Şiyar derdixistin, gustîlka destgirtiyê ji bêrîka wî ket. Şêrînê xwe avête ser laşê Şiyêr û di ber girî re got: Nema tiliya min gustîlkan dibîne. Ez ê tiliya xwe ya nîşanê bikim hevala teltîkê û tola te bistînim. Oxir be.

# Hêvî Bû Tolvedan

**Nema tiliya min gustîlkan dibîne. Ez ê tiliya xwe ya nîşanê bikim hevala teltîkê û tola te bistînim**



Mîdiye Berekat*



Îro dilê Şêrînê ji şahiyê difire û wek pinpinîkên buharê semayê dike. Piştî pênc salan ji hezkirineke xweş, îro Şiyar û malbata xwe dê werin û Şêrînê bixwezin.

Şêrînê cilên xwe yên nû li xwe kirin, lêvên xwe sor kirin û porê xwe yê zer li ser bejina xwe ya zirav û dirêj de

*Di sala 1997an de li navçeya Şêrewa ya girêdayî Herêma Efrînê ji dayîk bûye. Li Zanîngeha Efrînê û piştre Li Zanîngeha Rojava beşa Ziman û Wêjeya Kurdî xwendiye, du Berhemên wê hene: Berxwedanistan(Roman), Rengên Êşan(Çîrok).

**Cimaeta wê pir hurmet e**

**Temam qedir û qîmet e**
**Welat me re cinnet e**

**Kurdistana me rengîn e**
**Karxana ve ew zengin e**

**Şaîr Mecidê Silêmîn e**
**Ev xeber hev anîne**

Di vê malbata şareza de nifşa sêyemîn ku bi hunermendiya xwe deng vedaye dengbêj Sîsa Mecîd e. Sîsa Mecîd di sala 1960î de li gundê Demirçiyê yê nehiya Masîsa Ermenîstanê welidiye. Di biçûkanî û ciwantiya xwe de bi stran û klamên dengbêjiyê mezin dibe. Bi dengê xwe yê wek bilbilan bala civatê dikişîne. Bavê wê Mecîdê Silêman di 16-17 saliya wê de, keça xwe dibe Radyoya Rewanê cem serokê radyoyê Xelîlê Çaçan û dengê wê dide qeydkirin.

Sîsa Mecîd bi Evdirehmanê Eylazê Hecîsilêman re dizewice. Du kur û qîzeke Sîsa Mecîd hene. Mêrê wî çend sal berê çû dilovaniya Xwedê.

Bi giştî di klamên gotî de hunermendê naskirî Xelîlê Evdila pê re li meyê xistiye. Klamên ku gotine bêhtirîn ji nivîskar Eliyê Evdilrehman hatine sêwirandin.

Sîsa Mecîd, di 21ê cotmeha sala 2019an de li gundê Aşîbûlakê yê bajarê Alma-Ataya Qezakîstanê jiyana xwe ji dest dide. Cenazê wê bi beşdariya girseyeke qerebalix li goristana kurdan a li Gundê Aşîbûlakê tê veşartin.

■ **Dengbêj Sîsa Mecîd (1960-2019)**

Sîsa Mecîd zêdetirîn bi klamên xwe yên Bavê Koroxlî, Were Malo û Memed Kanî tê naskirin. Kom muzîk bi navê Klamên Yêrêvanê / Kew Helûn albûmeke wê bi tevî Karapetê Xaco derxistibû. Tê de klamên wekî Bilbilo, Kew hêlun, De yoyo, Ha berde, Were lolo siwaro, Hey kalê, Heylo şênî cih girtibûn.

Sê nifş, sê deng, sê jiyan, malbateke jîr û şareza, bi hezaran bîranîn, xebatên dûr û dirêj û jiyanên watedar. Mihemedê Siloyê Miho bi şoreşgerî û dengbêjiya xwe, kurê wî Mecîdê Silêman bi dengbêjî û helbestvaniya xwe û qîza wî Sîsa Mecîd bi hunermendiya xwe di çand û dîroka Kurdan de cihekî taybet digirin. Eşkere ye jiyaneke bi vî awayî nakeve para her malbatê.

piştî şerê Ermenî û Azeriyan hatine Qezakîstanê û li vî gundî nîştecih bûne. Li Aşîbûlakê nêzîkî 700 malên Kurdan hene. Kurdên li vê derê ji hev re pir hurmetkar û wek bira ne. Zarok û civata wan giş kurdî dizanin û pev re kurdî diaxivin. Nifûsa Kurdan ji Qazakan gellek zêdetir e. Helbestvanên navdar Bariyê Bala û Hesenê Hecîsilêman jî piştî hatina ji Ermenistanê li vî gundî bi cih dibin.

Mecîdê Silêman di sala 1992an de li Qezakîstanê, li gundê Aşîbûlakê koma şano û govendê ava dike. Tevli avabûna rêxistina Yekbûnê dibe. Di rêxistinên Kurdên Sovyetan de bi çalak cih digire.

Qezakîstan gellek derfet dide Kurdan, bi saya piştgiriya dewletê pirr kitêb, kovar û rojnameyên kurdî tên derxistin. Kurdên li Qezakîstanê ji bo pêşketin û ronîkirina civatê Kovara Nûbar û Rojnameya Jiyana Kurd derdixin. Nûbar û Jiyana Kurd bi zimanê Kurdî, Rûsî û Qazakî derdikevin. Di herdu weşanan de alfabeyên latînî û kîrîlî tên bikaranîn. Tevahiya nivîsaran bi zaravayê kurmancî têne weşandin. Heta beriya deh salan dibistanên Kurdan li herêmê hebûn, zarokên Kurdan bi Kurdî perwerde didîtin, lê bi biryarekê derfetên perwerdeya Kurdî hatin betalkirin û rakirin. Di nasname û pasaportan de navê neteweya Kurdan wek Kurd tê nivîsandin. Dewleta Qezakîstanê nasnameya Kurdan nas dike, tu zext û zordariyê li ser Kurdan nake.

Çar qîz û sê kur, heft zarokên Mecîdê Silêman hebûn; Sîsê, Sînem, Sêvdîn, Nesredîn, Semedîn, Sorgul û Tamîle. Sê navên pêşî rehmet kirine, çar mane.

Kedkarê Radyoya Erîvanê, dengbêj û helbestvan Mecîdê Silêman piştî ewqas salên bi xebat û tekoşînê derbasbûyî di sala 2018an de jiyana xwe ji dest dide. Ji aliyê dost, xizm û hezkiriyên xwe ve li Qezakîstanê tê binaxkirin.

Kom Muzîk di sala 2018an de bi navê Klamên Yêrêvanê albûma Mecîdê Silêman bi tevî Zadina Şakir derdixe. Tê de klamên naskirî Sêmlo, Wez Teyr im, Berbenî, Gazî Dikim, Lê Gidiyê, Tencorê, Bejnê û gellek klamên din cih girtine.

Dixwazim bi helbesta wî ya Kurdistanê dilê we şa bikim ku hûn lê binêrin dengbêjekî zîrek û wêrek çawa bi helbestvaniyeke serkeftî rihê me aram û geş dike.

**Welatê me Kurdistan e**

**Welatê me Kurdistan e**
**Cîh û meskenê me Kurdan e**

**Welat me re rûh û can e**
**Milet tê de bira ne**

**Welatê me pir şîrîn e**
**Temam mêrg in û zevî ne**

**Qîz xortê wê tev cindî ne**
**Eslê xwe ve Horî ne**

**Kurdistana me zeynet e**

Di sala 1955an de bi vebûna Radyoya Rewanê ya beşa Kurdî re gellek hunermendên Kurd wekî Karapetê Xaço, Şeroyê Biro, Reşîdê Baso, Zadîna Şekir, Efoyê Esed, Egîdê Têcir, Memoyê Silo, Şibliyê Çaçan, Asa Evdile, Belga Qado, Xelîlê Evdile û gellek hunermendên din dengên xwe digihînin Kurdên çar aliyên dinyayê.

Mecîdê Silêman, di wan salan de bi klamên denbêjî û helbestên xwe yên xelkî, balê dikişine ser xwe, ew bi qîza xwe Sîsa Mecîd re ji bo tevli xebatên Radyoyê bibin diçin Rewanê. Wî ji sala 1961ê hetanî sala 1980î di radyoya Rewanê de dengbêjiyê kiriye û kilam gotine. Îro nêzîkî 100 klamên Mecîdê Silêman û 50 klamên Sîsa Mecîd di arşîvên radyoyê de qeydkirî ne. Helbestên Mecîdê Silêman li Ermenîstan û Qezakîstanê dibin pirtûk. Helbestên wî di rojname û kovarên Rûsya, Qazakîstan û Ermenistanê de tên weşandin. Helbestên wî yên herî naskirî; Welatê me Kurdistan, Heta Kîngê, Bedewê û Sînemê ne.

Mecîdê Silêman, di sala 1964an de li Enstîtûya Çandiniyê ya Êrîvanê beşa beytariyê diqedîne. Ew heta şerê Azerî û Ermeniyan (1988-1994) bi malbata xwe re li Ermenîstanê dijî. Ew bi derketina şer re mal û milkên xwe li pey xwe dihêlin û mecbûr dimînin diçin bajarê Krasnodarê. Rewşeke kambax tê serê Mecîdê Silêman, qîza wî li bajarê Krasnodarê jiyana xwe ji dest dide. Mecîd bi hemû xemgînî û êşên xwe ve dixwaze qîza xwe bispêre axê, lê rayedarên li vê derê ji ber mahneya ‘’nasnameya we tune’’ nahêlin gora wê bê definkirin. Bi vê karesatê berê xwe didin Qezakîstanê. Di bajarê Alma Atayê li ba Kurdên ku di sala 1944an de bi fermana Stalîn hatibûn sirgûnkirin bi cih dibin. Debara malbata xwe bi xweyîkirina ajalan didomînin.

Kurdên Sovyetê heta niha bi sê qonaxan hatine sirgûnkirin û mexdûrkirin. Qonaxa yekê di sala 1937an de dest pê dike. Yekîtiya Sovyeta Sosyalîst li 7ê Tîrmeha 1937ê biryarek derdixe ku ev biryar dibe sedema koçberiya kurdan. Bi tevî zar û zêçên xwe di dawiya payîza 1937an de kurdên Ermenistan û Azerbaycanê ber bi Qezaxistanê ve tên sirgûnkirin.

Ya duyemîn di sala 1944an de bi fermana Stalîn pêk tê. Kurdên reben ji sala 1937an heta sala 1956an bi statûya ‘’Penaberên Taybet’’ di bin şert û mercên zehmet de jiyana xwe derbas dikin.

Qonax û sirgûntiya sêyemîn bi derketina şerê Ermenî û Azeriyan (1988-1994) çêdibe. Kurdên me dîsa bi mecbûrî koç dikin ku neyên qirkirin.

Mecîdê Silêman jî piştî vî şerî bi malbata xwe re dikeve rêyên dûr û dijwar di Aşîbûlaka Qazakîstanê de bi cih dibe. Aşîbûlak 15-20 kîlometre dûrî Alma Atayê ye û piraniya nişstecihên vî gundî li Alma Atayê karê bazirganiyê dikin. Hinek Kurd jî debara mala xwe bi çandinî û xwedîkirina heywanan dikin.

Piraniya Kurdên Aşîbûlakê

■ **Dengbêj û helbestvan Mecîdê Silêman (1937-2018)**

Dengbêj û helbestvan Mecîdê Silêman ji eşîra Brukan e, kurê dengbêj û şoreşger Mihemedê Siloyê Miho Zakavkaz e. Eşîra Brukî di sala 1600î de ji Qerejdaxa Diyarbekirê koçî Wan, Îdir, Qers, Makû, Xoy, Nehcivan û Rewanê dibin. Piştî şoreşa Lenîn hinek vedigerin Kurdistana Bakur, yên din jî ji Ermenîstanê bigire heta Ûris, Qazakîstan, Azerbeycan, Îranê belav dibin welatê din, jiyana xwe bi vî awayî didomînin. Ev eşîr ji van milan pêk tê: Qirmizkî, Reîskî, Mamkî, Hacimkî, Xaskî, Girmuvkî, Karkî, Şarkî, Cicikî, Alkî, Şawlikî, Pîrkî, Beşkî, Banokî, Hesenkî û Gutkî.

Mecîdê Silêman di sala 1937an de li gundê Semenkaşê yê nehiya Kotaykê ku girêdayî Komara Ermenistanê ye ji dayik dibe. Navê wî yê rastîn Mecîdê Mihemedê Silo ye. Dema bavê wî Mihemedê Siloyê Miho şehîd dikeve heft salî ye. Mecîdê Silêman ji aliyê pîrika xwe Sîsê û kalikê xwe Silo vê tê xweyîkirin. Piştî kalik û pîrika wî diçin ser rehmetê, apê wî Evdoyê Îsa wan digire ba xwe û li wan xwedî derdikeve û mezin dike.

Di zaroktiya xwe de, aliyekî diçe dibistanê bi Azerkî hînî dersên xwe dibe, li aliyekî piştî dibistanê şivantiyê dike. Ew û birayê xwe heta ciwantiyên xwe gellek rojên zor û zehmet dibînin. Mecîd aşiqê klamên Kurdî ye. Bi dengê xwe yê xweşik di nava demeke kurt de bala civatê dikişîne.

**qulinqên reş û spî deng vedide bi tenê per û baskên wî tune ne ku bifire di nava esmanan de.**

Di wan çaxan de min nizanîbû ev dengbêjê rûqemer, dengqemer Mecîdê Silêman bû. Di civat û cimaeta Brukan de bi navê Mecîdê Brukî dihate naskirin. Çend wext berê Semedînê Mecîdê Silêman ku kurê Mecîdê Silêman e qala serpêhatiya bav û kalê xwe dikir.

Wê demê Hesenîkê Bala hat bîra min. Hesenîkê Bala mirovekî delodîn, şervan, şoreşger û welatparêz bû. Di navbera salên 1940î û 1946an de bi qehremanî ji bo avakirina Komara Kurdistanê hewl dide û dixebite. Li gor gotina wî, hem Mihemedê Siloyê Miho ku bavê Mecîdê Silêman e hem jî dengbêjê navdar Hemîdê Ûsivî rêhevalên wî yên şer bûne. Hesenîkê Bala û Mihemedê Siloyê Miho pêşî di eniya Mahabadê de piştre jî di nava tevgera Mele Mistefa Barzanî de xebatên siyasî û eskerî dikin. Hesenîk eşkere ye bîra jiyana malbatî dike vedigere axa Wanê, dizewice piştî çar salan şûn de koçî Makûyê dike û li wir di 94 saliya xwe de jiyana xwe ji dest dide.

Hemîdê Ûsivî bavê hunermend Kawa Urmiye ye ku di sala 1926an de li gundê Morê yê li Geliyê Diryan tê dinyayê. Piştre malbat koçî gundê Kuranê yê herêma Tirgewera Urmiyê dibin. Hemîdê Ûsivî di sala 1979an de li bajarê Urmiyê jiyana xwe ji dest dide, li goristana gundê Kuranê tê binaxkirin.

Bavê Mecîdê Silêman dengbêj û şoreşger Mihemedê Siloyê Miho di sala 1917an de koçî bajarê Wanê dike, lê ji ber şer û pevçûnên dewletên Ûris û Osmaniyan berê xwe didin Îran û Naxcivanê. Heta dawiya şerê cîhanê yê yekemîn di Gurni û Aryulniyê de bi cih dibin. Ew şer ji sala 1914an heta 1918an dewam dike. Dema zivastanan li dor Çemê Erezê, dema havînan li dor Beyazida Nû, Gondeyan, Nuliduz û Akhmuganê jiyana xwe derbas dikin. Dema ku herêma Dîlê dikeve di bin nîrê sînorê Ûrisan de berê xwe didin bajarê Rewanê.

Mihemedê Siloyê Miho, piştî ku dibistana mamostetiyê diqedîne li gundê Davîtaşên dibe muxtar û bi tevî malbata xwe li vî gundî bi cih dibe, bi navê Têmir û Mecîd du kurên wî çêdibin. Mihemedê Siloyê Miho car caran ji bo xebatê ji Rewanê diçe hem Başûr hem jî Rojhilatê Kurdistanê û piştre vedigere cem malbata xwe. Ew di sala 1946an de ji bo avakirina Komara Kurdistanê tevli tevgera Qasimlo dibe. Di çeperên şer de bi navê Îsa Begê Rewanî tê naskirin. Mihemedê Siloyê Miho li Rojhilatê di berxwedana şoreşê de şehîd dikeve. Semedînê neviyê Mihemedê Siloyê Miho dibêje: Du kur û qîzeke kalikê wî li Rojhilatê çêdibin, lê ew nas nakin ka kî ne, li kîjan bajarî dimînin, loma pirr dixwazin zarokên kalikê xwe nas bikin, bi wan re têkevin têkiliyê, hev nas bikin wek malbatî hev hembêz bikin.

# Sê Nifş, Sê Deng, Sê Jiyan

**Malbateke jîr û şareza, bi hezaran bîranîn, xebatên dûr û dirêj û jiyanên watedar. Mihemedê Siloyê Miho bi şoreşgerî û dengbêjiya xwe, kurê wî Mecîdê Silêman bi dengbêjî û helbestvaniya xwe û qîza wî Sîsa Mecîd..**

Occo Mahabad*



Dema ez zarok bûm rojekê xalê bavê min Hesenîkê Bala di destê wî de du heb bandên teyîbê, hat li ber min sekinî, bandekê avêt ser teyîbê, dengekî esmanî belav bû odeyê.

Min got: Hesenîk ev kî ye?

**Xwedê bela xwe nede te, tu çawa nas nakî ev Mecîdê Brukî ye mîna**

Helbestvan, bernamenûs, wergêr û nivîskarekî Kurd e. di sala 1977′an de li Wan‘ê hatiye dunyayê. Piştî qedandina zanîngeha Stenbolê dest bi nivîsandinê dike, pir kovar û malperan de nivîsên xwe diweşîne. Herwiha Pir fîlmên biyanî û çend bernameyên kompîturê ji aliyê wê de hatine kurdîkirin. Pirtûkên wî: Helbestên Dînik:Weşanên Ava-2012, Êşên Qehbik:Weşanên Do-2013, Rondikên Binevşê: Weşanên Do-2016, Dem:Weşanên Na-2017, Bi Dizîka Were: Weşanên Na, 2018, Gotinên Pêşiyan û Nifirên Kurdan-Weşanên Jj , Antolojiya Helbestvanên Nûjen – Weşanên Na




Navê pirtûkê: **Hevalê Çak /Osman Sebrî /Hemû pexşan**

Nivîskar: Osman Sebrî

Naverok: Pexşan

Pirtûk ji gotar û nivîsên pexşanî yên nemir Osman Sebrî pêk tê ku du birên wan di demên cuda de di kovarên Hawar û Ronahiyê de hatine weşandin û birê sêyem jî ji hinek destnivîsan pêk tê ku ev cara yekem e tên weşandin. Naveroka piraniya van gotar û nivîsan li ser camêrî, mêrxasî, lehengî, serhildanên gelê Kurd, qewimîn û malkambaxiyên ku hatine serê Kurdan, fen û fîtên dijminan û parçekirina çarenivîsa gelê Kurd e.

Bi rêya xwendin û lêkolîna li ser van gotar û nivîsan, mirov dikare rewşên civakî, olî û rêzanî di destpêka sedsala bîstan de li Kurdistanê, nemaze li Bakurê Kurdistanê, nas bike û li ser bisekine.

Hejmara Rûpelan: 239

Cih û Dîroka Weşandinê: Weşanxaneya Lîsê / 2021

---




Navê Pirtûkê: **Nameya Serencamê yan jî Kelama Xezînêyê**

Nivîskar: Dr. Sadîq Safîzade

Naverok: Pirtûka Pîroz Ya Yarsanan

Ev pirtûka li ser Ola Yarsanê bi xebateke dûr û dirêj hatiye berhevkirin û şîrovekirin ku yekemîn car e bi kurdiya kurmancî çap dibe.

Ev pirtûk ku girîngtirîn û pîroztirîn pirtûka Yarsanîyan (Ehlê-Heq) e, li ser bingeha "Donadon" anku zihûra (tecelîya) ruhê di bedenî de hatîye hûnandin û vê dinyayê wekî heqîqetek ji dinyaya din dibîne.

Pirtûk ji şeş beşan pêk tê. Ev metnên resen ên ku bi zaravayê Goranî wek raz û helbest hatine hûnandin bi awayekî zelal hatine latînîzekirin û piştre jî her beş hatiye wergerandin û şîrovekirin û têbînî li ser hatine zêdekirin. PiranIya mijarên pirtûkê îrfanî û felsefî ne û ev mijar encama hizir û ramanên zanyar û bîrewerên wê herêmê ne ku di sedsala heftan û heştan ya koçî de dijiyan. Ji bo lêkolînerên ku lêkolîna dîn û rê û rêbazên ayînî û efsanewî dikin rêbereke baş û kêrhatî ye.

Hejmara Rûpelan: 665

Cih û Dîroka Weşandinê: Weşanxaneya Sîtavê / 2021

Navê Pirtûkê: **Di Bin Siya Evînê De**
Amedekar: Mihemed Welîd
Naverok: Destan

Ev Pirtûk çar destanên evînê yên kurdî digire nava xwe:(Bêrîvan Cindî, Ferhad û Şêrîn, Aşiq Kerem, Dildar û Dîlber).

Ev destan bi Kurmancî, Devoka Efrînê (Çiyayê Kurmênc) hatiye nivîsîn.

Gotina Amedekar Mihemed Welîd ev e:"Piştî xebata min bi gelek salan di qada hunerê de û bi taybetî di dengbêjiyê de, ez gihîştim gelek encaman ku îro jî ez dixwazim bi nifşên nû re parve bikim. Ji ber ez bawer dikim ku ger welat dê biserkeve divê şagirtên me û xwendakarên me destan, kelepor û stranên me biparêzin. Ji ber di wan stranan de dîroka gelê me diyar dibe. Bila her kese bizanibe ku di Çiyayê Kurmênc (Kurdagê) de, tevî ku li pir deverên din ên Kurdistanê wendabûne, gelek destan û stran hatine parastin".

Hijmara Rûpelan: 78

Cih û Dîroka Weşandinê: Ji weşanên Yekîtiya Rewşenbîran-Herêma Efrînê

Weşanxaneya Şilêr – Qamişlo/ 2020

---

Navê Pirtûkê: **Serwer**
Nivîskar: Raperîn Hesen Gulkewî û Ednan Mistefa
Naverok: Şano

Şanoya serwer li ser desthilatdariya ku hewl dide bi rêya (fêlbazî û xopandin, vir û vît, partîbûn, parçekirin, dizîn, kuştin, komkujî û girkirina şerê navxweyî) civakê ji damaran ve hilqetîne û sûrgûn bike, hatiye nivîsandin, û xwe dispêre her du dibistanên realîzm û sembolîzmê.

Ev şano di sala 2014'an de li tevna hunerî ketiye. Her wiha di festîvala Mîtan a duyemîn û vekirina Komîngeha Şanoyê ya Bakurê Sûriyê de hatiye pêşkêşkirin û sê xelat wergirtine.

Hejmara Rûpelan: 58

Cih û Dîroka Weşandinê: Desteya Çandê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê / 2021



Navê Pirtûkê: **Çend Mijarên Cuda Ji Çanda Kurda**

Nivîskar: Salihê Heydo

Naverok: Gotar û Lêkolîn

Ev pirtûk ji çend gotar, bend, lêkolînên cuda û mijarên hemereng hatiye dahênan. Mijarên van gotar û bendan bi çand, ziman, gerdiş, folklor û dîroka kurdan ve girêdayî ye. Hin ji wan di çend kovarên kurdî de weke Gulîstan, Zanîn, Buhar, Welat û Şermola de hatine weşandin. Ji mijarên wan gotar û bendan: Kurd û kirîvantî, Kobanî, Cil û bergên jina kurd, Cil û bergên mêrê kurd, Çîvanok çi ye?, Taybetmendiyên biwêjên kurdî.

Hejmara Rûpelan: 142

Cih û Dîroka Weşandinê: ji weşanên Desteya Çandê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê / 2021

---




Navê Pirtûkê: **Ax û Welat-2**

Nivîskar: Welîd Bekir û Şerîf Mihemed

Naverok: Lêkolîn

Ev pirtûk belegeyke dîrokî, çandî û zanistî ye, der barê gundên herêma Efrînê ya ku niha di bin dagirkeriya Tirk û çeteyên wê de ye.

Ev pirtûk der barê (40) gundên herêma Efrinê de ye, li ser dîrok, eşîre, hejmara malan, erdnîgarî, çalakiyên mirovî, navdar û kevneşopîyên xelkên wan gundan e.

Navê wan gundan evin: (Bablîte, Gazê, Kanî Gewrikê, Kever Mazê, Qujîma, Tetera, Gemrûkê, Heyatê, Kurka Jîrîn, Omo, Rûta, Sêmalka, Şorbe, Sariya, Bircikê, Çetel Ziyaretê, Bircikê Silêmên, Birc Ebdalo, Dêr Mişmiş, Fafirtînê, Keştearê, Berkaşê, Bêxçe, Bîkê, Qota, Şerqiya, Suriya, Dêrwêş, Mersa, Qerqîna, Serîncekê, Çîyê, Elemdara, Eltaniya, Etmana, Hecika, Kurê, Xirbê Simaq, Xirbê Sulik, Ehrezê).

Hejmara Rûpelan: 162

Cih û Dîroka Weşandinê: Desteya Çandê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê / 2021

# Pirtûkên Derketî

Navê Pirtûkê: **Kela Qumriyê**
Nivîskar: Merwan Berekat
Naverok: Roman

Dema ku mirovek dibêje kela, belkî serast mîr li bîra mera tên, carna jî berzî û endazyarî li bîra mera tên, carna şer, êrîş û berevaniya bi şûr, rim û tîrekevanan li bîra mera tên. Lê rastî ne tenê wisa ye. Di hundirê her kelayekê de, ne tenê mîr, lêbelê kole, xizmetkar û keçên ji bo sermayê û perwerdekarên hespan jî hebûn, Zindan û bîrên xwînê jî hebûn.

Di hindurê her mirovekî de jî kelayek heye, ya hinan kela zorê ye, ya hinan kela berxwedanê ye, ya hinan kela koledariyê ye, ya hinan kela koletiyê û ya hinan kela evînê ye. Jiyan jî kela ye.

Lê kelayeke duderî ye. Deriyek zanîn û yek jî nezanîn e. Deriyê zanînê mirov, civak û gel derbasî qadên hêminî, aştî, aramî û xweştirîn demê dike. Her wiha derbasî qadên pêşketin, pêşvebirin, hezkirin, wekhevî û rastiya mirovatiyê dike. Deriyê nezanînê jî mirov, civak û gel derbasî qadên şer, kuştin, dijîtî, kîn, lihevnekirin. Her wiha derbasî qadên nexweşî, Hawar, birîn, nalîn, perîşan û tiriş û tûjiyê dike.

Tê gotin: "arîşeyên ku hertim di navbera ronahî û tariyê de, jiyana mirovahiyê çalak dike". Belê hin kela warê Qumriyan in û hin jî warê hêlûna Kurdan in.

Hejmara Rûpelan: 148

Cih û Dîroka Weşandinê: Weşanxaneya Şilêr, Qamişlo/ 2021

Çanda gelan neyê parastin aqilê azad ên civakan jî nayê parastin.

Weke tê zanîn di zimanê Sumeriyan de "Amargî - Azadî" ku bi wateya vegera li çand û xwezaya xwe ye, hezar perde li ser hatine barkirin û ji wateya wê hatiye derxistin. Jinên ku li du çandên sexte dikevin nikarin bibin bersiv ji vegera resentiya çanda dayik û xwezayê. Xeml û xêza madî hetanî cihekî ye, jê û şûn de raman, hişmendî û aqilê civakî pêwîst dike. Bi hezarê salan e ev zihniyet berdewam e, lê nayê wê wateyê ku êdî çarenûs e û dikare her tiştî xera bike. Ma nexwe tayek zirav di navbera çanda madî û ya resen de heye, ew ta dikare bibe sedema xerakirina hevsengiya civakî, sedema avakirina civakeke demokratîk û bi xislet.

Di kaniya herikîna jiyanê di cewhera jinê de ev herdu feraset diçin û tên, wekî: (tarîtî – ronahî) (reş – spî) û (qencî – xerabî). Pirsa herî girîng ev e: çendî jin dikare têkoşîn û şoreşê bide meşandin ji bo bi serxistina ronahiya jiyanê ya di hudirê xwe de? Ger jin ji çanda xwe û resentiya xwe hêza erênî negre nikare li beramberî çanda sexte ya ku bi ziravî li ser tê feriz kirin li ber xwe bide. Hişmediya kapîtal ne kêm e ku bi hemû rêbazên boyaxkirinê bikaribe civakê bixapîne û jinê di tarîtiyeke ji "xwe" ya xwe dûr pêşbixe.

Bila jinên Rojhilata Navîn xwe nexapînin ku civakên Ewrupî mîna jinên civakên me nazenîn, xwezayî, narîn û pak in. Li "xwe" ya xwe veger gava herî sereke ye. wê demê çanda herî resen a ku ji boyaxkirinê dûr e, cewher û naveroka jiyanê parastî dihêle esas e. Weke rêhevalê jinê jî Rêber APO di nirxandinên xwe da dide diyarkirin:

***(Li hemberî mêr sekna jinê, li hemberî kal û pîran sekna ciwanan, li hemberî serekeşîr sekna endamên ji rêzê yên eşîrê, li hemberî nûnerê dîn û mezhebê sekna cemaeta mumîn bi adab û rêzikên gelekî zelal hatibûn diyarkirin. Ji rabûn û rûniştinê heta bi tona dengê wan otorîteya desthilatdar û yên mijara rêveberiyê ne, kitebikite xwedî rêzik û pîvanan bûn. Bêguman ji ber ku desthilatdarî û dewlet hê kêmtirin di vî warî de hewl didin otorîteya xwe ava bikin û ev jî tê fêhmkirin. Li gorî vê jî amûrên rewakirinê û perwerde pêşkêş dikirin.).***

em wisa têdighên ku pergala desthilatdar dikare hemû ziraviyên jinê, civakê û her kesî pir bizanebûn perwerde bike. Lewra berxwedaniya herî mezin li ser hişmendiya jin – dayikê zanebûn were li pêşxistin. Her çendî şoreşa Rojavayê Kurdistanê şoreşa jinê di nava şoreşê avakiriye jî, lê belê hîna em di destpêka gavên yekemîn de ne. Çanda jin – dayikê neyê vehewandin wê tu resentiya hebûna heyî nemîne, wê hebûneke sexte be, bêwate be, ji bedewiyê dûr be. Lewma çavkaniya hemû xweşikiyan û safbûyînan di pîvana çanda bi kok de jiyana civakê dibe xwedî hebûn, ew hebûn jî azad dijî.

■ Tabloya Sîmav Emîn

ji du cureya ne, yek ji wan gelek kar dikin, yê din jî li ser keda yên din dijîn, bi hêvî me tu ji wan kesên yekemîn bî". Andêra Gandî yek ji wan jinan bû bîr û baweriya wê bi kedê, kar, xebat û tekoşînê dihat. Her demê ji bo jinan digot: "Eger jin bi xwe, xwe mezin neke tu kesek wê mezin nake."

Ger em rûpelên dîrokê rast bikolin ne tenê li cîhanê li ser xaka me Mezopotamiyayê bi hezaran jinên ku bi qehremantî, ne bi gotinê tenê çanda dayika xwedawend bi hebûn kirine, bi exlaq û çanda jin a resen avakirin. Dema ku jin dibe çavkaniya afrîneriya civakî wê demê bingeha zanist û felsefeya jiyaneke azad jî di gel hemû neslan de wekî çandekê tê pêşxistin. Ev yek bandora xwe ne tenê di hêla manewî de dike, lê di warê jiyanî û fîzkî de jî digre. Nexasim di warê huner û exlaqên civakî de gelek hemdemîbûn ava dibe. Em dikarin eşkere bidin diyarkirin ku jin çanda kirêtî – xweşkî di civakan de zelal dike. Bi wê çandê jî jiyanê balkêş dike.

Em qet nikarin bibêjin ku civakên rojavayî pêşketine û civakên Rojhilata Navîn paşketî ne. Ev hişmendiyeke ji hêla pergalê ve hatiye nîşandan. Weha miletên Rojhilata Navîn dane bawer kirin ku ji çanda xwe dûr in, ji exlaqê xwe yên resen jî bê par in. Bi van ramanên sitemkarî civakên me dane xaopandin. Lewma mijara herî sereke (jin) e ya ku pêwîst e çanda xwe ya resen vegerîne û bikaribe çanda jin – dayikê çanda civakbûyînê zindî bihêle.

û nirxandinên vê demê de derdikeve ku pergala kapîtalîzmê xwedî bandor e, dikare cîhanê bi rêve bibe û ew ê dawiya jiyanê bîne. Lê bila em ji bîr nekin ku hêza herî xurt û qet tu kes nikare bi dawî bîne ew hêza (aqilê civakî) ye. Ya ku vê hêzê dihûne û dike rengê jiyanê ew jî jin e. Di vê mijarê de lewaziyên mezin û xeternak cîhana me dijîn.

Ji ber ku ev hêz her demê hatiye çewisandin, talankirin, biçûkxistin û tepisandin, weha kiriye ku di asoyên hemî civakan de ev hebe ku bê kapîralîzmê cîhan nema dikare bijî. Rast e kapîtalîzim wekî pergal û hişmendî ji hêla madî, teknelojî û rojan civakan bi reng bike xwedî hêz e, lê misoger nikare bibe hêza jiyanê û cewhera jiyanê bide guhertin. Gava em li welatê Urûkê lêkolînan dikin û li nivîsandinan meyze dikin, bi taybetî helbestên Iştarê em her di wê felsefê de herikîna jiyanê dibînin. Iştar ne tenê weke jin di dîrokê de hatiye nasîn, berevajî ew bi xwe ferlsefeya jiyan û azadiyê ye. Xwedawenda Iştar ew bingeha çanda jiyaneke resen e. Loma em dikarin bibêjin ku kapîtalîzm dixwaze bi hezarê sala ne xwe bike altarnatîfa wê çanda resen. Armanca sereke ew e ku jinê mîna metayekê bikar bîne. Tenê bimîne li şûna çanda jin – dayikê bimeşîne çanda hebûneke bêexlaq, bêpîvanî û ji ruhê jiyanê dûr zindî bimîne.

Gelo bi jinên ango insanên sexte wê çawa civak û jiyan bikaribin di nava çanda resen de bijîn? Ew jina ku nayê nasîn ne nêr e, ne mê ye, ne ya xwe ye, ne ya kesên din e, ne dixwaze ji bo xwe bijî wekî nasnema civakî ne jî dixwaze wekî pergala heyî bijî!! Ev hemû pirsên girîng in ku mirov bikaribe careke din lêkolîn bike. Di nava vê pergalala mirinê de çawa jin dikare xwe biparêze û çanda jin – dayikê zindî bihêle.

Di kîjan civakê de jinên ku dûrî axê, hezkirina welat, çandinî û çiyayên xwe dikevin di nava pençên boyaxên sexete nikare xwe ji destavêtinê, kuştinê û mirinê rizgar bike. Her demekê pergala kapîtalîzmê ji xwe re moda, cins, sporê esas digire û tenê jin amûra herî sereke ye ku bikaribe civakê ji aqilê wê yê azad dûr bixe.

Yek ji wan jinên ku bi koka xwe ji reşkên Amerîkayê jî bû, 1885an li Morice ji dayik bû, di 1977an de wefat kiriye. Yek ji wan jinên ku daxaza mafên jinan di wekheviyê de dikirin, bû. Tevgereke jinan saz kirin û têkoşîn dikir ji bo ku zagonên di nava destûra Amerîkî de bên guhertin. Yek ji wan axavtinên wê yên navdar ev bû: “Çendîn hizir dikim nikarim bawer bikim ku em jin di cîhanekê de dijîn ku ji wekehvî û edaletê dûr e, ne em tenê ev cîhan çawa dikare pergleke bêwekhevî tehemul bike. Di vir de rola jinê di hemû qadên civakê de hatine qels kirin, çi aborî, çi civakî û çi siyasî be.”

Andêra Gandî jî dibêje: “Carekê ji caran kalikê min ji min re got: (Xelk

# Jin Di Navbera Çanda Resen û Sexte De

**Li ser xaka me Mezopotamiyayê bi hezaran jinên ku bi qehremantî, ne bi gotinê tenê çanda dayika xwedawend bi hebûn kirine, bi exlaq û çanda jin a resen avakirin.**

Nêrgiz Ismayîl*



Em di sedsala 21'mîn de ne. Pergala cîhanî ne tenê hişmendiya kapîtalzmê ye. Civak û hişê dîrokê dide isbatkirin ku di her pêvajoyên cîhanê û dîrokê de jinê mohra xwe li her erdnîgariyê ango demê daye. Dibe di navebera navên jinan an jî erdnîgariya ku tê de jiyane ferq û cudahî hebin, lê belê jin li ku derê bibe bila bibe li wê derê şopeke xwe hiştiye. Di hin nerîn

*Nivîskar û rojnamevan, Di sala 1975an de li Qamişloyê hatiye dunyayê, hetanî dibistana navîn xwendiye, di pêvajoya biçûkaniya xwe de di nava xebatên çand û hunerê de maye. Karê wêje û ragihandinê dike, çend pirtûkên wê yê çapkirî di aliyê (Roman, Helbest, Pexşan) hene.

bidin zimanê devkî. Zayenda peyvan heye, nexwe divê em rêzik û pîvanên wê diyar bikin û hwd. Zimanê nivîskî divê ji zimanê devkî pir dûr nekeve, lê belê nabe ku bi temamî zimanê devkî bingeh were girtin, lewre zimanê devkî guhêrbar e, li gorî herêm, hoz û eşîran; hin caran li gorî malbat û bavikan diguhere. Em kîjan devokê bingeh bigirin? Di zimanê me de pirî caran rêzikek di tu devokan de bi awayekî têr û tesel nehatiye parastin, lewma jî zimanê nivîskî nikare tu devokan ji sedî sed bingeh bigire.

Di kurmancî de Mîr Celadet Bedirxan li gorî hêz û şiyana xwe ev yek kiriye, lewma îro xebatên wî rêya me ronî dikin, lê belê di xebatên wî de jî hinek kêmasî balê dikêşin. Bo nimûne ew dibêje, alfabeya kurmancî alfabeyeke fonetîk anku hemû dengên bingehîn ên kurmancî di nava xwe de dihewîne, lê belê fonemên hilm û nehilmî (p,ç, t, k) bi heman tîpan nîşan dide.

**-Gelo çima ew rêbaza hêsan ku cenabê te di berhemên xwe de bi kar tanî û erêkirinek li cem giştî kurmancîaxêvan hebû, nexasim li Rojavayê Kurdistanê, ew rêziman û rastnivîsê çima berdewam nebûn?**

Pêdiviya kurmancîaxêvan bi rêziman û rastnivîsîneke yekgirtî heye, îro her çiqas di warê rêziman û rastnivîsînê de di nav hin kurmancîaxêvan de hevgirtineke hebe jî, kurmanciyeke standart pêk nehatiye. Îro kurmancên behdînî bi awayekî dinivîsin, kurdên Sovyeta berê bi awayekî, sazî û dezgehên li Ewropa û bakurê Kurdistanê bi awayekî dinivîsin. Pêwîst e em hêz û zanîna xwe bikin yek û rêbereke rastnivîsînê ya ji bo hemû kurmancîaxêvan derxin hole. Xebata ku me di bin banê Weqfa Mezopotamyayê de kir jî di vî warî de hewldanek bû. Îcar dê çendî cihê xwe bigire em nizanin. Lê ji bo kurmanciyeke yekgirtî divê xebatên bi vî rengî zêde bibin.

**-Ji hêla perwerdehiyê ve, astengiyên li pêşiya zimanê kurdî çi ne, û li gor we çareserî çi ye?**

Îro li gelek beşên Kurdistanê tekane astenga li ber perwerdehiya bi zimanê kurdî hişmendiya yekperest û zimankuj a dewletên dagirker e. Li cihên ku derfetên perwerdehiya bi zimanê kurdî lê hene, pêdivî bi saziyên zanistî û plansaziyeke zimanî heye. Helbet hê li tu cihên Kurdistanê kurdan derfeta azadiyê bi temamî bi dest nexistiye. Êrîşên li ser Başûr û Rojava vê yekê nîşan didin. Li gel vê yekê jî rêveberiyên kurd dikarin bernameyeke domdar û hevpar ji bo parastin û pêşvebirina zimanê kurdî amade bikin û ji bo danîna bingeha pergaleke perwerdehiya bi zimanê kurdî gavên girîng biavêjin.

**-Birêz Samî Tan, ji bo vê hevpeyvînê gelek spas.**

Ez jî spasiyên xwe pêşkêşî we dikim û di kar û xebatên we de serkeftinê dixwazim.

perwerdehiyê li gorî rêzikên zanistî yên navneteweyî kêm zêde hatine destnîşankirin, pêwîst e materyalên me jî (çi nivîskî, çi jî bihîzyarî û dîtbarî) li gorî van pîvanan werin amadekirin. Her wiha mamoste jî dîsa li gorî van pîvanan werin gihandin.

**-Dahatûya zimanê kurdî di nava zimanên serdest de, tu çawa dibînî?**

Dahatûya zimanê kurdî girêdayî dahatûya kurdan bi xwe ye, gelê kurd bi salan e, li dijî dagirkeriyê li ber xwe dide, li Rojhilata Navîn hêza herî çalak a têkoşîna azadî û demokrasiyê ye. Lê belê hêzên dagirker jî pir zêde çavsor û dirinde ne. Nemaze dewleta tirk ji bo ku rê li ber azadiya kurdan bigire her tiştî dike. Li hemberî vê yekê tekane rêya çareseriyê hevgirtina kurdan e. Heke kurd naxwazin di bin lingên dagirkeran de biperçiqin, zimanê wan, çanda wan ji hole rabe, divê çand û zimanê xwe biparêzin. Zimanê kurdî ne zimanekî qels e, têra xwe xurt e, xwediyê wê hêz û şîyanê ye ku bibe zimanê serdema xwe û bi hezaran salan bijî, bes divê li vî zimanê xwedî derkevin.

**-Bingeha sazkirina rêziman û rênivîsa kurdî û kurmancî çi ye?**

Rêzik û pîvanên rêzimanekê ji nav wî zimanî bi xwe derdikevin. Ew rêzik bi awayekî surîştî di nava zimên bi xwe de hene. Jêderk û çavkaniya rêzimanê nivîskî zimanê devkî ye, ji ber ku pêşî deng piştre tîp, pêşî gotin, piştre nivîs tê. Heçî rastnivîsîn, rêzikên wê ji çend jêderkan tên; yek rêziman e, ya duyemîn gerdîş û tore ye, ya sêyemîn alfabe ye. Ji bo zimanê me kurdî û zaravayê me kurmancî jî ev rewş derbasdar e.

Zimanzan bala xwe dide rewşên rêzikî; bo nimûne di kurmancî de tewang heye, nexwe em rêzikê destnîşan bikin û li gorî wê rêzikê teşe

kurdî ji vê rewşa kambax rizgar nabe.

**-Weke tê zanîn, di cîhanê gelek ziman hene li ber tunebûnê ne û gelek jî mirine, gelo sedeam vê yekê çiye, û da ku zimanek zindî bimîne çi pêwîst e?**

Mixabin heta sedsala em tê de hêzên desthelatdar bi hişmendiya yek netewe, yek ziman hewl dan ku zimanên gelên bindest ji holê rakin. Piraniya dewletên li ser rûyê cîhanê bi rê û rêbazên cuda xwest li ser xaka di bin desthilatiya xwe de yekgirtî û yekzimanîyê pêk bînin. Her wiha mercên aborî, civakî û siyasî rê li ber hin zimanan vekir, li ber hinekan jî rê bi temamî hate girtin. Ji ber vê yekê bi hezaran ziman ji holê rabûn.

Kuştina zimanekî pir hêsan e, lê vejiyandina wî pir dijwar e, lewma jî niha hinek dewlet dixwazin zimanên qels û lawaz zindî bikin, lê belê nikarin. Ji ber vê yekê divê em destûrê nedin ku zimanê me jî bikeve rewşa zimanê mirî û nîvmirî. Bi plansaziyeke domdar û bi vîn û daxwazeke xurt dikarin zimanê xwe biparêzin û bi pêş ve bibin.

**-Helbete nabe ku mirov zimanekî di ser zimanekî din re bigre, lê her zimanek jî xwedî taybetiyên cuda ye, çi taybetiyên zimanê kurdî hene?**

Her wekî cenabê we jî amaje pê kiriye, her ziman xwedanê hinek taybetiyan e. Bi awireke giştî dema em bala xwe bidin zimanê kurdî, wekî endamekî koma Hind-Ewropî û jêrekoma zimanên îranî, zimanekî qedîm e. Ji alîyê fonetîk û morfolojîk ve gelek formên kevnare yên zimanên îranî parastine. Hebûna forma ergatîfî û parastina zayenda peyvan nîşaneya vê yekê ye.

Li gel hemû polîtîkayên qirkirina spî jî kurdî xwedanê gencîneyeke dewlemend a peyvan e. Zimanê kurdî hemû xweşik û bedewiya surişta Kurdistanê û rengîniya civaka kurd di nava xwe de dihewîne. Bi taybetî qalib û şayesên di foklora kurdî de di kêm zimanan de peyda dibin. Her wekî Xaney Qubadî gotî: Rast e, "dibêjin farisî şekir e/ lê kurdî şêrîntir e/ li vê cîhana bedbext her kes bi zimanê xwe bextewar e.

**-Gelo, rêbaz û pirtûkên astan ên fêrkirina zimanê kurdî (yên heyî) ji bo hemû deverên Kurdistanê derbasdar û guncaw in?**

Mixabin îro bi zimanê kurdî pergaleke perwerdehiyê û li gorî wê jî materyalên perwerdehiyê ji pêşdibistanê heta xwendina bilind bi zimanê kurdî hê pêk nehatîye. Materyalên heyî bi gelemperî materyalên fêrkirina zimanê kurdî û pirtûkên rêzimanê ne. Pirtûkên waneyên mîna bîrkarî, civaknasî, fîzîk û.. hwd, hê nehatine amadekirin. Ji bo ku pirtûkên bi vî rengî pêk werin divê kurd li ser xaka xwe derfeta jiyaneke azad bi dest bixin. Ev yek jî bi awayekî tekûz pêk nehatiye. Îro li Başûr hê jî di asta zanîngehê de gelek wane bi erebî ne.

Pîvanên amadekirina pirtûkên

*Samî Tan: Têkoşer û kedkarekî zimanê kurdî ye. Xebatên wî yên bi zimanê kurdî di sala 1993yan de bi Rojnameya Welat dest pê kir û di rojnameyên Welatê Me, Azadiya Welat de berdewam kir. Piştre jî di ajansa nûçeyan DÎHAyê de wekî berpirsê beşa kurdî kar kiriye. Ji sala 2005an heta sala 2016an di xebatên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê de wekî rêveber, serok û hevserok cih girtiye. Di gelek rojname û kovaran de nivîs û gotarên wî hatin weşandin. Di sala 2000î de pirtûka wî "Waneyên Kurmancî" ji nav Weşanên Welat derketiye. Di sala 2005an de pirtûka wî ya bi navê Rêziman û Rastnivîsa Kurmancî derketiye. Ev pirtûk heta niha sê caran hatiye çapkirin. Ji bilî wê, wî û (Ronayî Onen) seta hînkirina kurdî Hînker û piştre jî Hînker Kurmancî (wekî sê ast) amade kirine. Di sala 2019an de teza wî ya lîsansa bilind wekî pirtûk hate çapkirin. Her wiha di sala 2002yan nivîsên wî yên qerfî wekî pirtûk hatin çapkirin.

Ziman wekî navgîna parvekirina hest û ramanan di teşegirtina derûnî û kesayetîya mirovan de xwediyê cihekî taybet e. Her wiha ziman di pêkanîna nasnameya çandî de xwediyê karîgeriyeke diyarker e. Bi taybetî çanda gotinkî bi rêya zimên pêk tê. Zimanê dayikê di navbera axêrên wî zimanî de peywendiyeke taybet pêk tîne, ji alîyê derûnî ve wan mirovan nêzî hev dike. Lewma jî parastin û pêşvebirina zimanê dayikê ji parastina nasnameya neteweyî pir girîng e.

**-Tevî hemû xebatên hatî kirin jî, zimanê kurdî(kurmancî) belavbûnekê dijî, ji bo standardkirina kurdîya kurmancî çi pêwîst e?**

Ji bo yekgirtina zimanê kurdî dive serê pêşîn statûya kurdan hebe, di navbera kurdan de hevgirtinek hebe, akademîyeke zimanê kurdî hebe, ew akademî pîvanên zimanê yekgirtî li gorî rêzik zanistî diyar bike, bi rêya ragihandin û perwerdehiyê fêrî girseya gel û bi taybetî jî nifşên nû bike.

**-Bi pirsa borî ve girêdayî, ji bo parastin û pêşvebirina zimanê kurdî pêdivî bi çi heye?**

Berî her tiştî divê kurd karibin çarenûsa xwe bi destên xwe diyar bikin. Îro li piraniya Kurdistanê gelê kurd bi qirkirinekê re rû bi rû ye. Di van mercan de parastin û pêşvebirina zimanê kurdî pir dijwar e. Li beşên azadkirî plansaziya zimanî hebe, ew di vî warî de pêşengiyê bikin. Mixabin heta ku kurd yekîtî û hevgirtina xwe pêk neyînin û tekûz nekin, zimanê

## Lêkolîner û zimanzan "Samî Tan" ji "Şermola" re:

# " " Heta ku kurd yekîtî û hevgirtina xwe pêk neyînin û tekûz nekin, zimanê kurdî ji vê rewşa kambax rizgar nabe..



Hevpeyvîner: Aram Hesen

**-Rêzdar Samî Tan em bixêrhatina we dikin, dema we xweş be.**

Spas, mala we ava! Dema we jî xweş be!

**-"Ziman nasname ye" ev hevok gelekî tê bikaranîn, helbete girîngiya zimanê dayikê diyar dike, Birêz Samî hun çawa vê hevokê şîrove dikin û li gor we girîngiya zimanê dayikê çi ye?**

li ser bûyera tofanê bi rengekî balkêş sekiniye û li gorî berjewendiyên xwe yên olî hin rûdanên di bûyera tofanê de hilbijartine û hin rûdan jî paşguh kirine, anku bi rengekî din li gorî berjewendiyên xwe ji nû ve saz kiriye, mînak; gava xwedawend biryarê ji bo tofanê dis̄tînin piştî tofanê poşmaniya xwe nîşan didin ku dibêjin me dikarîbû bi rengekî din mirovan seza bikin û hişiyariyê bidin wan, lê di Quranê de û di olên yekxwedayî de ev yek tune ye, ji ber ku çênabe, ango tu carî nayê qebûlkirin ku xweda di biryara xwe de poşman bibe, ji ber xweda her û her ras̄t e û li ser ras̄tiyê ye, her weha ji ber ku olên yekxwedayî sûd ji çîroka des̄tanê girtine û dibêjin ku xweda hişiyarî ji bo mirovan şandiye û gava qebûl nekirine biriyara tofanê daye. Ji ber ku hêz û bandora çîroka mîtolojî ya tofanê gelekî li civakan çêbû bi demê re domand ta roja me ya îro.

## Çavkanî:

1- Fîras El-Swah- Gilgamêş
2-Pirtûka pîroz ya Îslamê(Quran)
3- Ebdulah Qreman-Weten El-Şems-ç-1(1 -ج-مان قره عبدالله-وطن الشمس)
4- Fîras El-Sewah-Mûxamerat El-Eqil El-Ewel (مغامرة العقل الاولى- فراس السواح)
5-تاريخ و تطور الاسلام –chronicle-Enternet
6- Fîras El-Sewah-Gilgamêş-wergera kurdî-Şêrwan Yûsiv

Sewah-R-151)

Di Quranê de bi vî awayî hatiye: Xweda bi Nûh re diaxive û dibêje: Ji xwe re gemiyekê çê bike, li ber çavên me û bi biryara me, gava ku tenûr fûrî, ji her nêr û mêyekê yekî bi xwe re rake.(Quran-Sûreta-Hûd-R-225-226)

4- Çawa tofan çêbû: Di destanê de Otnapiştim dibêje: Kaniyên ava jêrîn vebûn, erd jî xwe ji avê derxiste ser rû û dûmana hêrsa hudhud gihişte tixûbê esman, bablîsok rabû û ronahî kir tarî, bira ji birayê xwe kor bû. (Gilgamêş-Fîras-El-Sewah-R-99)

Di Quranê de wiha hatiye. Ew wan di hindirê xwe de radike û bi rê dikeve, di nav pêlên mîna çiyayan de bilind dibe.(Quran-Sûreta-Hûd-R-226)

## b-Rûdanên ji hev cuda:

Ka em bi hev re bên li bûyer ango tiştên ne weke hev binerin ku ev yek jî balkêş e. Gelo çima olên yekxwedayî hin bûyerên di çîroka tofanê de ya civakên destpêkê di destanê de bikin, çima hin tişt di Quranê de ne mîna yên destanê ne ku di olên yekxwedayî de divê ev tişt çareseriya wan hebin, mîna van tiştên ku em bînin ziman.

1- Di destanê de xwedayê Otnapiştim Aya tenê ji wî re biryara çêbûna tofanê radighîne ku wiha tê. Aya agahiya tofana gewre ragihand koleyê xwe Otnapiştim ku wekî xewnekê hat xewna wî û jê re got ku biryara tofanê hatiye dayîn.(Gilgamêş-Fîras El-Sewah-R-98)

Lê di Quranê de wisa hatiye; Me Nûh şand ji bo qewmê wî, ji wan re got: Ey qewmê min, îbadeta xwedê bikin, ji wî pê ve kesî we tune ye, ez li ser we ditirsim ku hûn di boblatê re derbas bibin.(Quran-Sûreta-El-E'raf-R-158)

2- Di destanê de Otnapiştim nemir e, ango mayindebûnê bi dest dixe, ji ber ku xwedawendan ew bi zindîbûna ebedî xelat kirin. Ey Otnapiştim, ji nuha û pê ve tu û hevjîna xwe hûn ê mîna me nemir bin.(Gilgamêş-Fîras-El-Sewah-R-103)

Lê di Quranê de li ba xweda nemirî li dijî yasaya jiyanê ye û nemiriya Nûh ne gotiye, lê wisa di sûreta Enkebût de hatiye. Me Nûh şand bo qewmê wî, hezar kêm pêncî salî ma.(Quran-Sûret-El-Enkebût-R-397)

Di vê hevokê de diyar dibe ku temenê mirovên wê serdemê dirêj bû, ta dighêje hezar salî, lê nemirin bi dest nexistine.

3- Di destanê de civaka xwedawendan hebû ku bi biryara giştî tofan çêbû. Lê wekî ku di Quranê de hatiye xweda yek e.

## Encam:

Di encama vê lêkolînê de em têdighêjin ku olên yekxwedayî di gelek tiştan de xwe sipartine mîtolojiya civakên destpêkê, ji bo yasa û zagonên xwe yên olî bikar bînin. Yek ji van olên yekxwedayî jî ola Îslamê ye ku mînaka herî berbiçav e,

■ **Bermahiyên Keştiya Nûh li ser Çiyayê Cûdî.**

hatiye avakirin. Roj di ser re derbas bûn û pîr bû, Xwediyên wê bi xweşiya dinyayê ketin û Xwedawendên xwe ji bîr kirin. Êdî Xwedawendên gewre civiyan û biryar dan ku Tofanekê rakin, tofaneke ku tiştekî li pey xwe nehêle.(Gilgamêş-Fîras El-Sewah-wergera Şêrwam Yûsiv-R-97-98)

Beramberî vê di Quranê de weha hatiye: Çaxa Xweda bi Nûh re diaxive û dibêje: " Gava fermana me hat û tenûr fûriya, ji her tiştî, nêr û mê bi xwe re rake û ji ber ku wê her kes tune bibe, ji bilî kesên teqî(bawermend)" ( Quran-Sûret El-Muminîn-R-343).

2- Sedemên ku hiştin tofan çêbibe: Di destanê de xwedawend ji mirovan aciz dibin ku nema hay ji ol û xwedayên xwe hene û bi xweşiya dinyayê ketine.

Di destanê de wiha hatiye ku Otnapiştim dibêje: Xwediyên wê gendijîn û xwedawendên xwe jibîr kirine.(Gilgamêş-Fîras El-Sweah-R-97-98)

Di Quranê de wiha hatiye: Me we li dijî qewmên ku ayetên me derew derdixistin û bawerî pê netanîn bi ser xist, ji ber ku ew qewmên nebaş bûn, me ew qewm li ber tofanê birin. (Quran- Sûret-El-Enbiyai-R-328)

3- Çêkirina gemiyê: Xwedayê Otnapiştim Aya weha jê re dibêje: Mala xwe birûxîne û keştiyekê ava bike, kelûpelên xwe bihêle û giyanê xwe xelas bike, di keştiyê de rahêje dendika her afrêndeyeke zindî. (Muxameret El-Eql el ewel-Fîras-El-

## Gelo Kê Ji Kê Çîroka Tofanê Biriye?

Em li gorî olên yekxwedayî bimeşin, piştî hatina Adem û zêdebûna mirovên ku xirabî li ser rûyê erdê çêkirin, êdî xweda biryara tofanê dide. Olên yekxwedayî di pirtûkên xwe yên pîroz de Tewrat, Încîl û Quranê wisa dibêjin: Bavê mirovahiyê yê yekem Adem e û yê duyem Nûh e. Em li vir dixwazin balê bikşînin li ser ola Îslamê, eger em hevrûkirinekê di navbera tofana Nûh a di Quranê de û tofana di Destana Gilgamêş de bikin( Ew danberhev wê di nava lêkolînê de were şîrovekirin).Tê zanîn ku di mîtolojiya kevin a civakên destpêkê de, ku hîn olên yekxwedayî nebûn, bûyera tofanê tînin ser ziman û dikin malê xwe. Mînaka vê ya ber bi çav e a ku di nava civaka şaristaniya ku ji Someran ve dest pê kiriye em dibînin ku navê bûyera tofanê di destana Gilgamêş de hatiye ser ziman. Em li dîroka jidayikbûna şaristaniya Somer a di (3000-B.Z ) de dest pê kiriye û ew dem bi navê " Berbanga dîrokê " hatiye binavkirin. Tişta herî balkêş ew e ku çîroka tofanê di beşa dawî ya destana Gilgamêş de hatiye nivîsandin. Dîroka vê destanê vedigere (2300-B.Z) ku roleke girîng a çîroka tofanê di vê destanê de heye. Ka em li dîroka hatina Îslamê binêrin, erê em dizanin ku hemû olên yekxwedayî ku ji wan re dibêjin olên Îbrahîmî, ji hemû pêxemberan re xweda wehî şandiye. Li gorî ku tê dîtin hemû olan çîroka tofanê ji hev birine, olekê çîrok radestî ola din kiriye û hemû ji heman çavkaniyê ne. Lê olên Îbrahîmî bixwe jî piştî şaristaniyên destpêkê hatine, ev jî li gorî dîroka zanistî ye. Îslam, dawiya hemî olan hatiye, di sala (610)an de wehî ji hezretî Mûhemed re hatiye. Ji dîrokê em tê dighêjin ku civakên destpêkê çîroka vê tofanê anîne ser ziman û nivîsîne. Ev yek bi rengekî vekirî di destana Gilgamêş de hatiye nivîsandin û berbiçav e ku di destanê de navê lehengê tofanê Otnapiştim e. Her weha di vê serdemê de civaka Xwedawendan li dar bû û hîn olên yekxwedayî ne hatibûn wicûdê.

## Hevrûkirin:

Danberheva çîroka efsanewî Otnapiştim di destana Gilgamêş de bi çîroka Nebî Nûh ya di Quranê de. Em ê di vê danberhevkirinê de du cureyên dijberî hev bibînin.

-Rûdanên ku hem di destanê û hem di Quranê de wekî hev in ango nêzî hev in:

- Hin rûdanên di destanê de hatine ser ziman, lê di Quranê de ne hatine ser ziman.

## a-Rûdanên Hevbeş:

1- Di destanê de, biryara tofanê hatiye dayîn. Çaxa ku Otnapiştim ji Gilgamêş re dibêje: Bajarekî ku tu nas dikî, ji mêj ve li ber qeraxên Firatê

■ **Tofana Nûh, ji hêla "Fransîs Danbî" ve, 1840.**

vê zemînê zewal bibe. lê kesekî teqî, dilpak û îbadeta Xwedayê xwe dike. Her weha pêxemberek ji pêxemberên ku di olên yekxwedayî de weke bavê mirovahiyê yê duyem ku piştî Adem re tê nasîn. Navê wî Hezretî Nûh e. Ew pir teqî ye. xweda pir jê hez dike û wî hildibjêre ku zindiyan bi rêya wî ji tofanê xelas bike. Xewda jê xweşt ku gemiyekê çêbike, ji her tovekî şînatî bi xwe re bibe, ji her lawirekî yek nêr û yek mê jî bibe û kesine teqî jî bi xwe re rake ango bixe gemiyê de.

Sedemên ku hişt Xweda vê biryarê bide, ew e ku êdî mirovan nema baweriya xwe didana Xweda. Ango Xwedayê xwe ji bîr kirine, bi xweşiya dinyayê ketine û êdî xirabiyan li ser rûyê erdê dikin. Tofan çêdibe, lê xweda vê biryarê ji Nûh re dibêje: Here qewmê xwe hişîyar bike da ku vegerin li ser rêya Xwedayê xwe û poşmaniya xwe nîşan bidin. Lê qewmê Nûh vê yekê qebûl nake û tevzên xwe bi gotinên Nûh dikin, ji ber vê yekê tofan çêdibe. Piştî demekê ) dibe ku heft roj bin( ew tofan disekine û gemiya Nûh li çiyayekî ango li ser çiyayê Cûdî disekine û ji nû ve jiyana hemî zindî û tovên çandinyê deşt pê dike. Li gorî olên yekxwedayî û bi taybetî ola Îslamê. Nûh 950 salî dijî.

**Têbînî:**

Dibe ku gava mirov herdu çîrokan bixwîne, mirov bibîne ku bûyerên tofanê bi heman şêweyî hatine ravekirin. Lê dema ku em li naveroka wê binerin em ê cudahiyên balkêş bibînin.

wî tê guhertin. Di nav Someriyan de bi navê Ziyosodra, di nav Babiliyan de bi navê Otnapiştim, di mîtolojya Yûnaniyan de bi navê Diyokaliyo û di olên yekxwedayî de bi navê Nûh tê naskirin.

## Kurteya Çîroka Tofanê:

Em ê bûyera çîroka tofanê hem weke di destana Gilgamêş de û hem jî weke ku di Quranê de hatiye vebêjin, ji bo ku em hem nasbikin hem jî rastiya ku Îslamê çawa dest avêtiye efsaneyeke mîna bûyera tofanê ji ber bandor û hêza awayê hûnandina wê.

## Çîroka Tofanê Di Destana Gilgamêş De:

Bi vî awayî hatiye nivîsandin; mirov li ser rûyê erdê piştî ku civaka xwedawendan her xweşî daxistin bo mirovan, wan mirovan êdî bi demê re nema nimêj, dilovanî, başî û îbadet bi hemî rengên wê nekirin û her tiştê baş paşguh kirin û li ser rûyê erdê her rengê xirabiyê dikirin, ji ber vê yekê Xwedawend pir aciz (hêrs) bûn û li hev civiyan û biryar dan ku her kesî tofanekê tune bikin, ev jî sizaya xwedawendan ji bo nêzîkatiyên xerab ên mirovan bû, ku berî tofan çêbibe, Aya Xwedayê Otnapiştim e, dilê wî bi mirovan dişewite diçe ber dîwarê xaniyê Otnapiştim radiweste û bi dîwar re diaxive ku dizane Otnapiştim li wir e û ji bo ku dengê wî bibihîze dibêje: Wa dîwaro rabe her tiştê xwe bihêle û giyanê xwe xelas bike, gemiyekê ji xwe re çêke û ji her zindiyekî yek nêr û yek mê û tovên çandiniyê bi xwe re rake, dê tofanek çêbibe ku her tiştî bi xwe re bibe. Gava ji te hat pirsîn tu çima wisa dikî, bibêje ez ê herim warê xwe yê berê cihê ku xwedayê min Aya li wir e, ev war nema ji min re dibe.

Ji ber ku Otnapiştim mirovekî teqî (bawermend) û pir baş e, Aya baweriyê didiyê da ku tovê jiyanê biparêze. Jê re çend nîşaneyên çêbûna tofanê dide diyarkirin, ew jî ev in: Wê ezman reş û tarî bibe, wê +*bablîsok çêbibe û dê av ji ezmanan bibare û av weke volkanan ji binê erdê bikele û derkeve, wê her tiştî li ber xwe bibe. Piştî ku Otnapiştim gemî çêkir li benda çêbûna nîşananên tofanê ma. piştî tofan çêdibe û diqede, Otnapiştim ji bo dîtina bejahiyê firindeyan bi her alî ve difrîne. Ji wan firindeyan kevok vedigere, di nava nikilên wê de çiqilek ji dara zeytûnê heye. Ew jî nîşaneya berdewamiya jiyanê ye û bi vî awayî dîsa jiyan berdewam dike. Li ser vê destkeftiyê xelata jiyana bêdawî ji hêla xwedawendan ve ji bo Otnapiştim tê pêşkêşkirin. Lê belê mercê wê jiyanê jî ew e ku jiyana wî dûrî jiyana mirovan be. Êdî ew li paş deryaya mirinê bi hevjîna xwe re dijî.

## Çîroka Tofanê Di Quranê De:

Çîrok bi kurtasî li ser çêbûna tofanekê ye. Bi çêbûna Tofanê re Xweda biryarê dide ku her tişt li ser rûyê

■ **Keştiya Nûh, ji hêla "Sîmon Di Mayl" ve, 1570.**

afrandina vî cureyî jî ji ber ku mirov bi gelek pirsnîşanan re rû bi rû dima û li bersivekê digeriya, mîna " Çawa gerdûn çêbûye, mirov, lawir, şînatî, derya û bejahî çawa hatine afrandin?.

Pirsên weha jî dikirin: Birûsk, baran, aşût, roj û şev çi ne, ev hêza di wan de çi ye, ji ku hatiya?. Tevî ku hişmendiya destpêka pêşketina mirov bû, lê ev bi serê xwe kilîta deriyê derhozeyekê bû ku cîhana mirovahiyê rake ser piyan û deriyê zanistê jê re veke. Di nav gelên mezopotamiyayê de xwe da pêş û di Şaristaniya Someran de bi pêşketina nivîsê re ev efsane hatin nivîsîn. Serdema Xwedawendan dest pê kir û bersiva her pirsên di serê wan de di rêya olê re dan û efsaneyên balkêş afirandin.

## Di Nav Civakên Cuda De Navê Qehrmanê Tofanê Çi Ye?

Bi derketina mirovahiyê û jiyanê li sre rûyê vê zemînê û pêşketina hişmendiya mirovan re, û bi domandina dem û zeman re, gelek çîrok hatin afirandin. Bi taybetî çîrokên mîtolojî-efsanewî ku li ser hebûna zindiyan û çawaniya çêbûna jiyanê li ser rûyê vê zemînê. Gelek ji van efsaneyan li ser mirovan e û çawa gerdûn çêbûye. Yek ji van çîrokên efsanewî ku li ser domandina jiyanê ye, Tofana Hezretî Nûh e ku di çandên gelên cuda de navê

zemînê di gelek pêvajoyan re derbas bûye û bi xwe re gelek boblet anîne.

Mirovan jî hem devkî hem jî nivîskî li ser zimanan gerandine û derbasî nivîsê kirine. Lê ramanên mîtolojî di hişê mirovan de li pêş bû, dibe ku ji bo bersiva wan pirsnîşanên di serê xwe de bibînin, asoya xeyalên xwe vekirin û xeyalên xwe bikar anîn. Ji ber vê yekê jî mîtolojî li pêş bû. Di van mîtolojiyan de pirsên weha dihatin kirin û bi rengekî balkêş dihatin bersivdan.

-Çima jiyan û mirin heye?

-Gelo piştî mirinê mirov careke din vedigere jiyanê?

-Gelo bihuşt û dojeh hene?

-Gelo boblet, tofan, bager û aşût ji bo çi hene?

-Gelo raza xweda ji van bobletan çi ye?

Gelek pirsnîşanên weha ku mirov mijûl dikirin hebûn û ta radeyekê aniha jî hene. Ji bo bersivdayîna wan, xeyalên bê sînor gerek bûn. Lê tişta herî balkêş ew bû ku " Gelo çima olan dest avêtin mîtolojiyê û çima mîtolojiya civakên destpêkê ji xwe re kirin bingeh. ji vê zêdetir jî ku kirin mal û mîrasê olên xwe? Di naveroka vê lêkolîna de em ê diyar bikin ku çiqasî olên yekxwedayî hewil dane van mîtolojiyên civakên destpêkê bikin malê xwe. Lê nikarîbûn, ji ber ku rûpelên dîrokê toz li ser xwe dan alî û rastiya van tiştan derxistin holê. Mîna mijara ku em ê li ser rawestin ew jî Tofana Nûh e ku olên yekxwedayî ji xwe re kirine mal û milk. Lê em li destpêka dîroka şaristaniyan binêrin em ê rastiyeke din bibînin ku ev mîtolojî di rastiya xwe de malê gel in.

## Girîngiya Mijarê:

Da ku em hêza çêkirina efsaneyên civakên şaristaniyên destpêkê û bandora wan li ser olên yekxwedayî, ku van olan pala xwe daye wan efsaneyan, bi taybetî Efsaneya Tofana hezretî Nûh, ku ta radeyeke mezin pala xwe dane vê efsaneyê, ji bo çawaniya peydakirina jiyanê, ango çawaniya nûvejandin û parastina her zindiyekî li ser rûyê zemînê. Bi taybetî danberhevkirina tofana Hezretî Nûh di Quranê de bi tofana Otnapiştim di destana Gilgamêş de.

## Pênaseya Mîtolojiyê:

Mîtolojiya; zanista efsaneyan e. Ango zanista nîgaşan e. Ew jî tê wateya " gotina ku tê bihîstin û tê gotin " Bi awayekî din ew cure çîrokên li ser Xweda, nîvxweda, kes û cihên pîroz û qehremanên awarte ye.

## Serdema Afrandina Efsaneyan:

Di destpêka bikaranîna hişê mirovan de û di pêvajoya pêşxistina ziman de, mirovan çîrok afirandin, bi domana demê re şaristanî çêbûn, di pêşxistina van şaristaniyan de cureyên çîrokan çêbûn, yek ji van cureyan jî efsane bû, ku sedema

# Rastiya Tofanê

**Olên yekxwedayî di gelek tiştan de xwe sipartine mîtolojiya civakên destpêkê, ji bo yasa û zagonên xwe yên olî bikar bînin.**

Lem a Mihemed Elî*



Ji bo ku mirov ji rûpelên dîrokê baş têbighêje, divê mirov xwedî hewldanên cidî be û bi mereqeke balkêş têbikoşe. Ev têkoşîn jî bi hezkirina xwendin û lêkolînan bi ser dikeve. Ji ber ku gelek bûyerên ku di pêvajoya jiyana mirovahiyê de çêbûne, ji destpêka hebûna mirov li ser rûyê vê

*di sala 1974'an de li Herêma Dêrika Hemko ji dayîk bûye, li Qamişlo dijî, derçûya Zanîngeha Rojava ye- beşa ziman û wêjeya kurdî qedandîye, li Akademiya Şehîd Egîd mamosteya wêjeya kurdî ye.

Teberî gotiye: Erdîşêr kurê Babikê Silmanê kurê Babikê Zirarî ye.

Yaqûtê Hemwî gotiye: tiştê ku sazan di bîra me tîne ew bajarê wan(medaine) ku navê wî bajarî berê (Kurd awa) bû.

Teberî di beşê yekem rûpelê/478/ de deqa nameya ku Erdewanê persî ji Erdîşêr re şandiye..piştî cenga diwem di navbera wan de, gotiye: ( te nigê xwe zêde radaye û kujtina te hatiye.. hey kurdê di konên kurda de xwedî bûye, kê rê daye te ku te ew tac li xwe kiriye û tu bûye şahê wan welatên ku şah û xwediyên wan wenda ne..û kê biryara avakirina ewî bajarê ku te li biyabanê ava kiriye.. daye te?

Di warê nivîsîn û xwendina bi zarê kurdî de ji berya zayinê û ta nuha:

Azerbod piştî bisilmaniyê dibêje: Ez Azerbod im, kurê Hemed serkanê Behdînan im, bi pelan (yên kurd) hate nivîsand in.

Hîrodot gotiye: Rista şahên mîdî, bersiva xwe li ber dadkirinê di rûpelan de dixwendin.

Kontzyasê girîk gotiye: Bijîşkê sera Erdîşêr pirtûkek dîrokî li ser rojnamên serayê nivîsî bû.

Tewrata ku di dema Hexamenîşan de hatibû nivîsîn, li ser yasa û hînkirina nivîsîn û xwendinê di şahnişîna mêdiyan de axiviye.

Avêsta û wêyên kurd herdû jî bi helbestî hatine nivîsandin û di sera sazan de bi dengê xweş û bilind dihatin xwendin, Babord helbest digot û Semtûr jî distiran.

Pirtûkên kurdî berya bisilmaniyê pir bûn, lê dema ku bisilman derbasî kurdistan bûn. Pirên name û rojname û nivîsan avêtin çeman, bi behana ku mecûsî ne û zerdeştî ne, hin ji wan hatin derxistin û ew du beş bûn:

**1-**Ên olî, olê mêdî, avêsta, zend, wêyên kurd û hinên dîtir ên zerdeştî.

**2-**Mijarên konevanî, zihrî û nerêtî,tenduristî,hînkirin, wêjeyî,dîrokî û efsane û çîrok, karûbarên rêvebirya dewletê, hin jî li ser yasayên şeşrengê û hunerên siwariyê û tîr û kevanan, pîşesazî, çandinî û zevî û daristan, xaknasî, stêrnasî, pîtolî û... hwd.

Ev jî navên hin pirtûkên berya zayinê: Avêsta, wêyên kurd, bûnduhesin, dadistan dênêyîk, artarî, wêravname, karnameyên Erdîşêr Babekan, zirêran, dadistan rêdik, xosire û gotan, wişterengname, xutayname, xuwayname, ristemname û... hwd.

Pirên wan ji pehle wergeriyan persî û erebî, xutayname buwe "Siyer elmilûk" û xuwayname bi persî bû "Şahname", pirtûka Gelêla û demenhiş ji hindistanê derbasî kurdistanê bû di dema dadwer û serdestê kurd Erdîşêr de û wergeriya pehle û persî.

Hemû pirtûk û nameyên ku di dema bisilmaniyê de bi persî derketin, tev de di dema sazan de bi kurdî hatibûn nivîsîn, ji wan pirtûkan jî:

Wamiq û azra, yesnê û ramîtê, eskewname, yorasîp, bilhor, şîrîn û ferhad, baramname kirjasibname, behmenname, ristemname, şehreyarname, cihangêrname, feramerzname, birzûname, bextiyarname,hezarefsane, witistanî sindîbad û bi hezaran pirtûkên dîtir.

nêz ew e ku kurmacî nêztirîn zar e ji zarên arî yên kevnar re û nemaze zarê Zend-Avista, ew bûbû zarê olê Êranî û ji rojava (buxara) ta Azerbêcan.. dêmek li hemû welatên Êranênî bakur ji bilindahiya Êran û herêma rista çiyayên zagros û împeratorî ji çavkaniyên diclê û ferat ta bi kendava erebî..bû zarê axaftin û hevpeyvînê.

Lê Pehle li Îraqa parsî û mîdiya mezin û kolên pers pêk dihat, weke zarê giştiyên xelkê, zarê kurdî kevnar dihate nasîn bi zarê pehlewanan, ango lehengan, çiku bêjeyên (goto, kirdo) bi wateya cengawer û leheng tên, pirên lêkolîneran dibêjin kurdî ne ji persî hatiye çiku ew jê kevintir e,lewra Sidnî Smêt û Jostî û Sosnî gotine: Zarê kurdî serbixwe ye, bi hevbendî û amajeyên xwe ve û pêşketinên wî yên dîrokî hene, bi rastî ew zarekî qenc e û di mûzîka xwe de cuda ye, Jostî jî tekez dike ku zarê kurdî zarekî resen e û rêzimana vî zarî ji a parsî û turkî û erebî ji kokê de cuda ye.

Dîroknas pispor.. Mijor Admonse gotiye: Zarê kurdî serbixwe ye..û herdû zanyarên Elman (Rodcer,pot) jî gotine: Zarê kurdî serbixwe ye û mancî kirine ku ne ji parsî ye, lê belê lêkolîner û zimanzanê kurd Tewfîq Wehbî gotiye: Kurd û Mad yek netew in.

Pirtûka Avêsta gotinê dibire ku kurd û miletên Êran bi zarekî hevbeş bûn, tevî ku zarê avista û zeradeşt (ê ku li textê silêman..li bakurê mîdya.. ji dayik bûye) nêzî şêwezarê Mukrî bû, hin jî dibêjin zeradeşt kurd bû , Mukrî bû ..ji êla Maz bû ji xelkên Ormî- rizayê bû.. , ji nav miletê xwe çû û bû mizgînguhêzê miletê dîtir, lewra Avista bû pêmayeke pîroz ji xelkên Êranê re bi tevayî û weke ferhengeke giştî cî girt, zerdeşt xwe li Efganistanê kire pêxember jî û li Mezar şerîfê li Efganistanê mir.

Medî yan Mêdî: Ibin xeldûn gotiye Mêdî kurd in.

Hesen bîrniyaj di dîroka (Êran bastinda ) de rûpelê 168 gotiye: Mêdî Arîne.. û ew bavpîrên kurdan in.

Merdox di verêjeke dîrokî de gotiye: Aramas sultanê mêdiyanî yekem bû û li ba girîkan bi Keyqobad nas dibû.

Domerkan gotiye: Mîdî berya Îsa bi 2000 sal hebûn.

Hîrodot gotiye: Damezrînerê qiralgeha Medan Diyako ye.

Dîroknasê girîk(Gîtizyas) gotiye: Deh sultanên dewleta mezdî bûn û yê dawî Astîgaz bû 350 salî serdestî kiriye.

Sazan berya zayinê bi 400 salî qeralgeh ava kirine û damezrîner Erdîşêr bû,bavê wî babikê kurd ji qata şivanan bû û dayika wî Bayik ji êla (bazrengî) a kurd bû,88 sal kir û 25 salan qeral maye û qeralê dawî ji sazan (yezdîkurd) bû.

29 qeralên sazan qeralî ji dest hev girtin û paytexta wan (Mada yan ) bû di pê re navê wê kirin medain.

Kolonêl Dohose di sala 1869 de gotiye: serê mezin û zeblekên xurt û porê reş û ebriwên qalind ên kurdan mîna ên sazanên kevnar in.

û ew ji hebûnê tune kirin.

Hîrodotê dîroknas gotiye: (485-425 B.Z) çar milet li rojhilatî Yonanistanê dijiyan(Ermen, Sazbîr, Ardo, Mîtanî..) navê Kurd ta wê demê jî nenas bû ji wan re.

Ji bêjeyên ku hevbeş in di Kurdî û Horî (zarê mîtanan) de: firr(vartana), yek (ayka), sê (têrra), pênc (penca), haft (satta), ta (arta), rastî (satya).

Nêzî du hezar sal B.Z koçberên Hindistan û Ewropa hatine li herêmên Kurdan û çiyayên zagros bi cî bûne, bandora zarên wan li hev bûne, lewra hin guhertin ketiye zarê Mîtan û ew dem destpêka çêbûna zarê kurdî bû li gor dîroknasên ku dibêjin: Zarê kurdî pêmayê rewayî ji mîtanî ye û amaje kirine ku kevalên şahên Aşûr bi kurdî hatine nivîsîn.. Kurd ew xwediyên kevnetorê zar û dîrokê li wê herêmê ne.

Kurd arî ne û arî ji çiyê ne, ji berya dîrokê de, tevlî miletan bûne û efsaneyî ava kirine, zarê kurdî jî ji malbata Xorî şaxê Êranî (pehle) ye, û koma ademîzadên Êranî ên arî jî ji wê malbatê ne ,Mihemed Emîn Zekî gotiye: ((kurd ji miletên(Hind-Êran) in.. ew hatin kurdistan di dema ku Mîdî hatin mîdya û Parsî hatin parsya û rêkefta hatina Kurd piştî (650 B.Z) çiku tomargehên aşûr ên berya vê demê tiştek di vî warî de bi bîr nanîne..)), rojhilatnas THAREAN DANGIN gotiye: Ewî di kovara aşûrlogî de dîtiye..du kevalên kevnar bi nexşên ji dîroka du hezar sal berya zayinê de li ser e, ku herêma (kar-dekar) li nik xelkên(soy) bû yên ku li başûrî gola wanê dijiyan, her weha dibêje.. piştî evê rêkeftê bi hezar salî (tîglat pilser 1098-1068 B.Z) şerê miletekî bi navê(kurd) li çiyayê(ezo) kiriye.. û bi wan re şkestiye, Daryo yê rojhilatnas dibêje: Ezo çiyayên Hazo ye, dêmekî (Sasû ne).

Walas layn bi guman e ku zarê kurdî ji pir şêwezaran e (ji koma zarên Êranî yên başûrê rojava ne, lê şêwezar li gor cografiya herêman belav in, bi bakur de bi ber zapê mezin re ta bi gola Ormiya.. pirên kurdan bi kurmancî daxivin.. û bi başûrî wê rêzê de.. bi soraniya ku beşeke ji kurmancî ye daxivin.. û hin ji kurdan bi zazakî û hin jî bi goranî daxivin), koma zarên êranî beşek in ji koma ( hindo êranî) û ev kom du beşin:

**1- Zarên Hindî:**

Birakranî, Miranî, Binçanî, Koçeranî, Racasanî, Buharî, Bingalî..û deqa kevnar ji evan zaran re navê ŞANJÊKIRÎTÎ(sensekrîtî) lê dibe, sirûdên olî ji olê birahma re pê hatine nivîsîn û deqa herî kevn (rêk vêda) bi wateya rêya zanînê ye, ew pirtûka herî kevnar û pîroz e.. sala 1200 B.Z hatiye nivîsîn ew li ba hindiyan weke Avêsta li ba gelên Êranî ye.

**2- Zarên Êranî:**

Parsiya kevn û nuh, Kurdiya kevn û nuh, Efganî, Blocî…, zimanê kurdî kat daye û geş bûye û weke hemû zimanên zindî şêwezarên xwe bi xwe re hilaniye, ji zarên arî ên kevnar jî (ZEND û PEHLE) hene, gumana herî

şêweyî dinasîne ku hevok wek navdêr e.

**Nimone:** Ez Kawa me = ez Kawa bûme

Dêmekî karê bûyinê,di bûrî de..bi koma pêrnavê (ez) re tekezî bi alavên paşgir (im-î-e-in) tê, lê koma pêrnavê (min), di bûrî de kirina kar bi berkar tekez dibe, lewra paşgir ne girîng in.. lê di nuhok û ayinde de, çiku koma (min) dibe berkar û koma (ez) tenê li ciyê karanav tê..loma alavên tekeziyê tên, û koma (ez) di çi darêjê de be ev alav bi wê komê tenê re tên, lewra tenê tekezî ne û ne karên bûyinê ne (karên alîkar in).

**Têbîn:** koma (ez) ji pêrnavan di bûrî de, bi karê saltegêr tenê re kara(kirar) tê ..lê bi karê derhingêv re dibe berkar(bireser), di nuhok û ayinde de jî bi karê negerguhêz û gerguhêz re jî kirek (kara, kirde) tê, belê koma (min) di bûrî de bi karê gerguhêz re kirek û berkar jî tê, û bi negerguhêz re jî weke berkar (bireser) tê , lê di nuhok û ayinde de ev kom kirek nayê, hew tenê berkar tê.

## Zar û Dîrok

Zar diyardeyeke jiyaniye û ji bo pêrabûneke çandî û konevanî alaveke bi kêr e, bi hebûna mirov re çê dibe û geş dibe û pêş dikeve, çiku bandora jînwar û gelên hawîrdor li mirov heye, zar jî weke mirov e, ew rêçana pevgihîjtinê ye..her weke ku kevn û nuhê miletan pev digihêjîne, nêzî 3000 zar di cîhan de hene,li hindê tenê nêzî 800 zarê zindî hene, her weha jî piř zar ji zû de mirine, lê kevnetorekî çandî bi nivîsên li ser kevalên qehfikî ku roj bi roj têne dîtin.. hiştine, hin zarên jibîrbûyî jî hene militên wan qiř bûne û qeliyane.

Ji her zarekî zindî re dîrokeke dûrî dirêj heye, ev zarê kurdî yê îroj jî, ne tenê ji hemû şêwezarên zarên mîdî ye, ew ji şêwezarê (avista) bi xwe ye,em nikarin bêjin.. zarên ewan miletên ku li ser xaka kurdan (mîtan, manî, gotî…) holisîne û bi cî bûne, ew bingehên zarê kurdî ne, her miletekî ji wan şaristaniyek li xaka kurdan ava kiriye.. û têkiliyeke rêzimanî û rênivîsî di nav wan û zarê kurdî de çê bûye û di demekê de bûye zarekî serbixwe, gelê kurd navê (kurmancî) lê kiriye, belê yên ji bilî kurd navê (zarê kurdî) lê kirine.

Ji hêleke dîtir ve jî bandora gelên cînar û hevsî (somer, akad ) ji hêla çandî û konevanî û olî ve jî li zarê Kurdî bûye. ew jî tev di bin bandora zarê Mîtanî de mane, ev zar bûye serdest herêma bakur, ji welatên mezobotamya (navbera herdû robaran), gelê Mîtan di sedsala pêncemîn berya zayinê de, li navbera rojhilatî robarê Hayis û ta bi rûbarê Araks li jora Diclê û ta bi rojavayî Zagros, serdest bû, Mihemed Emîn Zekî gotiye: Mîtaniyan di derdorî sedsala şanizdem de B.Z.. li (Mûsil-Terabulsê) desaleteke xurt ava kiribûn û di dema (Aşûr nasirbal) de qeliyan..hino hino welatên wan standin

Di cîhanê de çiqas millet hene evqas ziman jî hene, tev de ji hev cudane, pirbûna şêwezarên zimanan jî bi kevnariya dîrokî û pirbûna hejmara amarê û pêşketina têkiliya deshilatdariyê ye. bi berdewamkirina serdestiyê ve berpîvaneke pêwîst e.

Zimanê kurdî jî pirşêwezar e, lê ku em her nerînekê li gora şêwezarê deverê binerxînin û em tevayên şêwezaran bi ewê nerînê ve bipîvin.. em gunehkar dibin ,çiku em hemû şêwezarên dîtir neşê û neçar dikin, em ê wan bimestînin û bêcan bikin.. ev ji zanan re nabe pîver û terazû.

**Ravekirinek:**

Di zimanê Ingilîzî de (verb to be) hemberî karê bûyinê di kurdî de ye.

Mînak: - To be = bûyin

Pêrnavên (cînavên) koma (ez): Weke kirek, di bûrî de bi karê negerguhêz (têneper) re bikar tê, ango berkar ji karê wê komê re nîne, lewra alavên erêniyê karê wê komê tekez dikin.

Lê di nuhok û ayindê de, bi karê gerguhêz (derhingêv) re jî bi kar tên û di hemû darêjên demê de jî ciyê nav û kirek (kirde) digirin.

Koma pêrnavê (min): Di raweya bûrî de bi karê têper (derhingêv) tenê re bikar tên, ango berkar ji karê wê re hene, ew berkar erêniya kar didin.

Lê di nuhok û ayinde de, pêrnavêd wê komê bi xwe dibin berkar (bireser), êdî hew (nema) ciyê nav û kara digirin. (yê-ya) jî koka wan(ê-a) ye, lê bûne paşgirên goteyên ku dengdêreke paşgir ji wan re heye, lewra (y) bûye navbira du dengdêran, da ku rêzimanê neşkîne û rewanbêjiyê durist bike.

Hin nerîn ji kevn de hene, dibêjin: (im-î-e-in). ne paşgirên tekeziya pêrnavên koma (ez) dibînin, dibêjin ew karê bûyinê ne, bi evan nerîna em dikarin bipirsin, gelo pîtoliya zimên bi her raweyekê re amade ye ku rêzanên cihêreng di darêjeke yekser de peyda bike.?!!

Ma gelo hewdelî ( linavevxistin). ziman şaş û lawaz nake?

**Nimone:**

- Ez bû bû im

Yekemîn (bû): Karê pêvajoya bûyinê ye, duyemîn (bû),karê dûriya bûyinê ye, ku (im) jî karê bûyinî be.. pirseke balkêş xwe dide der:

Gelo sê kar û nemaze du karên bûyinî (alîkar), tevî ku karê alîkar bin jî. Li pê hev hevokekê ava dikin ( mebest du karên alîkar bi karekî dîtir re) ? Û ev çi hevok e?

Belê dema ku (im) weke qertaf an alaveke paşgir (tekeziya kar an rewşa pêrnav) bête naskirin,tê nasîn ku pêgihêj e û hevok pê seřast dibe.

**Nimone:**

Di bûrî de: - ez ketim = ez bûm ketî

Di nuhok de:- ez dikevim = ez dibim ketî

Di ayinde de:- ez ê bikevim = ez ê bibim ketî

Di biryarê de:- bikeve = bibe ketî

Di raweya nuhok de gote bi darêj dibe û “be” alava bûyinê dinuxwême lewra bûyin ne diyar e û ev rawe bi evî

wan dengan jî curbecur in.

Lê .. çima kirî em ji bîr bikin ku axaftin devokî ye û bilêvkirina dengan jî devokî ye, ma gelo her axaftinek ne ji komelek gotinan peyda bûye, û her gotinek ne ji bizava dengekî bêhtir e?.

Dêmekî axaftin a gotinan e û bilêvkirin a dengan e, ji vê avakirinê pirseke balkêş xwe dide pêş: Erê ma reng û durûv û navên dengan tevan yek in?

Bêyî ku em mijûl bibin û mitala bikin, bersiva vê pirsê bi "na" tê danin. haaaha eger ku cîder û bizavên dengan tevan ne yek bin, ew ê bi durv û reng û navên(navêt) xwe jî ji hev cuda (cihê) bin, ew bilêvkirinên bûrî deng in û her bilêvkirinek bi navekî cihê bi nav û nasîn bûye (deng ji deng cihê ye ).

**Têbînî:** Gotin komela dengan e û axaftin komela gotinan e, dêmekî axaftin komelgeha dengan e.

**2- Nivîsandin:**

Bê bi çi awayî her dengekî navek standiye, her weha jî her navek nîşandekekê yan sambolekê û rengekî yan jî wêneyekî (nîgarekî) bi rewş û rawe ji bo jevnasînê dixwaze.

Di axaftinê de her dengek ji cîderekê (jêder) bi lêv dibe, ew cîder ji deng re dibe rewş û rawe û nav li deng dike, piştî serbûriyên hezarên salan û li gor pêdawîstiyên civaka mirovî bi têkiliya zar û ziman re pir kês û derfet derbas bûn, û bi delîveyên hevgar û rojgaran re pîtoliya axaftinê li beşdariya pêjn û pelandinên dîtir (ji bilî bihîztin û dengînê-bangînê) kola û geriya, daku di qonaxên teng re bi ser qonaxêt şirovekirinê vebû, ew qonaxên curbecur bi pêşketina demê û pêwîstiya nûvarkirina mercên wê re, nûjeniya nîşandek û sambolên dengan bi peydakirina alîkariya çav û poz û çerm bi mejî re. Bersiva vedenga dev û guh hate dayin, ta gihîşte asta ku tîp(pît) şityar û mancî bûn.

Li şûna deng navê tîp bikar hatiye, da ku bête nasîn erê tîp ji tevayên dengan re û yeka yeka re jî tê gotin û tê nîşadan jî, ango tomar dibe, balo navê cîderka bilêvkirinê ji her tîpekê re bûye navê rewş an raweyê (dengenav), û jevnaskirina pêjna her tîpekê di axaftin û bilêvkirinê de bi bihîztina guh nas dibe, lê bi çavan reng û durvê tîpê weke tiştekî heyî ku berya nuha wendayî bû tê dîtin û bi destan jî ew wêne bi mizyarî nîgar dibe û berçav jî dibe, ango hay û hest bi tevayî pê dibilin (dest- çav- guh- dev- û poz jî di hin raweyan de.), deng diçe lê tîp dimîne. Axaftin tête guheztin ta demekê, lê nivîsandin dîrok û mîjo ye, bûrî û nuhok û ayinde ye.

**Têbînî:** Bi berdewamkirina dîrokê re û di warê zanyariya zimanan de, bi pir kesan re derbas bûye ku ji pêhaybûna pêjna her tîpekê li gor guhertina fonîtîka (pêllerza) bilêvkirina dengan ji jiyana germê ta ya sermê, û ji kesên çiyayî ta yên deştî.. deng pirşêwe derhatiye (qube- bilind- nizm- nazik- qalind- sert û hişk- nerm- zivir- şayik û zelal û...hwd.)

cîwarê wan yê xuristî re damezrîne.

Deng peyda bûn, her dengek weke navekî li tiştekî heyî bû, her tişt bi dengan bi nav bûn û hatin naskirin, dêmekî ew dengên serete sembolên danasîna beşên koman bûn, navnîşank bûn, ew pîtolên despêkê hîmdeyên bingehîn bûn û dabîra yên ku dibêjin: "deng di zar de tune ne, lê zar bi giştî û gelamperî tevaya dengan e .." berovajî dikin.

Di dîrokê de dem dûdirêj e û berdewam e, ew sembolên ku bi pîtoliya xuristê re velîstî û perpitî bûn, xwe dan ser hev û hatin parzinandin, ji her komekê ji wan komên bûrî zarek derket(derhat), ji her zarekî jî bi pirbûna mirovan re şêwezar pejirîn, hin ji wan li ber pêlên demê man xwegirtî, ta ew jî bûn zarên serbixwe ....û hwd.!!

Lê de ka hela bê zar çi ye: Zar komeke deng û sembol, nîşandek û alav, gote, bêje û zarav in, bi rêzan û tûzikên rêxistî ji bo dayin û standinê, di navbera mirovan xwe bi xwe û naskirina jiyana cîwar û tîmanên xuristê de ye, ji bo hevnaskirin û jevfêrbûnê ye, têkilî sebaret bi hay û hestan pêdivêyî pêdawîstên pêjn û pelandina pevgihîştinên ponijandî bi kêferata mayin û hebûnê re ye.

Zar avahiya pisporiya endaziya çax û demê bi cih û war re ye. Hêmenên avahiyê jî evin:

**1- Axaftin:**

Dengvedana dev û lêvan û bihîztina guh e, lewra kesên ker lal in jî, çiku heke guh nebihîze wê cîderên deng di mejî de çi anînê (ayinê) bi hiş ve bighîjînin, ango cihderka biryarên hiş vala dimîne û tu bihîztinê wernagire, da ku weke biryar ji dev û lêvan re biguhêze, ew kesê ku piştî axaftinê jî guhgiran dibe dengê wî jî li wê gorê bilind dibe da ku guhê wî bibihîze ka bê çi dibêje..ji wî weye (werê) ku ew kesên guhdar bi tevayî, ew jî mîna wî guhgiran in.

Dêmekî axaftin dan û standina hay û hestên mirovî, bi jiyana derveyî gewde û laşê wî re ye, pêjn e, ji hay dipele û hest hişyar û haydar dike, rêçana wê têkiliyê hemû ew komdengên ku dikare wan bide der.

Balo ew pêjn û bizava dev ji zar re bi deng hatiye naskirin, çiku pêgihîjandinê bi cîwara hawîrdorî xwe re dike, lê her dengek bi wateya xwe ya taybet cîhdereke taybet jê re heye, ev tê wateya ku axaftin ji gotinan (gote û bêjeyan) ava dibe û gotin jî ji dengan ava dibin û deng jî curbecur in (rengareng in), ango cihêdeng in. Lewra wateyên gotinan jî ji hev cihê ne, ne hevwate û ne yekwate ne, dêmekî di her gotinekê de bêhtirî dengekî (çi bêdeng û çi dengidêr) heye, eger her axaftinek komeke peyv û gotin in, tew em dikarin bibêjin erê her wateyek (danasînek) jî ji dengekî bêhtir e, balo ku peyv û gote pirdeng bin, ev yek tê wateya ku ew deng jî ne weke hev in, dengê di her goteyekê bi xwe de curbecur in.. lewra cîderkên

mercekî resen e û hîmde ye.

Zar bi derbasiya pêngavên delîve û qonaxên zarotiyê hatiye vegirtin û ji têkiliya ziman û ramanê bi hiş re sûd û hode wergirtiye.

Tenê mirov dikare zar bikar bîne (şêkarê axaftinê ye) binivîse , paxive, lewra di pir beşên zanyarî de lêkolîn û kwîrkol jê re bi nav bûne .

Pîtolên derûnî jî pir berhemên balkêş di biwarê zar û derûnê de şirove û rave kirine, hevkariya hiş û ziman berdewam e. Çiku dever û navendên peyivandin û axaftinê di mejî de cîgir in, aşkart û aşkere bûne, di vî warî de û li ser ronahiya çirûskên berêzêd berya me. Tevlî kêmasî û şaşiyan, em ê ber bi pêşxistin, duristkirin û geşînkirinê de bimilin, hêviya me ew e ku em berekî nûvar û xweş ji mêweyên bi mize û çêj û bi mizyarî perû û pêşkêş bikin.

Çi zimanên ku hene pîtoliya wan heye, dêmekî qonaxên avahiya pîtoliyê jî hene, çiku tu pîtolî di bêhnik an hûrdemekê tenê de pêk nayê û peyda nabe, lewra pêwîstiya demên dûdirêj û warên têz ji avahiya pîtoliyê re girîng e.

Dûrêzkirina mercên avahiya zar û zimên jî pêdivêyî rêbazên çaksaziyeke bingehî ye, gelo zar bêyî hebûnê hebûn. û hene. û ew ê hebin..?!!

Baş e, hebûn jî bêyî peydabûna afirandî tune ye, dêmekî jêderên peydabûna afirandî hene taku hebûn jî heye, erê - ka em ê werine ser hebûna zar û ziman. Em ê ji hev re binasînin, hela bê kanîn ew raderên fermî û gerek ji egera zar û zimên re çine?.

Xurist (surişt) bi hemû yasa û ayin û rewayên avahiya xwe ve heye. Candar û bêcan jî tê de hene, têkiliya candaran pev re (bi hev re) û bi bêcanan re jî pêdawîstî danasîn û ravekirinê ye, taku jevnaskirin hebe ji bo berdewamkirina jiyanê bi şaşî û rastiyan re..bi keçî û qenciyê re. bi xweşî û tengasiyê re û… hwd, dêmekî danasîna jevnaskirinê li nîşandekên liv û bizava wan yasayên avahiya xurista jiyanî digerin..û bi berdewamiyê re ew liv û bizav bi pêş dikevin, ew nîşandek jî di wê şopê de berz û diyar dibin, çiku bi candaran re navendên hay û hestan peyda bûne û di wan şivarêkan re pêjn û pelandin bûne alîkar daku di rêya bihîztinê re deng nas bûne. Ji nerînê dîtin peyda bûye, bi pelandin û pevgihîjtinê jî bizavên curbecur (rengareng) bel û diyar bûne.

Bi pêşketina berdewamiya demê re, mejiyê hişmendan bi lez û bez û yê hemû candarên dîtir jî bi hêmenî bi pêş dikeve, ta gihîşte astekê ku ew pevgihîştina tiştên heyî jî bizavên nûvar di

pêdawîstiya jiyanê de ava kirin û bi alîkariya wan bizavên peydabûyî, pêwîstiya peydakirina bizavên bi nav û nîşan hate hebûnê, da ku em bi kurtî xwe bigihêjînin mebesta xwe (çiku zanyariya xuristî fireh e) em ê bêjin deng ji hev hatin naskirin, dema ku dengên balindeyan ji yên direndeyan an jî ji yên ejderan hatin cihêkirin, tevlî ku zarên danasînê ji her cureyekî ji lawiran re jî hebû, lê pêdivê bû ku dengê hişmendan jî zarên cihêreng ji komikan re li gor têkiliya wan bi

# Dîroka Zarê Kurdî

Arşek Baravî*

**Ji her zarekî zindî re dîrokeke dûrî dirêj heye, ev zarê kurdî yê îroj jî, ne tenê ji hemû şêwezarên zarên mîdî ye, ew ji şêwezarê (avista) bi xwe ye.**

Lêkolîn

Zar ji karmendiyên mirovînî tundiye, ango di jiyana lawirî de peyda nabe tev ku despêkin di asta meymûnanî bilind de jî neyin û nepen nabin .. belê ew despêkin jandarin, dêmekî ji bingeheke civakî .. rê li ber girtiye.. an hatiye girtin.

Ji gencîneyên lêkolînên bilîmetên cîhanî û kevnar tê nasîn ku zar yek ji mercên mirovahiya mirovan e..

* Di sala 1963an de li Amûdê ji dayik bûye, lêkolînerê zimanê kurdî..Rêveberê Yekîtiya Rewşenbîrên herêma Cizîrê- Nivîsgeha Amûdê ye.

civakek nexweş û tirajîk bibin. Ji ber vê vekirîmayînê, Nirxên giyanî yên civakên ku windahiya wate, ciwankarî û exlaqî dijîn ancax weke madeya xam a mêtingeran bên bikaranîn. Wek encam têgîna ziman heke weke rewşa ku kurd tê de ne bê jiyîn, pir eşkere û diyar e ku wek civak ka di hêla madî de çi qas xizan û parçeparçe ye, û di hêla wate, exlaq(sinc) û ciwankariyê de jî wê nekare xwe ji jiyaneke şaş, çewt, xayîn û kirêt rizgar bike.

Îcar dema ku mirovek zimanê xwe yê dayikê winda dike, mîna masiyê ku ji avê qut bibe, radestî mirinê dibe û ber bi tunebûnê ve diçe. Lewma heke ku kesek bi zimanê dayika xwe zanibe jî, lê pê nepeyive û di jiyana xwe ya rojane de bikar neyîne û zarokên xwe fêr neke, ew bi awyekî jixweber dibe alîkar û dikeve xizmeta siyasetên bişaftinê de. Mixabin, di roja îro de bi hezaran kurdên ku divê rewşa xirab de ne, hene, ku bi destê xwe beşdarî qelskirin û tunekirina zimanê xwe dibin û bicihanîna siyaseta bişavtinê rehettir dikin.

Ji ber wê yekê pêdivî ye ku her kurdek di hemû qadên jiyanê de zimanê dayika xwe bi pêş ve bibe û bi zimanê dayika xwe bipeyve, binivîse û bixwîne û jiyana xwe pê bixemlînîne.

Her wisa pir tiştên ku pêwîst e bi komî jî bêne kirin hene. di vê çerçoveyê de, di serî de, ji aliyê rewşenbîrî û çandî ve divê ku giringiyeke mazin ji bo parastin û pêşxistina ziman bê dayîn.

Ziman, di jiyana mirov û civakê de, heyîn û amûreke bêmirin e. Dibe ku mirov ji hêla fîzîkî ve bimire û tune bibe, yan jî ji ber sedemên curbecur jiyana xwe winda bike. Lê belê civak, bi rêya ziman, çand û ramanên hevbeş, di warê, nîgaş, his, şadî, helbest, stran, êş, xemgînî û hemû berhemên xwe yên giyanî ve bêmirin e û bêdawî ye. Her wiha bi rêya ziman, civak û gelan heta roja me ya îro bi nasname û çanda xwe, xwe parastine û cûdahiya xwe nîşan dane.

Di roja îroîn de, ji hêla sîstema kapîtalîzmê ve ramyariyên xirab li ser ziman û çandên gelan têne meşandin û êrîşên bişaftinê yên bê hempa pêk tên. Lewma divê her gel û milet di vê mijarê de haydar be û di parastina ziman û çanda xwe de xwedî rol be, bi taybetî gelê kurd ku ji destpêka damezrandina komara Tirkiyê ve rastî êrîşn helandinê yên bi şid tê. Ji bo kurdan ev mijareke jiyanî ye û pêdivî pê heye ku hişyar be û li hember van siyasetan raweste û têbikoşe, da ku karibe ziman û çanda xwe mayinde bike û ji pêlên bişaftinê biparêze. Ji ber ku, giranî û wateya çand û ziman, ji bo Kurdan bi qasî hebûn û tunebûnê girîng e. Kurdan jî li gorî zanebûna xwe û li gor derfet û imkanên heyî xwedî li çand û zimanê xwe derketiye û heta radeyeke baş parastiye, tevî ku di nava dewletên ku Kurdistan di nava wan de hatiye dabeşkirin bi qedexekirin û tunehesibandna herî bi êş re rûbirû maye, ta asta ku mirov dikare bibêje di tevahiya dîrokê de dibe ku miletek bi qasî kurdan êş ji vê yekê nedîtibe.

Di der barê girêdana ziman û çandê de û girîngiya wî di civakê de, Birêz Abdullah Ocelan wiha dibêje: Têgîna ziman, bi têgîna çandê re di nava têkilîyeke pir bi şid de ye û di bingeh û wateya teng de têgîna herî serekîn a çandê ye. Mirov dikare ziman weke çanda teng jî pênase bike. Ziman bi xwe, berhvok û daneheva civakî ya hizir û hestên ciwankar, exlaq û hişmendiya ku civakekê bidestxistîne ye. Hebûna wê ya bîrî (ansal) û nasnameyî ye ku hest û wate pê derketine zanebûn û xwe gihandine derbirînê ye. Civaka ku dibe xwedî ziman, tê vê wateyê ku ew civak bûye xwediyê hêceteke pir xurt a jiyanê. Asta pêşketina ziman asta pêşketina jiyanê ye. Civakekê zimanê xwe yê zikmakî çi qasî pêşxistibe, tê wê wateyê ku ew qas jî asta jiyana xwe pêşxistiye. Civakekê çi qasî zimanê xwe winda kiribe û li rastî ketina bin dagirkerî û serdestiya (hegemonyeya) zimanên din hatibe, tê wê wateyê ku ewqasî jî bûye mêtingeh û li rastî bişaftin û nîjadkujiyê hatiye. Civakên ku vê rastiyê dijîn di hêla hişmendî, exlaq û civankariyê de nabin xwediyê jiyaneke bi wate û pir zelal e ku heta ji holê radibin jî wê mehkumê jiyana

Heya ew ziman hebe, dê ew netewe jî hebe. Ziman navgîneke hilberînê û heyînîyeke zindî ye, mîna zarokekê ji diya xwe dibe tê dunyayê û mezin dibe, heger ku baş neyê xweyîkirin, bêguman wê demê ew ziman qels dibe û dimre.

Ji bo nasnameyê ziman xala sereke û bingehîn e û hebûna mirov bi ziman tê xuyanî kirin, ziman nasnameya mirov nîşan dide, neteweya mirov bi ziman ve girêdayî ye, ango dema bingeha ziman jê qutûbirr bibe di wê çarçoveyê de, neteweya wî ya kesayetî tê bin pê kirin, ji lewre ziman û netewe bi hev ve girêdayî ne.

Ziman di nava dîroka mirovahiyê ya dirêj de, yek ji girîngtirîn navgîniya danûstendinê di navbera mirovan de ye. Ya statu da ziman ev e ku ew civak û neteweyên curbecur û cihêreng derdixe holê.

Di pêşkeftina civakan de rol û girîngiya ziman diyar e. Ziman ew e ku nasnameya gelan û neteweyan îfade dike. Gava ku kes bi zimanekî diyar diaxife, ew çand û dîroka xwe diyar dike. Her civakek xwedan dîrokeke, ev dîrok bi rêya ziman, xwe radigre, her wisa bi rêya ziman mîrasa civakê ji dêûbavan vediguheze zarok û neviyan.

Dema ku hûn dixwazin civakeke bihêz, hevgirtî û hevbend ava bikin, divê ev civak bibe xwedan zimanek ku pê ramanên xwe îfade bike, û divê were zanîn ku ziman û çand encama berhevkirina hezarên salan e, bi kurtahî mirov dikare bibêje ku civak ji zimanê xwe dest pê dike.

Ziman û civak di têkiliyeke bibandor û watedar de ne. Ziman bûye yek ji diyardeyên mirovî yên herî balkêş, her wekî pergala balkêş a sembol û tîpên ziman ku wateyên cihêreng digirin. Ji faktorên bingehîn ên herî girîng di pêkhatin û avakirina civakê de ziman e, her wiha bi bingeh û bandor beşdarî diyarkirina nasnameya kolektîf a koma mirovahiyê dibe, ev yek hebûna têkiliyeke di navbera ziman û civakê de piştrast dike.

Bi ziman, adet û kevneşopiyên civakê tên naskirin, lewma zehmet e ku mirov çanda civakekê nas bike bêyî ku zimanê wê civakê baş zanibe.

Hêjayî gotinê ye ku ziman ne tenê nasnameyê ifade dike, lê belê di hemû pêşketinên ku mirov di wan re derbas dibe, ziman tê de diyar e.

Dema em vegerin serdemên seretayî yên jiyana mirov, em ê bibînin ku biderketina ziman re pêşketin û pêşvebirin dest pê bûye, afrandinên mezin derketine holê, piştre bi afrandina bêjeyan re û di pey re bi derketina xwendin û nivîsandinê afrînerî û pêşketinê berdewam kiriye.

Pêwîst e ku civak ronakabîr û zanayên xwe derxe holê û bi rêya wan pirsgirêk û arîşeyên xwe çareser bike, bi taybetî ji hêla pêşxistina ziman û parastina çand, kultûr, rêûresm û nirxên civakî ve, zanyar û afrînerên herî mezin di dunyayê de zimanê dayika xwe bikaranîne û zimanê xwe yê resen parastine.

# Di Pêşvebirina Civakan De Girîngiya Ziman

Aram Hesen*

> **Dema ku mirovek zimanê xwe yê dayikê winda dike, mîna masiyê ku ji avê qut bibe, radestî mirinê dibe û ber bi tunebûnê ve diçe.**

Di dîroka mirovahiyê de azîneya herî girîng ziman e, di bûyîna civakê, pêşketina zanyarî, zanistî û şarezatiyê de ziman cihekî taybet digre, bi rêya ziman mirov komî hevdu dibin û civak û neteweyan pêk tînin. Bingeha hişmendiya neteweyî jî bi rêya ziman tê avakirin û nasîn.

*Ji Qamişloya Rojavayê Kurdistanê ye. Ziman û Wêjeya Erebî li Zanîngeha Helebê û Peymangeha Zanistên Perwerdehiyê li Qamişlo xwendiye, di Kovara Şermola de serenivîskarê beşa kurdî ye. Li Zanîngeha Rojava di beşa Ziman û Wêjeya Kurdî de perwerdekar e, her wiha di warê wergerê de jî dixebite.

ku mirovên kevnar-pêşîn (niyandirtal) di şkeftan de dijiyan, hingê mêr diçûne nêçîrê û jin li gel zarokan di şkeftê de diman. Ji ber wê jî zarok ji dayîka xwe fêrî zimên dibûn. Ango hingê rola mêr di afirandina zimên de tune bû``. Ev nêrîn hin pirsan tîne holê: Gelo mêr bi roj û şev li nêçîrê dima û dema ku vedigeriyan şkeftê nedipeyivîn? Ji destpêka jiyana mirovahiyê ve, gelo jin ji mêr hînî zimên bû, yan mêr ji jinê hînî bû? Yan jî herduyan û li gor pêdiviyên jiyanê ziman afirandine?

Mirov û ziman hevcêwî ne û tu carî bêyî hev nabin, lê bêguman mirov ziman afirandiye. Eger serdema mirovên kevnar û ya niha em bidin ber hev, hinekî bersiva pirsên jorîn zelal dibe.

Ji roja roj de mirov giyanewerekî civakî ye. Belkî malbat ne wek serdema mirovên hişmend bûn, lê anegorî wan serdemên pêşîn malbat hebûn û di hemû warên wan serdeman de bi hev re dijiyan û têkildar dibûn. Di wan serdeman de şkeft û piştre mal ava bûn. Li gor dîroknasan, di her şkeftekê de bêtirî malbatekê li gel hev dijiyan. Ango hemû mêr nediçûn nêçîrê. Bêguman bêdeng nediman. dipeyivîn û zarokan guhdariya wan dikirin. Ne tenê wisa, lêbelê bi zarokan şad dibûn û belkî bi wan re dilîstin jî. Lewra zarok ji hemû malbatê hînî zimanê wê demê dibû. Di serdema niha de jî mal wek akademiya pêşîn a zimanê zarokan ê destpêkê ye. Di wê akademiyê de zarok ji hemû kesên malbatê hînî zimên dibin. Nêrîneke şaş e ger em bibêjin: Tenê dayikê zarok hînî zimên kirine û rola kesên din ji malbatê di hînkirinê de nîne. Lewra jî şaş e ku em bibêjin zimanê (Dayikê) yan zimanê (diya min)

Hin dibêjin (Zimanê zikmakî). Xudiyên vê nêrînê dibêjin ku zarok di zikê diya xwe de tê amadekirin ku bi zimanê dayika xwe bipeyive. Gelo ev nêrîn rast e? Bêguman nêrîneke ne zanistî ye. Eger xudiyê vê nêrînê bibêjin erê rast e, em ê pirsekê ji wan bikin: Bi sed hezaran Kurdan jinên`Ereb, Faris, Tirk û ji miletên curbecur birine. Gelo dibe ku zarokên wan bibêjin: Zimanê me yê (Zikmakî) ye? Belkî diya wan nizane bi Kurdî bipeyive jî.

Anegorî zimanzanan ji her neteweyekê-miletekî re zimanekî dayik (mak) heye. Ziman dayika/ maka neteweyê ye. Zimanê Kurdî dayika netewa Kurd e. Herweha zimanê `Erebî dayika neteweya `Ereb e û zimanê Fransî dayika neteweya Fransî ye û…. hwd. Ji ber wê jî ya rast û durist em bibêjin: Zimanê dayik. Belê Kurdî zimanê me yê dayik e. Ne zimanê dayikê ye.

Vêca tişta seyr ew e ku hin ji Kurdan, nemaze li Roja Zimanê Kurdî dibêjin: “Kurdê ku bi kurdî naxive, nanivîse û naxwîne rêgirtina dayika xwe nagire”!!! Ango zimên bi dayika wan kesan ve girê didin. Ya rast û durist ew e ku weha bête gotin: Kurdê ku bi zamanê xwe naxive, naxwîne û nanivîse rêzgirtina neteweya xwe nagire. Ji ber ku kurdî dayika/maka neteweya kurdî ye.

Em bi zimanê xwe yê dayik serbilind û şanaz in.

# Zimanê Dayikê, Zikmakî, Dayîk, Mak. Ji Van Gelo kîjane Rast e?

Merwan Berekt*

**"ya rast û durist em bibêjin: Zimanê dayik. Belê Kurdî zimanê me yê dayik e. Ne zimanê dayikê ye.**

Dosyaya Hejmarê

Wekî hemû beşên zanînê yên din, di warê zimanzanînê de jî gelek lêkolîn û bîrdoz hatine nivîsîn. Ango jiyana zimên ji sedsalan ve, nemaze ji aliyê zimanzanên Ewropî ve hatiye lêkolînkirin. Nêrîneke kevnar hebû digotin ku dayikê - jinê ziman afirandiye. Çawa? Gelo ev nihrîn rast e?

Xudiyên wê nêrînê dibêjin: ``Dema

*Wêjevanekî kurd e, di sala 1964 de li navçeya Şêrewa ya girêdayî Herêma Efrînê dayîk bûye. Navbera 1993 - 2018an de weke endamê komîteya sernivîser di kovarên (Xunav, Buhar, Pirs) û rojnameya Newroz de dixebite. Di 2006an de li gel komek xemxwerên zimanê kurdî Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî li bajarê Helebê dadimezirînin. Û Navbera 2013-2018an de mihrecana Roja Helbesta Kurdî li Efrînê rêve dibe. di 2014an de li bajarê Efrînê Siya Wêje ava dike. heya niha 31 berhemên wî hatine çapkirin bi herdu zimanên Kurdî û Erebî di warê roman, cîrok, Zargotin, Ziman, dîrok û helbestan de.

zarokên kurdan, ji nêz ve bi pirsa siyasî û sosyolojî ve girêdayî ne, lê dîsa li deverên derfeta perwerdeyê lê tune be hin elternatîf jî hene ku em kesayeta zarokên xwe bi zimanê dayika wî têr bikin..
li Başûrê Kurdistanê ev pirs çareser bûye û ji Rojavayê Kurdistanê derfeta perwerde û hînbûna zanistê bi zimanê kurdî peyda bûne, piştî tekoşîneke bê hempa hêjaye ev derfeta zêrîn were istismarkirin ku nifşekî ji zarokan di qonaxa seretayî de bi zimanê dayikê şîra wêje û nasînê vexwe, da jêre bibe saman, ji bo nasname û avakirina kesayeteke neteweyî azad di giyanê wî de were sazkirin.

## Çavkanî:

-Rapora unisko bi boneya roja zimanê dayikê https://ar.unesko.org
Ya saalê (dewletên serkêş yê perwerdê bi zmanê dayikê dibînin)
-Kampaniya fêrkirinê,www.capaignfarducation.org
-Ezmûneya Malîzya,http://books.googl.iq
-Pirtûka zimanê netewî zimanê dayikê ye,Abdul-alî-aldughari
-Girîngiya zimanê dayikê di nasnameyê de w.w.wAloke .net

perwerdekirina masûlkên zimanî û perdên dengî rahênan û çalak bibin. Ji sala pazdehan û pêve baştirîn temen e ji bo hînbûna zimanên dîtir .

Sedema ku zarokên kurdan mû li zimanê wan hatiye gerandin di van serdemên zimanên serdest de, ji ber vê diyardeyê ye ku ne hînî zimanê dayikê dibin û ne baş bi zimanên dîtir jî dipeyivin.

Ji bo zarokên kurdan hînbûna zimanê biyanî yan duzimanî di temenê biçûk de tevliheviykê li gel wan çêdike, ji ber her zimanek, xwedan taybetmendiyên cuda ye.

Hin nimûne ji bo zimanê kurdî û zimanê erbî Ji bo zarokên kurd di qonaxa seretayî de û tevliheviyan navber herdu zimanan de du aliyan li gel mejiyê wî ava dike:

1-Nivîsa kurdî latînî çep, ya erebî rast e.

2-Di abeceya kurdî de dengdêr tîp in, ya erebî nîşandekin û tim nayên danîn.

3-Hevoka kurdî ya lêkerî bi kirde dest pê dike, ya erebî bi lêker dest pê dike..

4-Lêvkirina tîpan ji hêla dengsazî ve pir ji hev cuda ne.

5-Lêvkirina hejmaran ji 21 heya 99 kurd ya mezin pêşî dibêjin, erebî vajî wê ye.

6-Rênivîsa kurdî xwe dispêre bihîstina dengan, ya erebî xwe dispêre rêziman ku karibe rast binivîse..

wek zarokên kurd ku (kesre û dema) erebî bi tîpa Î –Û dinivîsin.

-Ev hin têvilî di navbera zimanê erebî û her wiha navbera zimanê tirkî û farisî de ji bo zarokên kurdan dibe astengiyeke rastîn e dijî ravekirin û hêza mejî.

-Zimanê biyanî ji dêvla zimanê dayikê ji hêla giyanî û dilnazî ve xaleke pir tirsnak e ku girêdana zarok ber bi hêmanê çanda wî zimanî ve dibe.

-Zarokên duzimanî yan mîna zarokên kurdan yên bi zimanê sedestan perwerdeyê dibînin di srdemên seretayî de hevsengiya zimên li cem wan liyeç dibe û dariştin li gel wan lawaz dibe.

Li gor ezmûneyên ku di vê der barê de hatin çêkirin.

-Zarokên ji zimanê dayikê mehrûm in di binhişiya xwe de kêm û nizim dimînin.

bandoreke derûnî di derûna wan de şaxdayî dimîne.

-Mirovên bi zimanê dayika xwe perwerde nebûne di derbirîn û di lêvegera zimanê dayika xwe de, zor û astengiyan dibînin û di îfadekirin û bêjdanê de her li ber wergerandina ji zimanê serdestan ne, di bêdengiya mejiyê xwe de. Ev diyarde li gel kurdên Bakur eşkere ye di derbirîn û hevoksaziyê de rêzana zimanê dayikê jî gelemşe dike.

Armanc ji vê pirsa ku di tevaya cîhanê de,

pirsa hînbûna zanistê bi giştî bi zimanê dayikê hatiye pejirandin û çespandin, bêguman asta pêşketina civakê, bi asta pêşketina zimanê dayikê û hînkirina zanistê bi zimanê zikmakî ve têkildar e...

Arîşeyên ku min anîne ziman ji bo

Heger em vê diyardeyê li rewşa civaka kurdan bipîvin, em ê encaman ji nêz ve bibînin. Li gel ku kurd bi hezaran xwendevan jî hene, heya bi astên bilind, li hemberî vê, afirendêrî û ciwankarî ji hêla zanistî û wêjevaniyê ve peyda nabe. Hêjayî gotinê ye ku di serdema dibistanên olî û feqeyan de bejnên bilind di nav civaka kurdan de derdiketin ji hêla wêje û zîrekbûnê de, vajî vê, îro ciwanên kurd nikarin pênc xuleyan bi derbirîn û bi zimanekî watedar xwe îfade bikin...li hemberî vê, kalên kurdan nifşên ku neketn bin tewanga zimanên biyanî, di vegotin û çîrokbêjiyê de bi şêwazekî pir bilind diaxivin.

## Rola zimanê dayikê di tevna hişmendiya giştî ya civakê de:

Ji bo ku civakek hevsengî di nav binçîneya jêrîn û jorîn de hebe, girîngiya civakê bi bingeha jorîn ve pir pêwîst e, tevî ku herdu bingeh di hev re derbasbûyî ne.

Weke tê zanîn ku bingeha jorîn ji çand, huner, hizir, bawerî û siyasetê pêk tê ku di gewdekirina hişmendiyeke yekgirtî de esas e, ev diyarde bi giştî dikevin bin sîwana zimanê zikmakî de û bi taybetî hebûna yekzimanê perwedê, ji bo neteweyekê ku yekser bandora wê li şêwaz û naveroka bingeha jêrîn heye, di biryardayîna rêveberî û yarmetî ya civakê bi rêveberiyê re.

***(Ya ku îro kurd jê êş dikişînin tunebûna yek elfeba û yek zimanî ji bo perwedê, dibe sedema neyekrêziya civakî û hizreke neteweyî hevgirtî..).***

## Neyêniya perwede û hîndariya zanistê bi zimanê biyanî li ser derûna zarokan:

Pir nerîn û xwendin li ser ne duristiya hînkirinê bi zimanekî dîtir di qonaxa seretayî de li gel zimanê dayikê hatine kirin, ku zimanê duyemîn li ser hesabê zimanê dayikê ye, bihaneya wan xwe dispêre felsefeya derûniya perwerdehiyê. Yek ji van zanyaran zimanzanê ingilîzî Maykil Wîst dibîne ku ***(Zimanekî dîtir li gel zimanê dayikê di qonaxa seretayî de neyênî û zerereke mezin li ser asta têgihiştinê dighîne zarok).***

Her wiha zanyarê ereb Ezîz Alqawsî, rêveberê navenda Unisko ya perwedê li şaxê Beyrûtê di salên pêncî de daxwaz kir ku zimanê biyanî ji minhacên seretayî were derxistin.

Dewleta Misirê yekemîn bû di pêkanîna vê bangewaziyê de.

Her wiha zanyar Satih Elhuserî weha dibêje:***(Hînkirin bi zimanê biyanî di qonaxên seretayî de asetngiyê li pêşya geşkirina hizrên zarokan çê dike).***

Weke zimanzanê Emrîkî Noam Chomsk dipirse ku çawa û bi çi teknîkê zarok di kurtirîn dem de hînî rêzman û zimanê dayikê dibe?

-Ji lewra, ji sala sisyan heya sala şeşan zarok hewcedarî hînbûna zimanê dayikê ye ku hêza derbirîn û

derbasbûyîne.
Di pêkahatina nasnameyê de, zimanê dayikê bi bêhn û rengê xwe, nasnameyê bi gewde dike. Di encamê de weke binçîneya jorîn e ji hizir û giyanê civakê re.
Li gorî zimannasiya civakî, ***''nasname, tişta ku kes pê hestiyar dibe û di civakê de vêre dibe yek.".***

## Rola zimanê dayikê di avakirina kesayetê de:

Zimanê dayikê hîmekî bingehîn e di avakirina kesayetê de, di kêlîka pêşîn de dema zarok çavê xwe li dinyayê vedike xwe di nav gume-gumekê de dibîne, nizane çi deng û tevger li dora wî diqewimin, hêdî-hêdî bi demê re hînî dengan û bêjeyan dibe û tiştan dibihîze û ji derdora xwe fêr dibe. Ew qonaxa yekemîn e di tevn û hûnandina kesayeta zarokê de, dibe hêmana bingehîn û sereke di avakirina kesayetê de.

-Çendî zimanê dayikê zengîn û watedar be, ewqasî zarok dibe xwedan azîne û derfetên pêkwer di jiyana xwe de; çanda nasîna di malbata dê û bavê de bi azîneya ziman, jê re dibin delîve û sermiyan weke çekên giyanî ji dahatûya wî re.

***(Di baweriya min de "pirrnîskbûna kesayetya civakên bindest" yên bi zimanê dayikê perwrdeyê nabînin. xwe dispêre vê xalê, bi taybet ji bo zarokên kurdan di temenê xwe yê pêwîst de şîrkuştî dibin, weke şitla hîn xwe negirtibe ji axa xwe dûrbikeve.. helbete ku ew dar û lem, ber bigre jî wê pir lawaz û li rû be...).***

Gotina wêjevan û nivîskarê Arjentînî Xorxî Lewîs bi esil Îspanî 1986/1899, pir watedar e ***"Ez naxwazim bimrim di zimanekî de, ez jê fam nekim".***

## Rola zimanê dayikê di ciwankarî û afrendêriyê de:

Bêguman piştî hêçandin û lêkolînên di der barê zimanê dayikê de hatin kirin, tevaya cîhanê pê bawer in ku perwrde û zanist, çendî girîng e ji hêla nasname, kesayet, hem jî naveroka ciwankariyê û berhemdêriya civakan bi vê diyardeyê ve ji nêz ve bestiye, ya vê di çesipîne ku 19 dewletên di teknolojiyê de serkeftî ne, bi giştî zanist û perwerdeya wan a seretayî bi zimanê dayikê ye.. Li gorî rapora rêxistina Unisko ***(Baştirîn dewletên pêşketî, yên zimanê dayikê di perewerdeyan de bikar tînin..).***
-Di vê der barê de Ezmûna Malîziya: malîzyan, xwestin beşên zanistê û bi taybet bîrkarî, kirin bi zimanê ingilîzî ji bo qonaxa seretayî, di deh hezar dibistan de.
-Piştî şeş salan ji ezmûneyê, ew proje rawestandin, careke din vegeriyan ser zimanê dayikê, ji sedema ku asta zanistî û têgihiştinê di nava zarokan de lawaz bû. Tevaya pspor û zanyarên zimên dibînin ku baştirîn perwerde û hîdnarî ya bi zimanê dayikê tê bikaranîn.

mehrûm in, tevaya wan ji netewe û civakên bindeşt in. ev paradîgma dibe zemîna nezanî û aloziyan di civakê de. Li gor rêxistina Unisko ku ev rêje bi piranî li kêşwera Efrîkayê û hin kantonê Hindistanê derbasdar e û bi teybetî li herêm û gundewaran ku dûrî navendên fermî yên zimanên serdeşt li wan tê bikaranîn.

-Heger em vê diyardeyê li ser rewşa kurdistanê bi giştî raxînin, bi taybetî li Bakurê Kurdistanê.

Mixabin ku rêxistina Unisko ji ber fişarên siyasî nêzîkî rewşa kurdan baş nabe, ku miletekî jimara wî di ser pêncî milyonî re heye, ji mafê xwe yê perwerdê û hînkirina zaniştê bi zimanê dayikê bêpar e û zimanê dagirkeran li ser hatiye ferz kirin.

Weke vê nimûneyê li tevaya cîhanê peyda nabe.

Ev diyardeyeke ji binpêkirinên herî êşdar in û bê edaletiyeke bê hempa ye. Li ser zarokên kurdan berî mezinan, ku di qonaxên seretayî de dikevin bin barê hînkirinê bi zimanekî biyanî û bêyî dilê wan.

-Şopeke neyênî li derûn û hestên zarokan vedide, nexweşî û xemxwariya vê janê, heya bi mirinê bi xwe re hiltîne.

-Li ser esasê tevaya lêkolîn û ezmûneyên hatine kirin ku qonaxa seretayî ji bo hînkirina zaniştê bi zimanê dayikê gelekî girîng e û roleke mezin di avakirina hişmendiya zarok de dilîze. Û ji bo wan dibe hîmê bingehîn, di têgihiştina zaniştê bi şêweyekî akademîk di paşerojê de.

***(di baweriya min de faşîzma desthilatdar li ser civaka kurdistanê baş vê xalê dizane ku rê û derfetan li pêşiya vî mafî ji destê kurdan digire ku civakên kole û seqet ji vir dest pê dike...).***

## Bandora zimanê dayikê li nasnameyê:

Li gorî gotina Birêz Mandêla, bêjdan bi zimanekî were famkirn ji bo kesê hemberî te.Yekser li gorî bîrdanka xwe dipîve û fam dike, lê dema ku bi zimanê dayika wî pê re were axaftin, hem dil û hem mejî têkilî hev dibin di guhdarkirinê de.

Gelo çi têkilî di navbera zimanê dayikê û hest û dilnaziyê de heye, di hûnandina nasnameya kes de? Di vê der barê de birêz Nîlson Mandêla dîsan weha dibêje: ***''zimanê dayikê yek ji faktorên bingehîn e di gewdekirina kesayetyê û nasnameya çandî de, li gel rola wî ya civakî di têgihiştin û zaniştê de..''.***

Ji ber zimanê dayikê mîna kewarekê ye, gençîneya ezmûneya neteweyekê di xwe de hildigre, lehengî, şîn, şahî û nirxên neteweyî ji nifşekî ta nifşekî bi zimanê dayikê tê veguhestin, bi giştî dibe weke nasnameya civakê û nasname jî, ne ziman tenê ye, lê regezekî bingehîn e di nasnameyê de, wek neynik û gencîneyeke berhemdar e.

-Çand, zargotin, çîrokên şahî û tirajîdî, helbest û stran, lehengî û evîndarî bi zimanê dayikê re di hev re

civakî û siyasî ku nikarin bi zimanê dayika xwe hînî zanistê bibin.
Zimanê serdest li ser wan hate ferzkirin, ev diyarde li cîhana sîstema sisyan û bi taybetî li kêşwera Efrîkayê heye.Yek ji van miletên bêpar li Rojhilata Navîn miletê kurd e, di dema ku piraniya miletan mafê xwe yê siyasî bi dest xistin, li ser kurdan zimanê dagirkeran hate ferzkirin.
ji damezrandina dewletên neteweperset, dagirkerên Kurdistanê çand û zimanê kurdî qedexe kirin, bi taybetî ji destpêka damezrandina cimhûriyeta Tirkiyê ve qirkirina ziman û miletan dest pê kir, heya bi dibistanên olî li Kurdistanê ji ber vê toşa şûm nefilitîn.

***(Li ser vê mijarê ez ê çend xalên bingehîn ji girîngiya perwerdeya bi zimanê dayikê bînim zimên, çawa pispor û lêkolîneran ev pirs nirxandine).***

## Neyênî û tirsnakên hînkirin û fêrkirinê li ser asta zanistê bi zimanekî biyanî:

li gor lêkolîn û lêgerînên ji bal pispor û zanyarên zimanan hatine kirin, di der barê binkeftina hînkirin û perwerdeyê û paşveçûna fêrkirinê de.
-Bi giştî bi sedemên ku zimanên serdest li wan welatan di dibistanan de tê bikaranîn û zimanê wan yê resen nebûye yê hînkirin û perwerdeyê. Ev dibe sedema binkeftina zarokan di qonaxa seretayî de.
Ji ber ku zarok yekser rûbirû li hember asetengiyên têgihiştinê dimînin, di hînkirina bi zimanekî dîtir, ji hêla wate û tayebetmendiyên zimanekî nû li ser zarokan.
-Ji bo zarokên kurdan yên li dibistanên seretayî li herçar parçeyan ev ezmûneya bargiran bi serên wan de hatiye, ji ber minhacên seretayî li van welatên kurdistan di nav wan de dabeş bûye ji zarokên neteweya xwe re saz kirine.
-Heya ku zarokên kurdan hinekî hînî zimanê biyanî bibin şeş sal gerekî wan e.
-Meteryalên zanistî, bîrkarî lê diçin ji bo qonaxa navîn zarokên kurdan li ser bingehekî lawaz rûbirû li hemberî vê qonaxê dimînin.

***(di bawerya min de lawên kurdan yên bi zimanê serdestan xwendine, bi taybetî nişteciheên dûrî bajar û navendên dewletê..ev êş û asetngî dîtine.).***

Li gor xwendin û lêkolînên ‘benga navneteweyî, %50 ji zarokên cîhanê yên derveyî dibistanan û ji perwerdê mehrûm in, ew tev ji civakên ku zimanê dayikê li wan deveran, ne yê perwerdê ye .
ji xwe rêjeya cehalet û nezaniyê li wan deveran diyar e. Ev dibe sedema binkeftin û dûrketina zarokan ji dibistanan û di encamê de asta bawernameyên zanistî li wan welatan pir kêm e.
Her weha li gor vê saziyê 220 milyon zarok li cîhanê ji zimanê dayikê

# Giringiya Zimanê Dayikê Di Perwerde û Hînkirinê De

**Ya ku îro kurd jê êş dikişînin tunebûna yek elfeba û yek zimanî ji bo perwedê, dibe sedema neyekrêziya civakî û hizreke neteweyî hevgirtî.**

Beşîrê Mele Newaf*



Bi dagirkirina welatên cîhanê ji bal dewletên Rojavayî ve û destserkirina civak û neteweyên li paşmayî, gelek milet û civak ji mafên xwe yên xwerîstî mehrûm man, çand û zimanê dayika wan hate qedexekirin. li tevaya cîhanê rêjeyeke mezin ji civaka mirovan heye, bêpar mane ji mafên

* Di sala 1956'an de li bajarê Amûdê hatiye dunyayê. Li Zanîngeha Rojava di beşa ziman û wêjeya Kurdî de Mamostayê waneya Şano ye. Helbest û Şanoyan dinivîse, beşdarî mihrîcanan dibe û çend xelat di warê şano de wergirtine.

## Çavkanî:

1. ^ Bloomfield, Leonard. Language ISBN 81-208-1196-8
2. ^ Davies, Alan (2003). The Native Speaker: Myth and Reality. Multilingual Matters. ISBN 1-85359-622-1.
3. ^ "Terri Hirst: The Importance of Maintaining a Childs First Language". bisnet.or.id. Archived from the original on 12 March 2016. Retrieved 13 July 2010.
4. ^ Boroditsky, Lera (2001). "Does language shape thought?: Mandarin and English speakers' conceptions of time" (PDF). Cognitive Psychology. 43: 1–22. doi:10.1006/cogp.2001.0748. Archived from the original (PDF) on 10 May 2013. Retrieved 17 September 2013.
5. ^ Saniei, Andisheh (2011). Who Is An Ideal Native Speaker?(PDF). 2011 International Conference on Languages, Literature and Linguistics. Archived (PDF) from the original on 2 February 2018. Retrieved 1 February 2018.
6. ^ Jump up to:a b Love, Nigel; Ansaldo, Umberto (2010). "The native speaker and the mother tongue". Language Sciences. 32 (6): 589–593. doi:10.1016/j.langsci.2010.09.003.
7. ^ "mother tongue". 2001 census. Archived from the original on 16 September 2008. Retrieved 25 August 2008.
8. ^ [Ivan Illich] in Patttanayak, 1981:24 cited in "(M)other Tongue Syndrome: From Breast to Bottle" Archived 30 August 2017 at the Wayback Machine
9. ^ Ivan Illich, "Vernacular Values" Archived 20 July 2016 at the Wayback Machine
10. ^ "Language Proficiency: Defining Levels Avoids Confusion". Alsintl.com. 26 August 2013. Archived from the original on 17 September 2013. Retrieved 13 November 2013.
11. ^ Hakuta, Kenji; Diaz, Rafael M. (1985), "The relationship between degree of bilingualism and cognitive ability: A critical discussion and some new longitudinal data" (PDF), Children's Language, 5, pp. 319–344, archived (PDF) from the original on 24 October 2013, retrieved 21 October 2013
12. ^ Bauer, Laurie (2007). The Linguistics Student's Handbook. Edinburgh University Press. p. 78. ISBN 978-0-7486-2758-5.
13. ^ Lee, Joseph J. (2005). "The native speaker: An achievable model?" (PDF). Asian EFL Journal. 7 (2). article 9.

***have more than one mother tongue or native language.***
***The first language of a child is part of that child's personal, social and cultural identity. Another impact of the first language is that it brings about the reflection and learning of successful social patterns of acting and speaking. Research suggests that while a non-native speaker may develop fluency in a targeted language after about two years of immersion, it can take between five and seven years for that child to be on the same working level as their native speaking counterparts.***
***On 17 November 1999, UNESCO designated 21 February as International Mother Language Day".***

Zimanê yekem ê zarokê beşek ji nasnameya kesane û civakî û çandî ya wî zarokî ye. Bandoreke din a zimanê yekem ew e ku ew raman û fêrbûna qalibên civakî yên serfiraz ên tevger û axaftinê tîne. Lêkolîn destnîşan dike ku dema ku axaftinek ne-xwemalî dibe ku piştî nêzîkî du salên binavbûnê, dibe ku di navbera pênc û heft salan de hebe ku ew zarok di heman asta xebatê de be digel hevpîşeyên wan ên ku bi zikmakî diaxivin.
Di 17 Çirî 1999 de, UNESCO 21 Sibatê wekî Roja Navneteweyî ya Zimanê Dayikê destnîşan kir.

## 5. Bîst Zimanên Dayikê Yên Jorîn

Li seranserê cîhanê 3 milyar mirov navnîşa jêrîn a zimanên dayikê yên herî pir têne axaftin pêk tînin. Digel ku Engilîzî zimanê ku herî pir tê axaftin, yên ku wî wekî zimanê duyemîn di-axivin bi rastî ji yên ku wî zimanê dayikê bikar tînin bi sed mîlyonan in.
Ji ber ku mirov dest bi pejirandina zimanên ku bi firehî têne axaftin li dora herêma ku ew ji wan in, pir karanîna wan kêm dibe. Ev bêtir ji hêla mezinbûna temenê dîjîtal û înternetê ve tête katapult kirin. Bi taybetî bikaranîna medyaya civakî.
Li gel ziman wenda dibe, gelek derbirînên çandî û kozmolojî dibe, ku ji xefkirina berikên çandên ber bi wendabûnê ve xem e.

1. Mandarin Chinese
2. Spanî
3. Engilîzî
4. Hindî
5. Erebî
6. Portekîzî
7. Bengalî
8. Rûsî
9. Japonî
10. Javayî
11. Germanî
12. Wu Chinese
13. Koreyî
14. Frensî
15. Telûgî
16. Maratî
17. tirkî
18. Tamil
19. Viyetnamî
20. urdû

dayikê, divê ji salên destpêkê dest pê bike ji ber ku lênihêrîna zaroktiya zû û perwerdeya zû bingeha fêrbûnê ye.
Pîrozbahiya UNESCO-yê ya Roja Zimanê dayikê ya Navneteweyî bang li siyasetmedar, perwerdekar û mamoste, dêûbav û malbatan dike ku pabendiya xwe bi perwerdehiya pirzimanî mezin bikin, û têkevin nav perwerdehiyê da ku di çarçova COVID-19-ê de başkirina perwerdehiyê pêşve bibin. Ev hewldan di heman demê de dibe sedema pabendiya Cali ya 2019 bi dadperwerî û tevlêbûna di perwerdehiyê û Dehsala Navneteweyî ya Zimanên Xwemalî ya Neteweyên Yekbûyî (2022-2032) de, ji bo ku UNESCO ajansa sereke ye, û pirzimaniyê dixe bingeha geşedana gelên xwecihî. Piştevanîkirina Pirzimaniyê ji bo Tevlêbûna Di Perwerde û Civakê Roja Navneteweyî ya Zimanê dayikê.

• Bilindkirina hişmendî û parêzvaniya ji bo tevlêkirina zimanên xwemalî di perwerdehiya fermî de û di heman demê de ji bo vegerandina fêrbûna li civakên Xwemalî, girîngiya veguhastina navnifşî ya zanyarî û zimanên xwemalî bi zimanên xwemalî, li vir binihêrin;

• Parastina mîrata çandî, di heman demê de bi misogerkirina zimanên xwemalî û mîrata çandî ya ku ji hêla van zimanan ve hatî veguheztin bi tevahî bibe beşek ji gerdûnî.

• Pêşdebirina siyaset û kiryarên perwerdehiyê yên berfireh, ku pirzimaniyê di warên pirzimanî de dike yek.

## 4. Zimanê Yekem

Zimanê yekem, zimanê dayikê, an ziwanê dayikê /bav/ dêûbav (wekî zimanê arterî an L1 jî tê zanîn), zimaneke ku kesek ji dayikbûnê ve an di heyama krîtîk de pê re rû bi rû maye. Li hin welatan, têgîna zimanê zikmakî an zimanê zikmakî, ji zimanê yekem ê zimanê zimanê etnîkî ya yekê ye.
Carinan, ji bo zimanê ku kesek di zaroktiya xwe de fêr bûye (bi gelemperî ji dêûbavên xwe) têgeha "zimanê dayikê" an "zimanê dayikê" (an "zimanê bav" / "zimanê bav") tê bikar anîn. Zarokên li xaniyên duzimanî mezin dibin, li gorî vê pênaseyê, dikarin ji yekê zêdetir zimanê zikmakî an zimanê zikmakî hebin.
Naveroka peregrafa jorî li gor ku bi zimanê Ingilîzî hatiye:

***"A first language, native tongue, native language, or mother/father/ parent tongue (also known as arterial language or L1), is a language that a person has been exposed to from birth or within the critical period. In some countries, the term native language or mother tongue refers to the language of one's ethnic group rather than one's first language.***

***Sometimes, the term "mother tongue" or "mother language"(or "father tongue" / "father language") is used for the language that a person learned as a child (usually from their parents). Children growing up in bilingual homes can, according to this definition,***

Hilbijartina vê tarîxê sembolîze dike roja ku polîs îro li bajarê Dakka, paytextê Bangladeşê agir berdan xwendekarên ku di xwepêşandanekê derketin da ku daxwaz bikin ku zimanê wan ê zikmakî, Bengalî, wekî yek ji du fermî were nas kirin zimanên welatê ku wê demê Pakistan bû.

Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî biryar da ku sala 2008-an Sala Navneteweyî ya Zimanan û 2010-an jî weke Sala Navneteweyî ya ji bo Nêzîkkirina Çandan were îlan kirin.

Ziman bi hemî şêwe û teşeyên xwe vegotinek yekta ya afirîneriya mirovî ye, û amrazê herî bihêz e ji bo danûstendin, ramîn û stendina agahdariyê. Ziman xuyangiya me ya cîhanê vedibêje û têkiliya di navbera raborî, aniha û pêşerojê de, û navgîneke bingehîn a veguheztin û pêşxistina mîrata neguhêzbar a gelan e.

Zimanê zikmakî ji ber hebûna têkiliyên hestyarî yên xurt di navbera kes û zimanê ku wî gotinên xwe yên pêşîn gotiye, û kesayetiya wî û dîtina wî ya li ser cîhanê çêdibe. Her ku fêrbûna zimanekî biyanî, ew awayek fêrbûna dîmenek din a cîhanê ye.

Statîstîkên UNESCO diyar dikin ku ji% 50 ji şeş hezar zimanên ku li cîhanê têne axaftin di dawiya sedsala bîst û yekê de têne tehdît kirin, û ji% 96 ji van zimanan tenê% 4 ê cîhanê bikar tîne gelheyî, her çend% 90 zimanên cîhanê li ser thenternetê nayên temsîl kirin jî, lê malperên tevne civakî yên wekî (Facebook) û (Twitter) û hetta peyamên nivîskî yên SMS dikarin zimanên kêm di xetereyê de xilas bikin.

Di şeva pîrozkirina 13-emîn salvegera Roja Zimanê Dayikê de. Dîrektora Giştî ya UNESCO, Banû Irina Bokova, got, "Ziman raman û hestên me vedibêje, û rêya yekane ji bo misogerkirina perwerde ji bo hemî û geşedanê qebûlkirina pirrengiya zimanî û şerkirina cûdakariyê ye, ji ber vê yekê divê diyalogek rastîn di vê yekê de dest pê bike ji hemî zimanan re rêz û hurmet bigirin".

Ziman amûrên herî bihêz in ku mîrata gelan diparêzin û pêşve dibin, li seranserê cîhanê pêşkeftina hişmendiyeke kevneşopiyên zimanî û çandî teşwîq dikin, û dilsoziya li ser bingeha têgihiştin, tehemûl û diyalogê. Mijara Roja Navneteweyî ya Zimanê dayikê ya 2021, "Pêşvebirina pirzimaniyê ji bo tevlêbûna di perwerdehî û civakê de", destnîşan dike ku ziman û pirzimanî dikare tevlêbûnê pêşde bibe, û Armancên Pêşkeftina Berdewam li ser wê yekê ye ku kes li paş xwe nehêle.

Ev helkeftin di vê rojê de ji ber bûyereke taybetî di vê rojê de li Bengladêşê li sala 1999, roja 17 novemberê çêbû, ew jî xwepêşandaneke bo xwendina zimanê dayikê yê birrek ji miletekî ciyawaz ji zimanê fermî lê çê bû. Di vê helkeftinê asayiş an leşkerên hikûmetê berê tifingên xwe dane xwepîşanderan, ji ber wilo ev roj bû roja zimanê dayikê li cîhanê bi tevahî. Inca On 17 November 1999, UNESCO

UNESCO bawer dike ku perwerde, li ser bingeha zimanê yekem an zimanê

lêgerîn, ev avantaj nayê zêdekirin; globalbûn û hevkariya zêde ya di navbeyna neteweyan de tê vê wateyê ku, di gelek rêxistinan de, ji bilî pisporiya di nav qadeke taybetî de pêdivî bi hebûna behreyên zimên jî heye.

Di pêşxistina nasnameya kesane, civakî û çandî de ziman û zimanê dayikê jî roleke mezin dilîzin. Zarokên ku di zimanê xwe yê yekem de bingeheke xurt heye, li gel hestekî zêde ya xweşbawerî û baweriyê, timûtim têgihiştineke kûrtirîn a xwe û cihê xwe di nava civakê de nîşan didin. Bi xwezayî, ev dikeve her warê jiyana wan, di heman demê de serketina wan a akademîk jî.

Zimanê dayikê di pêşxistina nasnameya kesane, civakî û çandî de roleke mezin dilîze

Bêguman ev yek ji wan sedeman e ku li çar aliyê cîhanê pergalên perwerdehiya duzimanî her diçe zêde dibin û gelek dibistanên navneteweyî çavkaniyên xwe li ser damezrandina bernameyên xurt ên zimanê dayikê disekinin. Atolyeyên dêûbavan ên ku girîngiya zimanê dayikê diyar dikin her ku diçe populer dibin, ji ber ku gelek dêûbav bi xeletî bawer dikin ku divê ew tenê bi zarokên xwe re bi zimanê perwerdehiyê yê dibistanê biaxifin, bi gelemperî dibe alîkar ku zarok ne bi zimanê xwe yê yekem an duyem bi tevahî şareza bibin.

Gelek zanayên ziman wek (Benson 2009; Brock-Utne 2010; Heugh & SkutnabbKangas 2010; Mohanty 2009; Nomlomo 2009; Skutnabb-Kangas 2000) weha dibînin: Dema şagirt di proseya fêrkirinê de pêrgî zimanekî ne ew zimanê ku li nik diya xwe hîn bûye, ev zimanê nû dibe asteng di pêşiya fêrkirina wî zarokî de. Têrma (Zimanê dayikê) wergêrana fraza Ingilîzî ye ku jêre (mother tongue) dibêjin, bi Erebî jî heman wergera dihêt ku jêre Di van hersê zimanan de لغة الأم dibêjin.

## 3. Roja Navneteweyî ya Zimanê Dayikê:

**(International Mother Language Day 2021)**

Roja Navneteweyî ya Zimanê Dayikê her sal di 21ê Sibatê de tê pîrozkirin ku kar bo pêşvebirina pirrengiya zimanî û çandî û pirzimaniyê bête kirin. Çapa 22-ê ya vê rojê tête pîroz kirin ku cîhan bi têkçûna bêhempa ya perwerdehiyê re ku ji ber nexweşiya COVID-19 ve gelek gîro bûye.

Her sal di 21ê Sibatê de, cîhan roja zimanê dayikê ya navneteweyî pîroz dike, ku hejmarek mezin ji gel û neteweyan li zimanê xwe yê dayik êşê dikişînin, li çand û mîrata xwe dipirsin, û nasnameya xwe ji holê radikin. li ser vê yekê rêxistinên navneteweyî yên têkildar ew layenên dijî zimanê dayikê protesto dike.

Zimanzan dibêjin ku ger civak ji % 30 fêr nebin, di her civakekê de ji ber windabûnê lawaz e.

UNESCO di 17-ê Çiriya Pêşîn a 1999-an de biryar girtibû ku vê rojê di sala 2000-an de dest pê bike da ku teşwîqa pirzimaniyê û pirrengiya çandî bike.

diaxive, û di demeke giring û bibandor ji jiyana zarokê bikar dihêt. Mînak rewş weha hene ku zarokek heya temenê dibistanê bikaranîna zimanekî taybetî li malê ji hêla dayikê, û bav ve, yan ji aliyê endamên din ên malbatê ve tê bikaranîn û ji ber ku li welatekî din dijî, tê destpêkirin zimanê ku di têkiliyên wan de tê axaftin wekî komên kêfê, dibistan û... hwd… lê heke zarok bi domdarî vegere zimanekî din, ew ê bandora wê kêm bibe.

Wateya zimanê dayikê ji bo zarokekî hemereng e bi roleke weha radibe ku nasnameya zarokî û civakî, û çandî dide mirovan. Ev tê wê wateyê zimanê dema axaftinê tê hilbijartin berî ku were xeberdan li ser wî tê fikirîn.

Giringiya zimanê dayikê ji hêla Profesor Jim Cummins ve ji Zanîngeha Toronto ya Kanada hate xwendin. Wî lêkolîn kir ka çima ewqas giring e ku dê û bav bi zarokên xwe re bi zimanê xwe yê dayikê biaxifin.

Lêkolîna wî pêwendiya di navbera geşedana zarok û zimanê dayikê de dide xuyakirin. Wilo dibîne ku zarokên bi du yan sê zimanan jêhatî bûn pêş dikevin, mezin dibin ku bi têgihîştina kûrtirîn awayê çêkirina hevokan û vegotinan mezin dibin, karanîna zimên bi tevahî pir hêsantir dikin.

Zarokên ku tenê bi yek zimanî di-axivin xwediyê ramaneke sabit bûn ku çawa tiştê ew dixwazin an pê pêwîst in radigihînin. Herweha dît ku zarokên tenê bi yek zimanê dayikê nizanin çawa bi kar tînin ziman di heman kûrahiyê de wekî zarokên ku du an du zimanê dayikê bikar tînin.

Ew behs dike ka çawa zarokên ku bi gelek zimanan diaxivin xwediyê ramana rexnegirî ya pêşkeftî ne, ku ew neçar in ku li awayê vegotin û karanîna zimanê bijarte di wê gavê de di demê de lêkolîn bikin.

Wekî din, Cummins dît ku zarokên xwedan zimanê dayikê yê bihêz hêsan dîtina zimanek duyemîn û pêşxistina behreyên xwe yên xwendin-nivîsandinê hêsantir dibînin.

wî destnîşan kir ku zanîn û behreyên zarokan li ser zimanan veguhezîne. Lêbelê jêhatiyên bi zimanê dayikê fêr bûne jî dikarin di fêrbûna ziman de werin veguheztin, lewma zarok neçar e ku li ser awayê dayîna hevokê û dema bikaranîna wê bêtir bifikire, nasnameya çandî ya wan jî bi hêsanî tê adapte kirin. Ji ber vê yekê ew ji bo dêûbavan fêrbûna zimanên duyemîn li malê, her weha karanîna ziman û derbirîna zarokê pêşve dibe ku ew fêr bibe nêzîkatiyeke tendurist e.

## 2. Rola zimanê dayikê di pêşkeftina zarok de:

Baş tê zanîn ku bingeheke bihêz a zimanê dayikê zarokan bi behreyên ku ji wan re hewce ne ku fêrî zimanên din bibin, dike û dihêle ew têgihiştina xwe ji avaniya zimên veguherînin çend zimanên nû. Têgihiştina bînbar a rêzimanê ku dema zarok zimanê xwe yê yekem fêr dibin pêşve diçe bi hêsanî derbasî zimanên din dibe.

Ji ber ku pirzimanî di nav cihê kar de dibe taybetmendiyeke ku pir zêde têtе

# Zimanê Dayikê

Berzo Mehmûd*

**"Zimanê dayikê di pêşxistina nasnameya kesane, civakî û çandî de roleke mezin dilîze.**



## 1. Wateya Zimanê Dayikê:

Wateya zimanê dayikê ew e herdem dikare wekî zimanê we yê yekem an zimanê dayikê were binavkirin. Ew ziman e ku hûn bi gîştî pê diaxivin. Lêbelê, wateya zimanê dayikê her gav jêder (referans)a wî zimanî ye ku zarok ji dayikbûnê ve pê

*Zimanzan Û Lêkolîner, Di sala 1956an de li Qamişloya- Rojavayê Kurdistanê hatiye dunyayê, beşa Ziman û Wêjeya Ingilîzî li Zanîngeha Helebê xwendiye. Master di zimannasiya kurdî de li Zanîngeha Artuklo ya bajrê Mêrdînê- Bakurê Kurdistanê bi dawî kiriye, niha li swer teza xwe ya Doktora dixebite, û li zanîngeh Rojava perwerdekar e.

yê dîrokî heye. Lê kengî ji ber petrolê û ewlekariya Îsraîlê berjewendiyên hegemonya global bi yên dewletên netewe yên xwecihî re li hev nekin, ev pêkanîn weke berê bi hêsanî nameşin. Nakokî dike ku carinan derz li sîstemê bikevin. Di vê rewşê de ji bo tevgera jiyana azad û berxwedana çanda Kurd careke din şens heye bi roleke dîrokî rabe; ango li dijî modernîteya kapîtalîst a hêza herî dawî ya navendî ya şaristaniyê ye, firsend çêdibe modernîteya demokratîk xwe weke alternatîfeke bi hêz pêşkêş bike. Çanda Kurd a modern ji ber sedemên xweser bi tenê dikare xwe bi hêmanên modernîteya demokratîk bigihîne serketinê. Em dema serketin dibêjin, em behsa mayîndebûna çanda jiyana azad û hebûna wê ya nayê tinekirin dikin. Formê bingehîn ê vê jiyanê, ekonomiya kominî ye ku cih dide bazara civakî, îndustriya ekolojîk û neteweya demokratîk. Kurdistan û rastiya Kurd a hemdem bi awayekî dîrokî çawa ku di derketina holê ya sîstema şaristaniyê de bi rola dergûşê rabûne, şensê wan heye ku ji bo modernîteya demokratîk weke sîstem xwe piştrast bike dîsa bi rola dergûşê rabin. Çanda demokratîk ne bi tenê weke çanda jiyana modern a Kurd, weke şensekî herêmê û mirovatiya gerdûnî, li ser vî bingehî bi rola xwe rabe, ev yek xwedî girîngiyeke dîrokî ye..

---

*Abdullah Ocalan, Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk- Pirtûka Pêncemîn: Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî De.. Pirsgirêka Kurd Û Çareseriya Neteweya Demokratîk, Werger: Rêşad Sorgul, Weşanên Mezopotamyayê. Weşanxana Şilêr Qamişlo – Nîsan / 2018

çanda jiyana azad û berxwedanê ye. Bi vê Kurdîtiya ku bi şêwazekî komplowarî, sexte û naveroka wê pûç, hedefa bingehîn çanda civaka neteweyî ya Kurd a demokratîk û şoreşger e. Mîna ku Kurdîtiyeke lîberal a bûrjûwa bi vî şêwazî heye, hewl didin vê nîşan bidin û dixwazin wê li şûna çanda jiyana azad û berxwedana Kurd bi cih bikin.

Ev rêbaz, ji aliyê hegemonya îdeolojîk a modernîteya kapîtalîst ve, ji roja ku derketine holê ve li dijî tevahiya îdeolojiyên şoreşger, sosyalîzma pêkhatî û çandên rizgariya neteweyî pêk anîne bi kar aniye û di vê de têra xwe jî bi ser ketiye. Hegemonya îdeolojîk a lîberal di sêsed salên dawî de nexasim di serdema şoreşan de ev fonksiyona xwe hem bi amûrên hûrûkûr, hem jî bi yên çor bi awayekî serketî pêk aniye û di vê de têra xwe bûye xwedî tecrûbe. Ezmûnên sosyalîst, demokratîk û neteweparêz ên bi serketin jî nikarîbûn xwe ji hegemonya îdeolojîk lîberal a modernîteya kapîtalîst rizgar bikin, nikarîbûn xetên zelal bikişînin nava xwe û wan, û lewma di nava wê de heliyane. Bêguman ev nayê wê maneyê ku çanda jiyana azad û rewşa berxwedanê bi temamî tine bûye; ev piştrast dike ku zordestiya hegemonîk a di dîroka şaristaniyê de timûtim kiriye mînakeke wê bi awayekî bêhtir pêşketî bi serketî bi pêş xistiye û pêk aniye.

Tevahiya dîrokê îdeolojiyên hegemonîk û çandên bi cihkirî yên li ser çanda jiyana azad û berxwedana Kurd hatin ferzkirin pêkanînên xwe yên herî dijwar û asîmîlasyonîst di pêvajoya modernîteya kapîtalîst de kirin. Ev rewş bi naveroka faşîst a modernîteya kapîtalîst re têkildar e. Kara herî zêde îndustriyalîzmê, îndustriyalîzm jî dewleta netewe mecbûrî sîstemeke koletiyê dike. Di asta gerdûnî de qirkirinên çandî yên pêk tên ji bo ev sîstem fonksiyonel bibe ji wan pêkanînan e ku timûtim serî li wan didin. Qirkirina çandî ya Kurd ji wan mînakên sereke ye ku vî rengê heyînê yê sîstemê darî çav dike. Qirkirin weke ku tê îddîakirin ji diyardeyeke Tirk, Ereb, Cihû yên ku her yek ji wan diyardeyeke civakî ye yan jî ji diyardeyeke neteweyî pêk nayê. Qirkirin diyardeyeke ku bi şêwazê mêtinkariyê yê modernîteya kapîtalîst re têkildar e. Lê weke ku xuya dike, qirkirinê mîna diyardeyeke di navbera neteweyên modern de pêk tê nîşan didin. Çandan bera hev didin heta bigihîjin qirkirinê, eger vê nekin meyla kara herî zêde ya kapîtalîst kar nake.

Pêvajoya qirkirinê ya dewleta netewe ya Tirk li ser hebûna çandî ya Kurd dimeşîne, bi heman awayî û pêve girêdayî, ji aliyê dewletên netewe yên din ên parçeker dewletên Ereb û Îranê jî tê meşandin. Li gorî mentiqê sîstemê, bi hev re parçekirin û tinekirin ji bo serketinê hewce dike. Di van demên dawî de ceribandina koalîsyona antî-Kurd a di navbera dewletên netewe yên Îran, Sûrî û Tirkî de bingehê xwe

ekirin û li şûna wan navên Tirkî yên 'Tirkê Spî' hatine danîn û bi vî awayî hukim dane ku rastî wê bi hêsanî bêne tesfiyekirin. Tevahiya şêwazên îfadeyê yên çanda Kurdî ango wêje, muzîk, resim, dîrok û zanist di çarçoveya heman qedexeyan de girtine û bêhtir bi çavsorî bi ser de çûne, yên di van qadan de xebatê dikin ne ku bi tenê li derveyî huqûqê hesibandine, kirine mehkûmê bêkarî û xizaniyê û ew tevizandine. Ji bo Kurd karibin bijîn şert ew e, divê ji çanda xwebûnê bigerin û ev pêk anîne. Nemaze piştî dema isyanan ekonomî, huqûq û siyaset weke sîlehên herî bi bandor ên tesfiyeyê hatine bikaranîn. Piştî van pêkanînan a li dawiyê mayî Kurdekî ji xwebûnê dest kişandî û çandeke Kurd a weke meyt û beratê ye ku kî nêzîkê wê bibe ji serî ve belayeke mezin bi serê xwe de tîne. Çiqasî ev rewş bê qebûlkirin, ewqasî jî mirovî tine dike. Bêguman weke rizîna hêmanên berate û meytekî ji ber qirrakan mayî ye. Di diyardeya çandî ya Kurd de pêvajoyeke mezin a rizînê pêk hatiye, pêk tê.

Ji rêûresma deshilatdar a Îslamî ya bûrjûwayê nehatiye ku ji nêzîkatiya Tirkê Spî bibihure heta ji wê paşketîtir e. Li dijî hebûna çandî ya Kurd tevî rêbazên laîk modernîst, rêûresma Îslamî jî bi kar aniye û di bin navê senteza Tirk-Îslamê de milletperestî hê dijwartir kiriye û pêk aniye. Nexasim kengî di tesfiyeyê de Tirkkirina laîk kêm ma, motîfên Tirk-Îslamê kirin dewreyê. Di serî de terîqetên Neqşî û Qadirî, bi tevahî amûrên dînî di vê mijarê de weke amûrên tinekirina çandê hatine bikaranîn. Serokatiya Karûbarên Diyanetê Ya Fermî bi Komarê re hat avakirin û ji wê rojê ve di xizmeta laîkgiran de hatiye xebitandin. Nexasim girêdana Kurdan bi çanda dîn îstîsmar kirine û bi giranî dîn weke şêwazekî komplowarî bi kar anîn. Naveroka xisletên terîqetên xwedî rêûresmeke berxwedêr, hatin pûçkirin û ew ne li gorî armancên damezrandinê, berevajî van armancan bi kar anîn. Têkoşîna milletperestiya Tirkê Spî (rojane bi awayekî berbiçav CHP, MHP û yên weke wan) li dijî çanda jiyana azad û berxwedana PKK'ê bêkêr bû, lewma li şûna wê yan bi wê re, li gorî polîtîkayên dewleta netewe (tevî ku bi prensîbên Komara Atatirk re li hev nakin) pêkhatinên Îslamgiriya Tirk temsîl dikin (di serî de AKP, partî û ekolên mîna Millî Goruşê û yên weke wê) bêyî ku fikaran bikin bi kar anîne. Dema ku mijar bûye hebûna çanda Kurd, gelek partî û ekolên Îslamgir bi awayekî biçin 'Seferên Xaçperestan' tevgeriyane û ev şêwaz weke pêdiviyeke 'yekîtiya millî û yekparebûnê' hesibandine.

Di demên dawî de piştî ku hat fêhmkirin hebûna çanda Kurd nayê tinekirin, bi ferzkirina hegemonya global polîtîkayên tinekirinê yên ji rêûresmê hatine sistkirin rê li ber pêkhatinên seriyekî wê yê sexte bigihîje heta çanda dewleta netewe ya Kurd hatiye vekirin. Di vê de hêmana diyarker,

çanda neteweyî rola modernîteya kapîtalîst neyênî ye. Di warê pêkanîna çanda neteweyî ya bûrjûwayê de nêzî rastiyê jî nebûye. Çanda dimeşe û tê pêkanîn, çanda îmhaker, asîmîleker û qirker a dewleta netewe ya serdest e. Sloganên faşîst ên weke 'tek welat', 'tek netewe', 'tek ziman', 'tek dewlet' û 'tek al' ku her roj têne dubarekirin vê rastiyê îfade dikin. Hêmanên modernîteya kapîtalîst ên ji asîmîlasyon û çanda zordest a serdema destpêkê û navîn bi gelekî wêdetir xwedî sîstemekê ye, weke sê suwarên mehşerê, demekê beriya demekê li pey pêkanîna mehşerê ye. Çanda dewleta netewe, îndustriyalîzm û kara herî zêde ji bo ku çanda Kurdan a rêûresmê ya hê ji modernbûnê dûr e, û hê nebûye neteweyî biqedîne, bêperwa tevahiya rêbazên îmhaker bi kar tîne.

Çîroka pêkhatina bûrjûwaziya Tirkê Spî ya kapîtalîzma burokratîk a Tirk ew afirand, bi temamî komploker e. Komplokeriyê ji serî ve çanda împaratoriyê ya ji rêûresmê ji xwe re kiriye pêpelûk û maske, bi awayekî navenda wê derve û hundir be civak rehîn girtiye. Di vê çandê de civak êsîr e. Elîteke çînî ya welê çêbûye ku çanda civakî ya ji xwe re orîjîn dihesibîne jî (etnîsîteya Tirk û Îslama Sunnî) rehîn girtiye, û eşkere ye ku ev elît wê li ser rastiya çandî ya Kurd bi roleke texrîbkartir rabe. Tevahiya sedsala 20. bi mînakên bi vî rengî yên balkêş tijî ye. Çanda Îttîhad û Teraqî ya îdeaya wê ya gavavêtinê li ser bingehê laîk hebû û nexasim bi CHP'ê şêweyên wê yên bêhtir bûne desthilatdar, piştî ku tesfiyekirina hebûna çandî ya Ermenî, Helen û Suryanî temam kirin bi tevahiya hêza xwe berê xwe dane tesfiyekirina çanda Kurd. Hem di dema 1925-1940'î pêvajoya isyanên provokekirî de, hem jî paşê di bêdengiya mirina spî de rêbazên tineker heta dawiyê bi kar anîn. Tevî ku carinan qirkirinên fizîkî pêk anîn jî bi awayekî bingehîn a pêk anîn modela qirkirina çandî bû.

Di vê demê de çanda Kurd bi tevahî hêmanên xwe yên maddî û manewî ji sedî sed hatiye înkarkirin û qedexekirin, bi pêkanînên asîmîlasyonê yên bê sînor, xwestine qirkirina çandî temam bikin. Ji bo Kurd hebûna xwe ya çandî li ser piyan bigirin, îmkan nedane ku bi tenê dibistana 'baxçeyê zarokan' jî vekin. Pêkanîneke welê ye ku mînakeke wê ya din li dinyayê tine ye. Di xaleke bi tenê ya qanûnê de ji îfadeya nasnameya çandî re cih nehatiye veqetandin. Çanda Kurd tevî hêmanên xwe hemûyan ango wêje, dîrok, muzîk, resim û... hwd. li derveyî huqûqê hatiye hesibandin. Li ser rûyê erdê jî emsaleke duyemîn a vê yekê nîne. Der barê Kurdan de çi hêmanên divê bêne hilweşandin û tinekirin hebin hatin hilweşandin û ji holê hatine rakirin û yên divê bêne bikaranîn jî bi çanda dewleta netewe ve entegre kirin û helandin, ji çanda Tirk hesibandin. Bi qedexekirina zimanê dayikê re navên dîrokî yên gund, bajar, herêm û dayikniştiman hemû hatine qedex-

Semîtîk cudatir e; mirovan nake evd, bêhtir wan dikişîne aliyê jiyana azad. Di navbera wan de cudahiyeke evqasî bi kok û binyad heye. Di dema serdestiya Îslamê de rêûresma Zerdeştî derb xwar û bi vê re jî evdîtî hat. Desthilatdariya Îslamê bi dijwarî dijmintiya rêûresma Zerdeştî kir û di binê vê dijmintiyê de ev diyardeya evdkirinê û çînîkirineke hişk heye. Kurd çiqasî tevlî Îslama desthilatdariyê bûne ewqasî bûne evd, bûne kole û ev xusûseke gelekî girîng e. Di çanda Kurdan de îradeya ji bo jiyana azad bi hatina Îslama Desthilatdariyê re derbeke xedar xwariye. Li dijî vê, berxwedanên li ser bingehê Elewîtî û Êzîdîtiyê bi rêûresma Zerdeştiya kevin re têkildar in, û bi awayekî bingehîn a di vê de rol dilîze destnekişandina ji îradeya jiyana azad û çanda derfetê dide wê ye. Terîqet û mezhebên ji Îslama Desthilatdariyê reviyane û xwe jê dûr girtine, çiqasî bi nexweşiya desthilatdariyê neketine, bêhtir alîkariya jiyaneke azad û bi exlaq kirine. Ev bi awayekî rêxistinên xweparastinê yên serdema navîn in.

Çanda Kurdan bi awayekî bingehîn di serdema navîn de bi van du rêyan hem hebûna xwe parastiye, hem jî di jiyana xwe de cih nedaye evdîtiyeke bikeve hinavê wê û xwesteka xwe ya ji bo azadiyê bi dilsozî dewam kiriye.

Modernîteya kapîtalîst, çawa ku di qada çanda maddî de kiriye, di qada çanda manewî de jî helwesteke asîmîlasyonîst û qirker nîşan daye û ev jî bi mekanîzmayên tinekirinê yên dewleta netewe pêk aniye. Dewletên netewe yên Ereb, Tirk û Îranê ku bi awayekî acente û saziyên sîxur ên modernîteya kapîtalîst in, ji avahiyên desthilatdariyê yên rêûresmê sûd wergirtine û çanda Kurdan bi temamî kirine mengeneyê, ji tevahiya derfet û îmkanên perwerdeya bi zimanê dayikê mehrûm kirine, pergala perwerdeyê ya medreseyên rêûresmê xira kirine qedexe kirine, çand û zimanê Kurdî di nava saziyên çand û zimanê serdest ên dewletên netewe de ji îmhayê re terikandine. Hinek hewldanên lawaz û zelûl ên milletperestiya Kurd ji bo parastina çanda Kurd (xebatên wêje û ziman) bi ser neketin û tevî vê jî li hemberî hevrikên wan ên bi hêz rê li ber reaksiyoneke dijber vekiriye. Eger çanda berxwedanê ne bi hêz be, çawa di her diyardeya bi vî rengî de tê dîtin, bivênevê her ku diçe dihele û tine dibe. Her weha bi awayekî giştî formên milletperest ên bûrjûwayê di wê kapasîteyê de nînin ku çandên gel zindî bihêlin û pêşde bibin, berevajî xwedî fonksiyonekê ne ku wan çeloxwarî dikin û naveroka wan pûç dikin. Di modernîteyê de çanda nivîskî li asta herî jor e, lê bi sedema qedexekirin û asîmîlasyonê, ji bilî çend xebatên lawaz û qels çanda Kurd pirr kêm berhem dane. Di van berheman de jiyana azad negihiştiye îfadeyeke rast, bêhtir di van berheman de arîstokrasiya eşîrê, pergala wan a begtiyê û otorîteyên dînî derketine pêş. Di rastiya Kurd de ji bo pêşketina

civakbûyîn jî bi roleke bi qasî ya wan rabûye. Ya rastî, pêşketina zimanî bi pêşketina amûran ve girêdayî ye, û gelekî di zikhev de bandor li hev kirine. Nîzama zimanê sembolan yek ji sedema girîng a gavavêtina Homo Sapiens e. Bi vê nîzama zimên mirovatiyê hêza fikrê bi pêş xist, piştre jî li pey hev rê li ber bûyerên şoreşî vekir. Cinsê mirov bi van şoreşan di warê civakî de gelekî bi pêş ket. Ji aliyê cografîk ve navenda van şoreşan sîstema çiyayên Toros-Zagrosê ye. Em li ser sedemên vê rawestiyabûn. Dapîr û bavpîrên Kurdan koma sereke ya vê sîstemê bûn. Çand û zimanê Aryen a koma ziman a herî kevin pêk anî, hem di warê pêşketina neolîtîkê, hem jî di warê pêşdebirina pêvajoya bajar-şaristaniyê de bi roleke bingehîn rabû. Ev bûyer hemû heta bi beriya bîst hezar salan şaxên xwe ber didin, diçin. Ango mirov dikare di cîhana Kurdan a zêhniyetê de şopên pêvajoyên neolîtîk û şaristaniyê bigerîne. Piştre, bûyera jê re koma çand û ziman a Hind-Ewrûpayê tê gotin jî kokên xwe ji vê rabihuriyê digire. Yên di nava vê koma çand û ziman de timî li hemberî xwe du komên çand û ziman ên cuda dîtin. Li Başûr komên Semîtîk ên ji nêz ve bi kokên xwe Efrîkî (çanda çol û qadên germ) û li Bakur komên Ûral-Altay ên li keviyên Sibîryayê (çanda qutbê û qada sar). Li gorî van herdu koman koma navîn bi derfet û avantaj bû. Avantaja cografîk di pêşketinê de xwedî roleke diyarker bû. Ji ber vê yekê, em dibînin ku komên qada navîn bi awayekî dîrokî gavên mezin diavêjin û mohra xwe li bûyerên mezin dixin. Lewma em dikarin fêhm bikin ka çima hem di pêşketina çanda maddî û hem jî di ya çanda manewî de bi rola sereke rabûne.

Çanda Kurd tevahiya dîrokê di mezinkirina çanda çemê sereke de û di tesîrlêkirina wî de bi roleke pêşeng rabûye. Lê ji ber ku devera wê ya jiyanê timî li qada şer a dîrokê bû, ji bo hebûna xwe biparêze û bergiriya xwe bike, xwe vekişandiye serê çiyan. Bi saya çiyan, karîbûye bibe gelê herî kevin û bibe xwediyê vê nasnavê. Aliyê vê yê neyênî jî ew e, di nava xwe de zêde cih nedaye çanda bajêr. Bi bajêr re timî di pozîsyoneke dijber de maye û bajar weke cinawirekî wê daqurtîne û bixwe dîtiye. Lewma çanda qebîle û eşîrê ya ji rêûresmê heta roja me ya îro hebûna xwe parastiye. Forma qebîle û eşîrê şêwe û qalibê bingehîn ê çanda Kurd e. Çawa ku sosyolojî dide nasîn çanda eşîrê çandeke bi rêya baviktî û xizimtiyê nîne, çandeke jiyana azad û şêwazekî heyînê ye, bi berxwedana li dijî şaristaniyê xwe diyar dike, bawer dikim ku bi vî awayî danasîna wê duristir û rasttir e. Li cem Kurdan çanda eşîrê gelekî bi hêz û xurt e. Ji ber ku tevahiya dîroka şaristaniyê bûne xwedî îrade ku bi berxwedanê xwedî li hebûna xwe û jiyana azad derkevin. Di vê de têkiliya baviktî an jî xizimtiyê diyarker nîne. Rêûresma Zerdeştiyê di vê çarçoveyê de ji rêûresma dînê

# Şaxê Çandî yê Rastiya Kurd

**Ji bo Kurd hebûna xwe ya çandî li ser piyan bigirin, îmkan nedane ku bi tenê dibistana 'baxçeyê zarokan' jî vekin. Pêkanîneke welê ye ku mînakeke wê ya din li dinyayê tine ye.**



Abdullah Ocelan



Di çarçoveya teng de divê mirov behsa şax û aliyê çandî bike. Şax û aliyê çandî bêhtir têkiliya xwe bi rewşa zêhniyetê re heye. Ji ber ku ziman amûrê bingehîn ê îfadeya zêhniyetê ye, girîng e. Ziman yek ji amûrê herî kevin ê civakbûyînê ye; kevirên verrotî ji amûrên pêşî ne, û

Navgîna veguhestina raman û hestan e, lewma cihê ku komên mirovan lê hene, bêguman pêwîst e ziman jî lê peyda bibe.
Ziman navgîna pevguheztina raman û hestan e, di navbera mirovan de têkiliyan xurttir û hêsantir dike, her wisa yek ji armancên ziman yên sereke rêxistinkirina têkilî û danûstandinê ye.
Her netewe çand û kultûra xwe bi zimanê xwe vedibêje û diparêze. Ziman di nava neteweyekê de gencîneya paşeroj û pêşerojê ye. heger zimanê miletekî winda bibe dê hemû çand û kevneşopiyên wî jî ji holê rabin. Her wisa paşeroja wî jî winda dibe. Ji ber ziman ji bo civak û neteweyan gelekî girîng e. Lewra dewlemendiya neteweyan di zimanê wan de diyar dibe. Ango mirov dikare bibêje ku mercê sereke yê neteweyîbûnê ziman e, heger tu netewe bî pêwîst e zimanekî te yê taybet hebe.
Parastin û xwedîderketina li ziman erkeke neteweyî ye. ji ber ku dewletên dagirker vê girîngiyê baş dizanin, lewma dema ku dixwazin netewe ango miletekî ji holê rakin, di serî de dest diavêjin zimanê wî, ji bo ku çand, dîrok û kultûra wî jî bi ziman re winda dibe.
Di parastina ziman de rola herî mezin a ronakbîran e. Û heger di vê der barê de roleke baş û durist bilîzin dê paşeroja ziman jî baş û ronî be. Da ku zimanek zindî bimîne pêwîst e bê bikaranaîn di perwerde, bazirganî û jiyana rojane de. Heger wisa nebe bi domana demê re ziman qels dibe û ber bi mirnê ve diçe, her wiha wê ew gencîneya dewlemend a ku bav û kalan ji me re hiştiye winda û talan bibe.
Girîngiya ziman di ragihandinê de jî bi zelalî xuya ye û nayê paşguh kirin, ji ber ku ew kilîta danûstendina di navbera gelan de ye, ew rêgeza bingehîn a ku çanda netewe û gelan diparêze, ji bilî wê jî dîroka ku tije çîrok, bûyer  û tecrube di nav xwe de dihewîne û kes û neteweyan bi şaristaniya ku pê ve girêdayî ne haydar dike, ji ber vê yekê Ziman ne tenê tîpên bilêvkirî ne, lê li pişt van tîpan hunereke xwedî asteke bilind heye ku dihêle kes pêwendiyê bi hev re bikin, his û daxwazên xwe ragihînin.
Ji ber girîngiya zimanê dayikê dosyaya hejmara yazdemîn taybet e ji gotûbêjkirina vê mijarê re.
Her weke di hemû hejmarên borî de jî, di vê hejmarê girêdayî çand, kultûr, wêje û ziman gelek gotar û nivîsên dewlemend hene, bi hêviya ku ji bo xwînerên hêja bisûd û mifa bin.

## Pêşekî

# Zimanê Dayikê

**Desteya sernivîskariyê**

Xwînerên hêja:
Kovara Şermola ya wêjeyî û çandî bi hejmara xwe ya nû (yazdemîn) pêşberî we ye, ji ber ku kovara me her di hewldanan de ye ku mijarên girîng û bisûd bi were parve bike, lewma di her hejmarê de dosyaya hejmarê heye ku bi hûrbînî mijarekê gotobêj dike. Dosyaya vê hejmarê zimanê dayikê ye. Ziman bi gelemperî yek ji girîngtirîn taybetmendiyên mirovî yên surişti û civakî tête hesibandin, mirov di rêya ziman re hest û hewcedariyên xwe derdibire.
Ziman alava veguhestina raman e, ku ji bav û kalan derbasî zarok û neviyan dibe. Têkilî û peywendiyên endamên neteweyê û xewn û hêviyên wan, şadî û êşên wan îfade dike, gencîneya neteweyan a paşeroj û pêşerojê ye, zanist, wêje, siyaset, huner, folklor û berhemên netewe û civakan hildigre nava xwe.

• **Jin û çand** .....
- Jin Di Navbera Çanda Resen û Sexte De .. (Nêrgiz Ismayîl) ..... 57

• **Pirtûkên Derketî** .....
- Pirtûkên Derketî.. (Desteya Sernivîskarîyê) ..... 61

• **Huner** .....
- Sê Nifş, Sê Deng, Sê Jiyan.. (Occo Mahabad) ..... 65

• **Çîrok** .....
- Hêvî Bû Tolvedan.. (Mîdiye Berekat) ..... 71
- Rastiya “Azad”!!.. (Hesen Xalid) ..... 73

• **Helbest** .....
- Dilên Dicengin.. (Evdirehman Çadircî) ..... 75
- Bazê Spî Me.. (Îsmet Hesen) ..... 77
- Kurdino Berhev Werin.. (Mihemed Welîd) ..... 79
- Binivîse ..(Siyabend Siyaroj) ..... 81

• **Serbest** .....
- Rastnivîsa Peyv û Hevokan.. (Diyar Bohtî)..... 82
- Ji Gundên Efrînê:- Çeqmaqa (Mezin)- Elkê..
  (Şerîf Mihemed- Welîd Bekir)..... 93

# Naveroka Beşa Kurdî

• **Pêşekî** .....
• Zimanê Dayikê.. (Desteya Sernivîskarîyê) ..... 5

• **Analîzên hizrî** .....
• Şaxê Çandî yê Rastiya Kurd .. (Abdullah Ocelan) ..... 7

• **Dosyaya Hejmarê** .....
• Zimanê Dayikê.. (Berzo Mehmûd)..... 14
• Giringiya Zimanê Dayikê Di Perwerde û Hînkirinê De..
(Beşîrê Mele Newaf)..... 21
• Zimanê Dayikê, Zikmakî, Dayîk, Mak. Ji Van Gelo kîjane Rast e?..
(Merwan Berekt)..... 28
• Di Pêşvebirina Civakan De Girîngiya Ziman.. (Aram Hesen)..... 30

• **Lêkolîn** .....
• Dîroka Zarê Kurdî... (Arşek Baravî) ..... 34
• Rastiya Tofanê... (Lem'a Mihemed Elî) ..... 43

• **Hevpeyvîna Hejmarê** .....
• Li Gel Lêkolîner û zimanzan Samî Tan e (Aram Hesen) ..... 52

# Şermola... Dîdargeheke çandî, wêjeyî resen e

Divya bû em weke rewşenbîrên Bakur û Rojhilatê Sûryê asta keda çandî bilind bikin di rewşên herî dijwar û di şerekî bê hempa de, ku destwerdanên navdewletî , herêmî û xwecihî tevlî hev bûne, şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûryê ji hinavê vê rewşê pengizî. Gelên wê qurbaniyên herî mezin pêşkêş kirin ji bo bidestxistina jiyaneke demokrat û azad , ku nirxên civakbûyînê yên bi hezarên salan rehên xwe berdane bîrgeha vê xakê biparêze, di encama vê keda tê dayîn de me ev kovar weşand ku em tê de hewil didin di riya pênûsên şareza de radeya pêkanîna çandî pêş ve bibin ta ku bibe hêjayî asta bûyerên ku diqewimin, her wiha ji bo bibe bingeh û hêzeke bandorker, ku asta civakê ji milê ramyarî û çandî ve pêş bixe ji bo xwe bigihîne ayîndeyeke baştir û çêtir.

Desteya sernivîskariyê navê Şermola hilbijart ji ber sedemên dîrokî ku reseniyekê lê bar bike. Şermola bi xwe navê girekî dîrokî ye li Amûda Bakurê Sûryê ye, di gel ku girên herêmê bi giştî di serdema Horî-mîtanî de weke nîşana kombûnê di rewşên awarte de û li hemberî êrîşan dihatin bikar anîn, lê piştre ew gir weke rawestgeh û dîdargeha karwanên guhêzer di navbera mîrnişînên hundirîn ên Sûryê û bakurê wê û Kurdistanê bi gelemperî bi kar dihat.

Lewre ev nav rehendeke dîrokî digre ku reseniyeke ramyarî û wêjeyî peyît dike , ta karibe bibe dîdargeheke çandî ji bo rewşenbîrên gelên herêmê bi giştî. Deriyê kovarê vekiriye ji bo hemî şiyanên wêjeyî û afrînerî, ku hevdengiyekê li gel armancên kovarê di şiyarkirnê de dike, her wiha veguhastineke bê hempa di rojeva çandî de li Rojava û li Bakurê Sûryê bi giştî diafirîne, li kêleka sazî û yekîtiyên rewşenbîrî, rojname û kovarên wêjeyî li herêmê.

ŞERMOLA
شـــرمولا

-Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane û Serbixwe ye, bi zimanên Kurdî û Erebî li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê weşandin.
-Di 24 Êlûna 2018›an hatîye damezrandin û Hejmara yekemîn di roja 7›ê Sibata 2019›an de derket.
-Kovarê rêdana xwe Ji Encûmena Bilind a Ragihandinê ya Rêveberiya Xweserîya Demoqratîk a Herêma Cizîrê, li gor belgeya NO 3 a ku di dîroka 29.1.2019›an Hatiye Dayîn, girtîye.

## Rêgezên weşanê

-Kovar bi dilxweşî pêşwaziya hemû berhemên wêjeyî û rewşenbîrî dike.
-Hemû berhemên ku digihêjin kovarê; di nirxandina desteya nivîskariyê re derbas dibin.
-Derbarê berhemên ku têne weşandin; nayê wateya ku ev berhem nêrîn û polîtîkayên kovarê derbirîn dikin.
-Pêwîst e ku hemû lêkolînên ji kovarê re tên şandin, ji aliyê zanistî ve bi belge bin, ku qasa gotarê di navbera 700 ta 1.200 peyvan de be û ya lêkolînê di navbera 2.500 ta 3.000 peyv de be.
-Ji bo jêgirtinên ji jêderan; pêwîst e bi vî awayî werin belgekirin:
Navê nivîskar-navê pirtûkê-navê wergêr, eger pirtûk wergerandî be-cih û dîroka çapkirinê. Ji bo dezgehên ragihandinê ku weşaneke wê weke çavkanî û belge hatibe bikaranîn bi vî awayî tê rêzkirin: Navê nivîskar-serenavê berhema hatiye weşandin-navê dezgeha ragihandirê (rojname, kovar, malpera elektironîk) - hejmara weşanê (ya rojname û kovaran) - dîroka weşanê.
-Berhemên ku tên şandin ji bo kovarê heger desteya nivîskariyê bibîne ku ev berhem ji aliyê wêjeyî û çandî ve bênirx e, berê hatiye weşandin, ji dezgehine din re yên ragihandinê hatiye şandin, ji derveyî rêgezên gîştî yên civakê be yan jî devavêtin ji ol û gelan re hebe; kovar lêborînê dixwaze derbarê weşana van berheman de.

Rêveber û Sernivîskarê gîştî:
Dilşad Murad

Sernivîskarê beşa Kurdî:
Aram Hesen

Desteya sernivîskarîyê:
Aram Hesen
Abdullah Şikakî
Ehmed Alyûsiv

**-Malpera kovarê:**
www.shermola.net
**-E-MAIL:**
shermola2018@gmail.com
**-Telefon û whatsapp:**
0994712053

-Kovar li Çapxaneya Şehîd Herekol – Dêrik tê çapkirin.
-Belavkirin û Firotin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşgeha Alşemal – Qamişlo 0998234958.
-Pirtûkxaneya Amara ya navendî (Qamişlo, Bazara navendî) 0937812709.
- Nirxê kovarê (1500 L.S).



**Gola Fêlaw a devera Çomanê, Başûrê Kurdistanê. Wênegir: Nermîn Elî**

# ŞERMOLA

شـــــرمولا

Kovareke Wêjeyî, Çandî, Werzane ye

Hejmar: 11 Havîna 2021 z

## Dosyaya Hejmarê

## Zimanê Dayikê

Hevpeyvîna Hejmarê Li Gel Lêkolîner û Zimanzan Samî Tan e

Rastiya Tofanê

Sê Nifş, Sê Deng, Sê Jiyan

■ Tabloya: Roder Ibrahîm